

melayê ciziri



DIWAN



weşanên
ROJA NÛ

WEŞANÊN ROJA NÛ

THE UNIVERSITY OF CHICAGO

MELAYÊ CİZİRİ

DÎWAN

WEŞANÊN ROJA NÛ - 20

Cênga Klasikên Edebiyata Kurdi— 4

**Döbelnsgatan 16 B
113 58 Stockholm/Sweden
Tel: 08/328251**

**Çiriya Paşin 1987
Stockholm**

**ISBN 91 7672 021 7
© Weşanên Roja Nû &
Z.Kaya, M. Narozi**

melayê cıziri

DÎWAN

Werger:

Zeynelabidin KAYA, M.Emin NAROZÎ




THE UNIVERSITY OF CHICAGO

LIBRARY

1970

1970



PÊŞGOTIN

Bı nêzikayi ve, eşkerekırına hinek agahdariyane derheq tarixa ji-yana Mela de, rehma Xwedê lê be û qirnê ku tê de jiyaye. Her çiqas gelek alıman lı ser tarixa jiyana Mela û rewşa halê wi, tıştına gotine ji, lêbelê em rast nehatine ku ew gotinên wan ji çavkaniyên pêbawer bin, û heta ku dıl ji lı ser rastiya wan rûnê. Belki çiqas tıştên ku dı vê derheqê de hatine gotin berên xeletiyê ne û ji rastiye ji dûr in. Ewıl, em dê tıştên ku dı vi wari de hatine gotin bêjun û dı pey de, ditına xwe ya ku em bı rastiya wê bawerın binivisın.

NAV Û BERNAVK Û BAJAR Û EŞİRA MELÊ

Navê wi Şêx Ehmed e. Bernavkê wi yê navdar Melayê Cıziri ye. Cızir, lı ser keviya Çemê Dicle ye, nêziki Çiyayê Cûdi ye û bı Cızira Botan têtê naskırın. Bernavkeki wi yê dın ji heye, ku helbestên xwe pê kuta kırıye, ew ji "NÎŞANÎ" ye. Nişan, yan bı mana hedef e, amaca wi ew e, ku bûye hedef ji tirên evin û bela û qisûmatan ra, yan ji bı mana şanikên dı rûwan de ye û dı helbestên xwe de ew pê pesniye.

(Ev pêşgotina Diwanê ya bı tipên erebi ye ku nivîskarê wê ne diyar e)

Mamostayê mezin Eladin Secadi, dî pirtûka xwe ya "Mêjûyê Edebi Kurdi" de nivisiye, ku navê Melê, Şêx Mihemed e. Mamosta vê agahdariyê, jî çapa Diwana Mela, ya ku Ebdulqadirê kurê Eliyê Emadi, dî sala 1338'ê (1919 - 1920) hicri de nivisi bû, jêderk kiriye. Disa jêderk kiriye û gotiye: "Mela lî bajarê Cizirê hatiye dinê û jî eşîreke Kurdan e, ku navê wê Bextî ye, jî maleka zana, pêşkêş û mezin e." Ev peyvên Mamosta, her çiqas delileke sabît ku meriv xwe pêve bigire tune ye jî, lêbelê lî gor rewşa jiyanê Mela û navdarbûna wî dî çax û ciyê wî de, jî rastiye ne dîr in.

QIRNÊ JİYANA MELA

Dirokvanan derheq tarixê jiyanê Melê de û qirnê ku tê de jiyanê, ditinên cure cure gotine. Lêbelê, çewa ku jî xebereyanên Mela yê dî helbestên wî de, û jî çax û demên wan bûyerên ku ewî bî bal wan ve îşaret kiriye û jî tarixên wan kesan ku navên wan hildaye, tê zanin ku her yek jî wan (dirokvan -w) xwe bî delileka pelîşî ve girtiye. Mamosta Secadi, dî pirtûka xwe de, dî vê derheqê de pîr tişt nivisiye û tiştê ku jê hatiye jî kiriye. Tiştên wî gotine, emê lî vîra bî kurtî bîvîsîn û dî pey de, ditîna xwe ya ku em nêziktirê bî bal rastiye ve dibînin hê bîvîsîn.

Ewî dî behsa Mela de gotiye: "Tixtor Belic Şêrgo dî pirtûka xwe ya "Qediyyet-ul Kurdiyye" (Doza Kurdi - w) de dibêje: Navê Melayê Cizirî Şêx Ehmed e, jî ehlê Cizira Botan e û dî sala 1160 ê miladi de lî wir bî heq bûye. Mihemed Emin Zeki Beg, dî pirtûkên xwe yê "Xulasetu Tarix-il Kurdi we Kurdistan" (Kurtitiya diroka Kurd û Kurdistan -w) û "Meşahir-ul Ekrad" (Navdarên Kurda-w) de gotiye: Navê wî Şêx Ehmed e û dî paşîya 600'ê hicri de lî Cizira Botan dûma û hevdemê hakîmê Mûsilê Emededdin Zengî bûye û (Mela -w) de, jî dayika xwe bûye. Û nusxeyek jî diwana xwe, jî hakîmê Tebrizê yê hingê Xanêxanan ra perû kiriye. Û rehmetiyê Mihemed Eli Ewnî Beg, dî pirtûka xwe ya "Meşahir-ul Ekrad" de dibêje: Ew helbesta ku navê Se'dî û Hafîz têde hatiye gotin û dî diwana Mela de ye, ne jî peyvên wî ne, belkî jî aliyê hînekan ve têde hatiye bicîkirin. Lêbelê, lî gor jêderka Secadi, ya duwem, rehmetî (Eli Ewnî-w) piştî re jî vê ditîna xwe vegeriyaye û lî xwe mîkurr hatiye, ku ew helbest a Mela ye. Rohîlatvanê Rûsî Misyo A. Jaba dî pirtûka xwe ya ku behsa Kurdan dike de, dibêje: Melayê Cizirî jî hêla Cizira Botan e

û dî navbera salên 540 û 556'ê hicri, dî çaxê Emadeddînê Zengî de sax bûye. Heçika rohlâtvanê Elmanî Fon Hartman ku Diwana Mela dî sala 1904'ê miladî de li Berlinê çapkiriye û rîsmekî Mela yê xiyalî li ser daniye û pêşgotinek bî zarê elmanî jê ra nivîsiye, tê de eşkere dîke ku ewî jî, bî van ditînên me borand ra, bawerî anîye.

Dî pey de, Secadî xwestîye ku bî hînek bûyerên tarîxî re van gotînan rûqalê hev û dîn bîke û delîla xwe jî, bî hînek helbestên Mela anîye pêş. Lêbelê, ez bawer im ku delîlên wî, çewt in. Gotîye: Piştî dirêjkirina me ya hetanî vir, derheq jiyana Mela de, ku me jî gotînen komek pirtûkan beyan kir, încar em dê jî vir û pêve, jî we re, jî jiyana Mela tîştêkî nû bibêjin. Ew tîştê ku bî lêkolîn û lêgerîneke dûv-dirêj ve ez li serê agahdar bûme, bî alîkariya nusxeyeka Diwanê ku Ebdulqadîrê kurê Elî yê Emadî, dî sala 1338'ê hicrî de nivîsandîye, ev e: Li gori gotînan, navê Mela, Şêx Ehmed e, kurê Şêx Mihemed e, dî sala 1407'ê (827'ê hicrî) miladî de li Cîzîrê jî dayîka xwe bûye û jî eşîra Bextî ye. Li cem bavê xwe xwendîye û demek pişt re jî bo xwendîna li dora Diyarbekrê, Cîzîrê, Hekariya û Emadiyê geriyaye. Dî xwendîna xwe de, pîr jîr û şarezaya û bî nav û deng bûye, nemaze dî derheqê ilmên erebî, dî îsûl û beyan û bedî'ê de. Li gundekî bî navê "Sitrabas" li dora Diyarbekîr, jî alîmekî bî navê Mela Taha, destûrnama xwe ya xwendîne girtiye. Li wî ciwari, ewî, li gundê "Sîrba" meletî kirîye. Demek dî pey de, qederek jî li bajarê Hesenkêf (Heskîf-w) ê sekûniye û li wir îcaze daye gelek meleyan. Dî pey de bî demekê, evîneka tesewwîfî lê peyda bûye û dev jî ilmê xwe yê berbiçav berdaye, be rewşeka mestî ve hatiye bajarê xwe yê Cîzîrê. Li wir maye hetanî sala 1481 û piştî ku emrê wî gihaye 75'an, çûye dîlovaniya xwe. Heta niha jî. kesên ku bî agirê evîne şewitîne, merqeda (gor-w) wî jî wanakan re ziyaretgah e. Dî pey van de, Secadî hînek helbestên Mela yê evîne raxîstîye, mane kirîye, pesnê wî daye û sofîtiya wî ya xwe bî xwe beyan kirîye bî awayekî wîsan ku êdî lê nayête zêdekîrîn.

Heçika ez bixwe bî van ditînan tev re ne bawer im. Çimkî dî van ditînen han de, delîleka xwepêgirti tune ye. Lêbelê, ditîneka min a xîsûsî heye û ez bawer im ku wê ew rastir be. Lewra min vê ditîna xwe jî beyan û bûyer û navên wan kesên ku Mela dî helbestên xwe de gotîye, derxîstîye. Dî vî wari de, delîla herî zîrpe ev e.

Ewî, ezê dest bî beyana gotînan û navên ku dî peyvên wî (Mela-w) de ne bîkîm, ku ditînen wan dirokvanên dîn tevan pûç dîkîn. Û pişt re ezê ditîna xwe ya rast bêjim.

Ez dibêjîm Mela, rehma Xwedê lê be, dî helbesta xwe ya ku destpêka wê:

"Jî re'na nêrgîzên tey mest i xwunrêz

Zeman bû ehdê ceng engîzê Cengîz" de îşaret kîriye bî bal wê herba barbarî Cengîzخانê Tatari ve lî ser bajarên mîsılmanan. Û kîfşe ku Cengîzخان dî sala 624'ê hîcrî de mîriye. Disa Mela gotiye, dî qesîdeya xwe ya "Tîpa - F"ê ya ku destpêka wê ye:

"Îro jî şehkasa surî, mey hate fîncana sedef"ê dî beyta heştan de: "Cengîzî hat Timûrleng". Eva han eşkere dîke ku Mela, dî pey Timûrlengê ku dî sala 708'an de mîriye, bûye. Disa dî qesîdeya xwe ya, ku destpêka wê:

"Newaya mîtrîk û çengê, fîxan avête xerçengê" de malîkek jî qesîdeyên Diwana Hafîzê Şîrazî gîrtiye ku ev e: "Ela ya eyyuhes-saqî edîr ke'sen we nawîl ha", û dî dawîya vê beşê de, gotiye: "Jî Hafîz Qutbê Şîrazî, Mela er fehîm bîkî razî" û disa dî dawîya qesîdeya xwe ya "Tîpa- T"ê, ya ku destpêka wê: "Mehbûbî bî dîl bît me bî efrazî çî hacet?" de gotiye:

"Ger lu'luê mensûrî jî nezmê tu dîxwazî

Wer şî'rê Melê bin te bî Şîrazî çî hacet?".

Evên han tev delîl in lî ser jîyana Melê, ku dî pey Hafîzê Şîrazî de bûye.

Mewlana Camî dî pîrtûka xwe ya "Nefahat"ê de gotiye: "Hafîzê Şîrazî, dî sala 791'ê hîcrî de wefat kîriye.

Mela, navê Şêx Se'dîyê Şîrazî -dî sala 898'ê hîcrî de wefat kîriye- û navê Mewlana Camî jî -dî sala 691'ê hîcrî de wefat kîriye- dî beyta xwe ya "Newaya mîtrîb û çengê" de gotiye:

"Jî rengê Se'dî yû Cûmî". Ev jî eşkere dîke ku Mela dî pey wan de bûye.

Ev gotînen ku tenê gotînan derheq wan helbestên, ku ew bûyer û navên wan kesan tê de derbas dibî, ne yên Mela ne, jî rastîyê pîr dîrin. Bê guman çî kesê ku teftêşa qesîdeyên Mela bîke û bî qesîdeyên Hafîz û Camî re rûqal bîke, wê bîbine ku Mela hînek nameyên qesîdeyên xwe, jî yên wan gîrtiye, lî ser qesîdeyên wan sekîniye û lî ser rêça wan meşîyaye. Ev jî dîde zanînan ku Mela dî pey wan de bûye.

Disa qesîdeya wî ya dî dawîya "Çapa Cîzîrê" de ku bî zarê erebî ye: "Ya ramîyê qelbî bî sihamîl-lehezatî, heyhate necatî", bî nêzikayî

ve, vê ji ya Fazıl Ehmed Paşa, yê ku alimê dewleta Osmaniyan bû -dî 902 yê hicri de miriye- girtiye. Ev dîde xuyakîrî ku Mela dî pey wi de ji bûye. Ew gotinên dî derheq vê qesideyê de belav bûne, ku ew ne ya Mela ye, ji rastiye dîr in.

Ji van gotinan têtê zanîn, ku ew tiştên Rohûlatnasê Rûsî A. Jaba gotiye: "Ew (Mela-w) dî sala 540 - 556'ê hicri de sax bûye û hemdemê hakimê Mûsilê Emadeddin Zengi bûye". Û disa tiştên ku Wezir Mihe-med Emin Zeki Beg gotiye: "Ew (Mela-w) dî nivê duduyan ji qirna şe-şan yê hicri de jiya ye, û hemdemê Emadeddin Zengi bûye û nusxeyek ji diwana xwe ji hakimê Tebrizê Xanêxanan re, ku ew ji dî wi qirnî de jiya ye, hediye kiriye" ji rastiye dîr in.

Ez guman dikim ku hevdemiya wi (Mela-w) bî Emadeddin Zengi re, ji wê daneberheva ku dî navbera Mela û Mir Emadeddin de çêbûye, hatiye derxistin. Xwediyên wan ditman, wer fehîm kirîne ku ew mir, Emadeddinê hakimê Mûsilê ye. Halbûkî me dî nusxeyeka wê daneberheve da ditiye, ku Mela, pesnê Mir Emadeddin bî Cizirê daye. Û eşkere ye ku Emadeddin Zengi kurê Îbnu Aqsenqer e, ji Atabegên Mûsilê ye û ne ji ehlên Cizirê ye.

Her weha, mesela hakimê Tebrizê Xanêxanan ji, ji wê qesideya wi (Mela-w) ya ku destpêka wê: "Xanêxanan lamî necma te her pur nûrî bî" derxistinê û guman kirîne, ku ew qeside, xitab e ji wi (Hakimê Tebrizê-w) re û pesnê wi daye. Dîgel ku dî wê helbestê de hinek malîk hene, eşkere dikin ku, xitab û pesn e ji mirekî Cizira Botan re. Yek ji wan malîkan-e, gotîna wi (Mela-w) : "Ayet-ul kursi yû en'am, heykela toxê te bîn", disa (Mela-w) gotiye: "Sûrecê Umm-ul kitab madarê hez-ret sûrî bî", ew herdu beytên han îşaret dikin ku "Ayet-ul kursi", sûretê "En'am" u sûretê "Fatihe" yê (yanî Umm-ul kitab-w) lî ser sûra Cizirê hatibûne nivîsandin. Ew eşkere ye û hatiye dîtin lî ser kevîren sûrê. Lewra navdar e dî bajare Cizirê de, ku Quran yan ji hinek ji sûretên Quranê lî ser dormedarê Sûra Cizirê ya ku vegav hedîmî ye, nivîsandî bûye. Hinek jêmayî mîha ji xuya dibî. Ew gotîna wi (Mela-w) dî vê qesideyê de: "Ma Cizirê şubhê darê textê heft îqlîmî bit", van tiştên ku me gotin eşkere dikin.

Disa qesideya wi (Mela-w) ya berî vê, ku destpêka wê: "Ey şehinşahê müezzem, heq hûgehdarê te bî", xitab û pesn e ji wi Mirî (ê Cizirê-w) re. Lewra tê de dibêje: "Sûrecê inna fetehna dor û madarê te bî", ew ji îşaret e bî bal wê gotîna me ya nivîsandîna Quranê lî ser sûra Cizirê. Dî wê de gotiye: "Gerçî der îqlîmê rabî hate textê seltenet", ew

bixwe ji delil e li ser vê yekê. Lewra bajarê Cizirê li ser hesabê parvekirina kevnare, dikeve iqlimê çarem ji her heft iqliman. Ji vanan ji hate zanin ku, ev herdu qeside, çewa hatiye gotin, ku xitab in ji hakîmê Tebrizê Xanêxanan re, û ew (Mela-w) di dema wi (Xanêxanan-w) de bûye, çewt e. Ez guman dikim ku ditin, ji beyta Mela ya : "Ne tenê Tebriz û Kurdistan li ber hukmê te bin, sed weki şahê Xurasanê di ferwarê te bi", hatiye fehmkirin. Lêbelê, ev beyt, nade zanin ku xitab e ji hakîmê Tebrizê re. Belki ji beşa mubalexeyê ye di pesindayina Mirê Cizirê de. Çewa ku eşkere ye.

Disa wisa tiştên ku Secadi ji çapa Diwanê ya Ebdulqadirê Emadi jêderk kiriye, ku ew (Mela-w) di sala 1407'ê miladi de ji dayikê bûye û emrê wi bûye 75 sal û wefat kiriye, yani li dor 900'ê hicri, hinek ji rastiye dîr e, bi nisbet behskirina wi (Mela-w) ji Cami û (Mewlana-w) girtine mana ji hinek qesideyên wi, ku ew di sala 898'ê hicri de wefat kiriye. Hem bi nisbet girtina Mela ji qesideya Ehmed Paşa ya bi zarê erebi, ewê ku di 902 yê hicri de wefat kiriye. Û disa, bi nisbet bi bal gotina wi (Mela-w) ya : "Teşbihê tirên Xan Şeref", ewa ku amaca wi pê, Mir Şerefhanê Hakîmê Cizirê ye. Û ew (Mirê Cizirê-w) ji, li ser gotina xweyiyê "Şerefname" Bidlisi, di sala 1005'ê hicri de sax bûye.

Di pey van ditinan de, ezê ditina xwe ya di derheq jiyana Melê û qirnê wi de, bi hinek delilên mutebertir ji wanên di, bêjim û bawer im ku wê nêziktirê bi bal rastiye ve bin. Ez dibêjim: Mela di dawiya qirne dehemin ê hicri de, yani di pîştî 950'i yê hicri de, jiyaye. Û hemdem bûye bi Şerefhanê kurê Mir Evdal ê ji mirekê Ezizan re, ku ewa na demeka duv-dirêj li Cizirê miriti kirine. Û ew Şerefhan e ku li rojavayê bajarê Cizirê, li ser sûra wê, Medresa Sor ava kiriye û ewi (Şerefhan-w) li ser wê (Medresa Sor-w) gund û erd û aqarên pîr weqîf kiriye. Li gor ku ji tertiba avakirina Medresê û wi şiklê wê yê xweşik û rewşa we ya ku cihê mamostan û şagirtan cuda cuda hatibûne sazkirin, tê zanin ku gelek şagirtên ilmê yê dayimî hebûne û hinek dersdarên mahîr, ku karibûne dersa hemû ilmê fennê, bi jiyaneka baş ve bîdîn, hebûne. Û xwarin û vexwarin û leçuyên wan tev ji kîsî Medresê bûne. Ev tiştên han tev, ji bo belavkirina xwendin û zanin û terbiyeyê, bi rewşeka fire ve li ser hesabê Şerefhan bûne. Ev emîr (Şerefhan-w) li gor gotina Şerefname farisî ya Şerefhanê Bidlisi, di sala 1005'an de (hicri-w) sax bûye. Ewî (Şerefhan-w) ve medresê ji malên xwe, di destpêka mirtiya xwe de ava kiriye û ji bona belavkirina ilmê bexş kiriye.

Ihtimala heri mezin ew e, ku Melayê Ciziri ji, dersdarê we medresê bûye. Û ew ji wek pîraniya alimên kurda yê dîn, sofîy-ul meşreb bûye û dî evîne de, fenafîllah bûye û dî evîniya heqîqetê de, helbestên evindariyê saz kiriye. Ev diwana wi ji, ji vê babetê ye. Zêdetir ji van hawayan, ew xwedîyê lîngên cidayî bûye dî ilmên dîn da, ku wi wextî ders dihatê dayin wek ilmê Usûlê, Fîqhê (Şerîet-w), Hedîsê, Nehwê, Felsefê, Hisab (hejmar-w) û Necmê (Astronomî-w). Gotmên wi dî hînek qesideyên wi de, dî derheq van îlman de, delîl m ku ew dî van îlman de mahîr bûye. Ev rewş eşkere dîke, ku ewî jiyana xwe dî wê medresê (Medresa Sor-w) de, bî dersdayîna ilmê eşkere û hînkirîna ilmê ne eşkere re derbas kiriye. Dî piştî wefata wi de, lî wir (Medresa Sor-w) dî bakûrê medresê de, lî kêleka diwar, dî qubbeyeka dî binê sawiya erdê de hatiye veşartin. Dî nav medresê de, dî deriyekî ku dî banê qubbê de ye, meriv dikare xwe berde bî bal wi ve. Merqeda wi pîr bî nav û deng e û her kes diçe ziyaretê.

Bê guman, nexwe Mela, hevdemê wi mirî (Şerefîxanê Cîzirê-w) bûye. Û dersdariya wê medresê ji kiriye. Qesideya wi ya destpêka wê: "Îro ji şehkasa surê, mey hate fîncana sedef" de, dibêje ku: "Xef wan reşandin dîl xedeng, teşbîhê tirên Xanşeref". Disa pesnê wi (Şerefîxan-w) dîde, dî wê qesideya xwe ya destpêka wê: "Ev şehînşahê müezzem heq nîgehdarê te bî" de, çewa ku me lî pêş ji buhurand.

Disa delîl e lî ser jiyana wi (Mela-w), dî wi qirnî de, ew daneberheva dî navbera wi û Mir Emadeddînê Cîzirî de -ku dî hînek çapan de heye- ku çêbûye. Lewra berî 1000'ê hîcrî, tu mirek bî navê Emadeddîn lî Cîzirê tune bûye. Egen ne, wê Şerefîxanê Bîdlîsî dî pirtûka xwe ya "Şerefname" yê de, navê wi binîvisandîna. Belkî, ev mir (Emadeddîn-w) yek ji birayên Şerefîxan yan jî, yek ji kurapên wi ku dî pey wi de mirîti kirîbe û ev daneberhev dî navbeyna wi û Mela de çêbûbe.

Her wisa delîl e lî ser jiyana wi (Mela-w) dî wê demê de, daneberheveeka dîn ku dî navbeyna Mela û Feqîyê Teyran de çêbûye. Ewê ku lî ser gotîna wi (F.Teyran-), dî wê qesideya destpêka wê: "Dîlo rabe, dîlo rabe" de dibêje: "Hezar sal çîl û yek çûne", dîde zanîn ku dî 1041 ê hîcrî de, ku ew (F.Teyran-) sax bûye. Çewa ku me dî behsa vê daneberhevê de ji gotîye.

Bî van delîlên eşkere, bê şîk, em dîkarîna bîbêjîn, ku Mela dî dawîya 900 ê hîcrî de ji dayîkê fek bûye, û hetanî piştî 1000 î jiyaye, û dîbe ku gîhaştîbe 1050 î û zêdetir jî. Lêbelê ez ecêbmayî maine ku çewa ev rastiya han, jî ber çavên wan dirokvanan wenda bûye û jiyana Mela bî qirnekî dûr ve birîne, dîgel ku lazîm e ew (dirokvan-w) lî ser dî-

wana wi (Mela-w) sekîni bîn û van qesideyên ku me xwe bî wan ve gir-tiye, ditûm ji, û çewa bira van tîştên bîr bî çav nebîrme? Xwedê her çêtir dîzane.

MIDÊ JÎYANA WÎ (MELA-W)

Secadi gotiye, her weki ku me borand, dî wê jêderka jî çapa Eb-dulqadirê Emadi de, ku ew (Mela-w) 75 sal emîr kiriye. Eva han ne dîr e... Lewra lazîm e ku ew (Mela-w) dî paşîya 900 î (hicri-w) de, jî dayî-kê bûbe û heta 50 yê piştî hezari mabe.

NIJAD Û EŞÎRA WÎ

Ew bî eslê xwe Kurd e. Dibe ku, çewa hînek dirokvanan jî gotine, jî eşîra Bextiya be. Ewa ku dî bajarê Cîzirê û dî hawîrdorê wê de be-lavbûyî ye.

XWENDIN Û MERTEBA ILMÊ WÎ

Weke ku têtê zanîn jî wan edetên ku dî welatên kurdan de hene, ewî tehsîla xwendinê kiriye, tevê ilmên olî xwendiyê, lî ser rewşa kev-nare dî hînek medreseyên heremî de, û jî bo xwendinê lî heremên Kurdistanê jî geriyaye, heta ku xwendina xwe lî cem hînek alîman ku-ta kiriye û destûrnameya xwe bî emeka xwe girtiye. Jî helbestên wî têtê zanîn ku ewî (Mela-w) bî zarê kurdi re, yê erebî jî baş dîzaniye û pirtûk û helbestan pê çêkiriye, û dî tevekê ilmên erebî de jî, mer-tebe-yeka wî ya bilind hebûye. Disa jî helbestên wî têtê zanîn ku zarê farisî û tirkî jî baş dîzanibûye. Helbestên Diwana wî jî, didine eşkerekîrîn.

DÎWANE Û HELBESTÊN WÎ

Bê guman, jî diwana wî re cîyekî bilind û bêhempa dî wî welatî (Kurdistan-w) de û dî derveyê welêt de heye. Heta ku rojhîlatnasên biyani jî qedî û qîmet danê û lî Rûsya û lî Elmanîyayê dane çapkîrîn. Însan, pîr kêfxweş dîbî bî gotîna helbestên wî dî cîvatan de, nemaze ehlên tesewwufê û evîndariya Xwedayî. Daxwaziyeka pîr heye ku, ew (xelk-w) jî we re nusxeyek jî diwana wî (Mela-w) bî dest bixîm, welew çîqas bî bîhaki bilind be jî. Çewa ku me lî pêş jî buhurand, diwana wî,

dı zarê kurdi de, dı mertebeya heri bîlind de ye, jı babetê fesahet û belaxetê ve, û dı hempayê diwana Hafîzê Şîrazî û diwana Fazıl Camî (Mewlana Camî-w) û diwana Îbnul Farîz û diwana Fezalî yê dı zarên dın de ne.

KAR Û BARÊN WÎ DI JÎYANA WÎ DE

Ya eşkere ev e ku, ewî jî wek alimên kurdan ên dın, dı destpêka jiyana xwe de, xwe bî xwendinê ve girtiye. Dı pey de, dı hûnek medrese-yên herêmi de ders daye. Çewa ku me lı pêş jî buhurand, ihtimala mezin ew e, ku ew dersdarê Medîseya Sor bûye, ewa ku tê de hatiye veşartin.

SEBEBÊ EVÎNA WÎ

Lı ser sebebê evîna wî gelek gotın jî devên xelkê hatine bîhistin. Yek jı wan e, ewê ku Secadî, jı çapa Ebdulqadîrê Emadî jêderk kırıye û gotiye: Ew (Mela-w) aşîqê Selmaya qıza Melîk Kamîlê hakîmê Hesenkêfê (Heskîf-w) bûye, çewa ku çavên wî jî nışka ve pê ketiye, aşîqê wê bûye, heta ku ew ışqa wî, ketiye mertebeya dîniyê, û jê re (Selma-w) nameyan şeyandiye. Çewa ku dı helbesteka xwe de gotiye:

"Bid-dua bellix tehiyyati lî Selma, ya berid". Û ewî (Secadî-w) dı vî wari de, bî rewşeka wîsa dirêj kırıye, ku aqıl wan tîştan jî alîmekî wîsa bîlind qet qebûl nake. Yek jı wan gotınan jî, pêxeberdana gelên lı dor Cızîrê ye, ku ew (Mela-w) aşîqê keça yekî jî mirekên Cızîrê ku dı zamanê wî de bûye, û navê wê Sîtiya Bîskesk bûye. Ew, jı bo dîtina keçîkê, heroj dîçû bî bal tîrbeka ku lı hember qesra wê bûye, pîştâ xwe dîda kêlîka tîrbê, helbestên xwe yê lı ser evîna wê gotiye. Germayîya evîna wî, wî kevîrî dîsincîrand, heta ku dîbû wek tendûrê. Pîreke kal, bî vê yeka hanê hîsiyabû û wexta ku pîrê dîdît, ku ewî (Mela-w) pîştâ xwe daye kêlîkê, ewê dı pey çûyîna wî de, hevîrê xwe dîbîr pêve datanî, wek nanê dı tendûrê de dîpîjiya.

Lêbelê ez bî van metelokên xîrîfandî ne bawer îm. Belkî ya ku ez pê bawer îm, ew e ku Mela, rehîna Xwedê lê be, cezbeyeka Xwedayî ya sofîtiyê wî girtiye û sergeştê vexwarîna evîna heqîqî bûye, heta ku jî evîna Xwedayî gîhaştîye wê mertebeyê, wek hûnek evîndarên Xwedayî yê dın. Û ewî van helbestên xwe, yê ku ber bî çav, mestî û sergeştî jê dîfûrîn û dı veşartîya wan de jî gîhaştîna bî bal mertebeyeka bîlind ve, dı evîna milûkê zana de, gotiye.

RÎYA WÎ DI SOFÎTÎYÊ DE

Çewa ku ji gelek helbestên wi tête zanin, Mela safiy-ul meşreb bûye. Wek cîvatê sofîyên dîn, bî wehdet-ul wucûdê ve gotiye û nexşebendi bûye.

WEFAT Û CÎYÊ VEŞARTINA WÎ

Çewa ku dî pêş de ji, me çend caran got, wefata wî, li gor ihtimala qewin, li dor 50 yê piştî 1000 î (hîcri-w) bûye. Û dî qebbeyeka başûrê Medresa Sor de veşarti ye. Ewa ku li ber Sûra Bajarê Cîzirê ye, ji aliyê rojava ve. Evên han ew in, ku ji min re pêk hat li ser cîvandîna agahdariyê li ser vi zanayê mezin. Ez li xwe mîkur tîm ku min tam heqê mezinatiya wî, û temamê qenciyên wi yên bilind nedayê. Lêbelê uzrê min, tunebûna cîheki ye, dî vê derheqê de ku ez alikariya agahdariyê jê bixwazim û tunebûna alikariya kesên ku li cem wan tîşteki bî rasti hebe. Tîştên ku ji min hat, min kir. Serkeftin ji Xwedê, îbar û tewkîlî ji li serê.

Ez dixwazim, vê pêşgotinê bî beşek helbestên bî zarê farisî kuta bikim. Ewên ku Şêx Se'diyê Şîrazî, rehma xwedê lê be, pêşgotina pirtûka xwe ya "Gulistan" pê kuta kiriye, lewra li gor vi cîhi ye:

" Bî maned salîha in nezm û tertîb
Zî maher zerre xak uftade cayî
Xerez neqşîstî kezîna bazi maned
Kî hestî ra nemi ya bein beqayî
Meger salûb dilê rozi bî rehmet
Kî ned kari in mîskîn dîayî".

Mana wê: "Ev nezm û tertîba han wê pîr salan bîmine bî rewşeka wîsan ku canê me, dî her cîhi de wê bibe pareyênepar dî xweliyê de. Amaca me ji vê nîvîsarê ew e ku dî pey me de eserek bîmine, lewra ez, ji vê hebûna dîneki, mayîneka daimî nabinim. Hêviya min ji saxên dîlovan ew e ku rojekê ji vi mîriyê geda re dîayan bîşeyînim".

Hemd ji wî Xwedayê werengi re be, ku bî hemdê wî qenci kuta dîbîn û em daxwaziya aşîtiyê û veşartina kêmayîyan dî jîyanê de û dî pey murîna xwe de dîkîm. Selat û sîlavên Xwedê li ser mezinê me yê Muhemmed û li ser al û sîhabiyên wi tevan be. Û hemd ji Xwedayê alemê re.

PÊŞGOTIN

Edebiyata kurdi ya nîvisandi gelekî kevn e. Zîmanê kurdi, berî gelek zîmanên milletên din (wek: zîmanê rûsî û zîmanên slavî yê din) berhemên edebî daye, ku ev milletana îro di nav milletên hevçaxî de xwedî dewlet, azad û serfiraz cihê xwe girtine. Belam sed heyf û mîxabin ku, îro gelê Kurd li hember inkarkirin û derewê dewletên dagirker, dîcadine ku hebûna xwe ya do û îro bi dînyayê bide zanin. Ew dîxwaze di welatê xwe de azad û serbest bîji, li tarîx, çand û zîmanê xwe xwedî derkeve.

Gerçî îro êdî gelek dirokzan û alimên dînyayê, bi îsbat û delîl diroka gelê Kurd ya ku reh û rêçên xwe berî 4 - 5 hezar salan dîgîhine kûraya tarîxê, qebûl dikin. Lê mîxabin ku îro jî ber sedemên siyasî; jî ber bîndestketina gelê Kurd û parvekirina welatê wî û zordestiya li ser zîman û çanda wî; lêkolîn û lêgerîna diroka gelê Kurd, dişwar bûye û gelek tîşt di nav tariyê de mane. Bîlî viya, sedemeki girîng ê din jî ew e, ku Kurdistan jî berê de bûye meydana istîla û cengê; hebûnên çandî-dîrokî, bermayên kevn hertîm hatine xirabkirin û tunekirin. Tenê ew agahdariyên ku gerokê (seyyah) tirk Evliya Çelebî jî sedsala 17'an dide, bes e jî bo vê rastiyê. Ew di gernama xwe de dinivîse ku, di şerê mirê Bitlisê Evdal-Xan û Osmaniyan de, bi sedan cild kitêbên Evdal-Xan hatine şewitandin.

Lê gelo tiştên heyi, bermayên ku xwe gihandine roja îroyîn, çiqas baş tê zanîn û em çiqas li wan xwedî derdikevin?.. Bêşik berî herkesî di-

vê em bî xwe diroka xwe, diroka edebiyata xwe baş bîzanîbîn, lê xwedî derkevin û jê feydê bigrîn, da ku em bîkarîbîn propaganda dijmin pûç bikin.

Jî bo vê armancê me karê wergerandina diwana hozanê meyi mezî Melayê Cîzîrî pêwîst dît. Ev cara yekemîn e ku diwana Melayê Cîzîrî bî tevayî bî tipên latîni - kurdi tê neşîrkirin.

Bêguman di edebiyata kurdi ya klasîkî de, ciyekî Melayê Cîzîrî yê taybetî heye. Diwana wî, ne tenê di edebiyata kurdi de, lê herweha di tevaya edebiyata Rohlatê de, esereke bijarte ye.

Ev esera kurdi ya gîranbîha, jî bo edebiyata tesewufî nûmûneyeke tîpîk e. Çewa tê zanîn edebiyata tesewufî, di hêla zîman û şeweyê hunerî de, jî edebiyata xelkê ya zargotînî cuda ye. Têde felsefa tesawufê (sofîzm) tê nîrîrandin. Di gelek helbestên Melayê Cîzîrî de jî, fîkrên tasawufî, bî gelek gotînen asmanî (abstrak), sergirtî û bî zîmanekî têvel, bî peyvên kurt û mane-dirêj derdikevîn ber xwendevanan. Ew gelek peyvên erebî, farisî (û çendek jî tirkî) bîkar tîne. Jî ber van xusûsiyetên jorîn, famkirîna wan jî bo her xwendevanekî ne ewqas hêsan e.

Lê hûn helbestên wî, yê ku raste-rast lî ser jiyana xelkê, lî ser evîniyê ne, bî kurmancîyeke zelal û vekirî hatîne nîvîsandin. Famkirîna wan gelekî hêsan e.

Melayê Cîzîrî, jî bîl olperestî û tasawufê, di gelek çîqên zanînê de jî gihîştî û zana bûye. Zanîna wî lî ser edebiyatê, felsefê, dirokê û hwd. gelekî hebûye. Wî lî ser rewşa Kurdistanê ya wî çaxî, êrişên Moxolan, bî pîranî ew şer, qirkirin û şewîrandînen lî Kurdistanê ku nemaze bî destê Tirk û Eceman bûne, pîr nîvîsiye. Di hûn helbestên xwe de jî ew lî diji mir, beg û axayên kurda jî serî hildide.

Di derbarî mezînahîya Melayê Cîzîrî de meriv dikare gelek tiştan bîbêje. Me berê jî diwana wî gelek caran xwendibû, lê bî xebata wergerandina wê re, em bêtir lî ser naveroka wê agahdar bûn. Bî rastî ew esereke mezî, xezîneyeke hêja ye.

Me şerha wê nekîr, lê wek gaveke pêş û nuh me tenê ew wergerandî tipên latîni-kurdi û ci-çîyan me şîrovekirin û mana hûnek bêjeyan lî binê rûpelê nîvîsi. Em wîsa bawer dikin ku di paşwextiyê de, lî ser Diwanê xebatên firehtir û pêşdatir çê bîn.

Dı vê pêşgotinê de em dixwazın bî taybetî lî ser du tiştan bisekî-
nîn: 1— Tarixên bûyin û wefata Melayê Ciziri û tarîxa ku wî Diwan qe-
dandîye. 2— Dî derheqa wergerandina Diwanê de hûnek agahdariyên
praktîk jî bo xwendevanan.

Çewa tê zanîn dî derheqa salên bûyin û mirîna Melayê Ciziri de, ge-
lek iddia (têz) hene. Gelek nivîskar, ronakbîr û lêger, lî salên bûyin û
mirîna wî geriyane û lî ser wî gotarên jî hev gelekî cuda û dîrdîrêj nîvisî-
ne. Bêşik dî duwarojê de, bî lêgerin û sêrêşandinê rasti wê derkeve ro-
nahiyê, ku herkes lî ser hemfikir be.

Em jî gihîştin wê baweriyê ku fîkra D.N.Mac Kenzie rast e: Melayê
Ciziri dî sala 1570 de jî dayikê bûye û dî sala 1640 de çûye dîlovaniya
xwe.

Gelo delilên rastiya van tarîxan çî ne?. Pêwîst e em lî vîr, vê yekê şî-
rove bikin.

Dî beşa deskpêkê ya Diwanê de em lî malîka 12'a ketin gumanê ku
dî wê de, Melê wê tarîxa bûyina xwe nîvisî be. Lî gor hîsabê "Ebcêd"ê,
me ev malîk pîşkafî û tarîxek jê deranî ku ev tarîx wek gotîna Mac Ken-
zie 1570 ye. Malîk ev e:

*"Jî herfan mah û salê ma nehat der şiklê xalî ma
Ku ca danendî (zanîn) halî ma sîbîkbaranî sahil ha".*

Jî ber ku Diwana Melê gelek caran hatiye çapkirin, dî malîkên wê
de gelek guhartin jî çêbûne. Ev "*Şiklê xalî*", dî hûnek çapan de, bî "*Şik-
lê falê*" hatiye nîvisandin. Lê belê dî çapa "*Diwana Bexda*" de "*Şiklê
xalî*" nîvisandiye. Çapa "*Diwana Bexda*" ya Mihemed Eli Ewnî ye. Bî
vê ye, me tarîxa bûyina Melê jî bêjeya "*Herfan*" û jî "*Xalî*"yê deranî:

$$\text{ح} + \text{ر} + \text{ف} + \text{آ} + \text{ن} = 8 + 200 + 80 + 1 + 50 = 339$$

$$\text{خ} + \text{آ} + \text{ل} + \text{ى} = 600 + 1 + 30 + 10 = 641$$

Mebest jî bêjeya "*Nehat der*"ê, wê reqem têkevin ser hev û dinê:
339-641= 980. Jî vêya hate zanîn ku Melayê Ciziri dî sala 980 ê
koçê (1570) de jî dayikê bûye. Jî bo ku ev malîk dî beşa destpêkê de
ye jî, çêtir meriv dehf dîde bî bal rastiya vê tarîxê ve.

Tarixa wefata Melê jixwe eşkere ye: Çewa ku Tıxtor Kemal Fûad ji vê malika Feqiyê Teyran lı gor hesabê "Ebced"ê pişkafte:

*"Heft cyn û lam j'hev bûn cuda
Şin û giri disa tê da!"*

$$\text{ع} = 70 \times 7 = 490$$

$$\text{ل} = 30$$

$$490 - 30 = 460$$

$$\text{ش} + \text{ى} + \text{ن} = 300 + 10 + 50 = 360$$

$$\text{گ} = \text{ك} + \text{ر} + \text{ى} = 20 + 200 + 10 = 230$$

$$460 + 360 + 230 = 1050 \text{ (1640)}$$

Herweha tarixa daneberheva wi û Feqiyê Teyran ji tê zanin, ku Feqî dî malîkekê de ew eşkere gotiye:

*"Zanin meddahê kê me!
Dî hezar û yek û sihan" (1031'ê koçê—1621'ê mld.)*

Diwana esasi ew e ku ya bî navê "Çapa Cızirê" hatiye navdarkirin. Ew ji jî 115 beşan sazkeriye. Lê belê hmekan guman kirine, ku beşa 115 yan ne ji eslê Diwanê ya "Çapa Cızirê" ye, wek hinek helbestên Melê yên dîn ku ew ji ketine nav diwanê. Eger em beşa 114'an, jî Diwanê re ya dawî hisêb bikin, jî malika 3'an jî wê beşê, tarîxek dîn ji dixwiyê. Gelo wê ew ji ne tarîxa kutakirina Diwanê be? Jî ber ku beşa dawiyê ye, dibe ku rast be. Ew jî ev e:

*"Lew clif tîn me dî herfên falan
Ku lî şıklê rcqcmê sersalan"*

Ev tarîx me, lı gor hesabê "Ebced"ê jî van bêjeyan girt:

"Şıkl", "Rcqcm" û "Sersal".

$$\text{ش} + \text{ك} + \text{ل} = 300 + 20 + 30 = 350$$

$$\text{ر} + \text{ق} + \text{م} = 200 + 100 + 40 = 340$$

$$\text{س} + \text{ر} + \text{س} + \text{آ} + \text{ل} = 60 + 200 + 60 + 1 + 30 = 351$$

$$350 + 340 + 351 = 1041 \quad (1631)$$

Lı gor vè tarixa lı jor, tè zanin ku Melè dı 1041 ê koçê de Diwanê kuta kırıye. Herweha ji bêjeya ku Melè gotiye: "*Elif tèn me*", ji bêjeya "*tèn*" tè zanin ku elif dıdo ne û herdukên ku dı bêjeya "*Falan*" de ne. Amaca Melè ji bêjeya "*Herf*" an ji, roj in. Çewa ku Ehmedê Xani ji, dı dawiya "*Nûbar*"ê de bêjeya "*Herf*" an dı ciyê rojan de bıkar aniye. Lı gor van herdu elifên falan ku dibine reqemê serê salan, tarix 1.1.1041 dıke (1631).

Me wergera Diwanê bı alikariya van çapên han pêkani: 1— Çapa Mamoste Hejar, 2— Çapa Mamoste Sadıq Behaeddin, 3— Çapa Bênav, ku dı van salên dawi de lı Sitenbolê derketiye. Sadıq Behaeddin ji çapa xwe lı ber 14 (tevli kovaran) çapan saz kırıye. Ew çap ji ev in: 1- Diwana Ehmed Mihemed Zıvıngi, 2- Diwana Taha Ebabekri, 3- Diwana Mai, 4- Diwana Fon Martin Hartman, 5- Diwana Bexda (Eli Ewni), 6- Diwana Ebdusselam Mûrad Naci, 7- Diwana Mihemed Şefiq Erwasi, 8- Diwana Hevlêri, 9- Diwana Mîstefa Qeredaxi, 10- Helbestên mayi yên bı navê kovarê yan ji pirtûkê.

Lê belê dı wergerê de bı taybeti me ji xwe re "*Çapa Bênav*", ku ew ji dı vi cildi de, bı wergera latini re tevayî hatiye çapkırın, esas gırt. Pêşgotina "*Çapa Bênav*" û hın tîbîni bı zarê erebî hatine nivisandin, me ew ji wergerandine kurdi û bı tîpên latini nivisin. Sed heyf û muxabın ku niviskarê wê çapê ne kîfşe ye, ji emekdayina wi ya pır bı diwana Melê re, em gelek sipasiyên xwe jê re pêşkêş dıkın.

Ev çapa ku me wergerande herfên latini, ji 123 beşan avakırî ye. Lê belê wek me lı jorê got, çapa ku bı navê "*Çapa Cızirê*" ye, ji 115 beşan avakırî ye. Me ew heşt beşên dawi ji (ku dı "*Çapa Cızirê*" de nın) bê kêmani wergerand. Lı cihê ku "*Çapa Cızirê*" diqede "*Dawi*" hatiye nivisandin û dı peyra ew beşên dın tèn.

Sernivisa her beşekê (helbesteki) lı gor dengê qafiya wê beşê, her-

fek e. Jı bılı van sernivisên orijinal, me lı serê her beşeki navek nıvisiye. Ew nav, bı taybeti me jı nav wê beşê, bêjeyek, yan hevokek girt, yan jı lı gor naveroka wê beşê me navek lê kır.

Çewa ku me lı pêş jı got, dı diwanê de gelek bêjeyên biyani hene. Jı hemû bêjeyan re wergerandına bı tipên latini dıselıhe, belam jı hın bêjeyên 'erebi re latini pır kê m dıselıhe. Jı bo lêhaydarbûna xwendevan; me tipa (ع) a 'erebi bı (') kılşe kır. Mesele: " 'Eli", " 'Umer", " 'Eqreb" û hwd.

Karê wergerandına Diwana Melê bı tipên latini, bareki pır gıran e. Herçiqas me heqê wê nedayê jı, lê belê bı dıl û can û daxwazi em bı hev re xebitın û tıştê ku jı me hat me kır. Êdî jı nıha pê ve, wê herkes bıkaribe Diwana Melê bıxwine.

Em bı dılgermi sıpasıyên xwe jı xwedıyên çapên Diwanê re û jı wan kesan re pêşkêş dıkın ku alikariya wan dı çapkırınê û wekî dın de gıhıştıye me.

Jı ber kêmayi û xeletıyan ve, em hêvidarın ku wê xwendevan lı me bıborın.

Zeynelabidin KAYA û M. Emin NAROZI

"SIRÊ MEYGÊR"

- 1 Newaya mutrib û çengê fixan avête xerçengê
Were saqi heta kengê neşoyin dîl jî vê jengê
Heyata dîl meya baqi bînoşin da bî muştâqi
Ela ya eyyûhes-saqi edir ke'sen we nawîl ha
- 2 Ku katîb dêmê cedwel kîr, şikeste xet mûselîsel kîr
Jî yek herfan mûfessel kîr, kiye vê muşkilê hel kîr?
Dîzanî rûd û 'ud ewwel, çî tavêtîm surûd ewwel?
Ke îşq asan nîmûd ewwel, welê uftadî muşkil ha
- 3 Jî mîhra wê şefeq se'dê, şîrîn le'lê şeker we'dê
Dîmalîm şubhetê re'dê, ecêb îm lê jî vê ce'dê.
Ke dîl ra tabî her çîneş, bî kufre mîbered dîneş
Zî tabî ce'dê muşkîneş, çî xwûn uftadî der dîl ha

-
1. NEWA: Awaz, bang. ÇENG: Aletê muzîkê, keça reqas. XER-ÇENG: Burcek li asiman. MEY: Şerab, badc. MUŞTAQ: Kêf, dîl-xweşî. EDÎR: Bîgerîn. KE'S: Kas, kasîk. NAWÎL HA :Bîdê, bîgî-jînê.
 2. DÊM: Gurçîkê rû. MÛSELSEL: Rêzkîrî. MUFESSEL: Cuda, Veqetandî. SURÛD: Awaza helbest, Bacî, dilok. RÛD-ÛD: Du aletên muzîkê. ASAN: Hêsayî, rihet, hêsan. NÎMÛD: Lîbat, herket, lûvîn. UFTAD: Bêçarc, cîndar, bêgav. MÎHR: 1) Evîn, xweşî, dostî. 2) Roj
 3. SÊ'D: Navê stêrkekî. LE'L: Lêv. WE'D: Peyman, soz. RE'D: Gurmina ewra. TABÎ: Pêrc, dîgel. TAB: Şên, birqok, çîst. ÇÎNEŞ: Çîhesê, her kî. MÎBERED: Guhartin, guhastin. DÎNEŞ: Ol, din. CE'D: Kczi, Porê honayî. MUŞKÎNEŞ: Mîskîrî, wek mîskê reş û bînxweş. HA: Wê.

- 4 Dî vè taqê, dî vè xanê, me 'eyş û emîni kanê?
Kesê dest dît ji dewranê, nihalek vè gulistanê.
Der axuşêş çû miared, ke ez dîl canêş buspared
Ceres firyadê midared, ke ber bendidê mehmîl ha.
- 5 Bî Qur'anê bî ayetê, eger pirê xerabatê
Bîbêjît secde bîn latê, mîridên wi dîbîn qatî.
Mûrid er bê beser nebwed, zî fermanêş bîder nebwed
Ke salîk bêxeber nebwed, zî resm û rahê menzîl ha
- 6 Şevê zulmat û deryayê, jî mewcân qet xeber nayê
Şikestî keştiya bayê, ecacê wê şefeq dayê
Jî herfan, mah û salê ma, nehat der, şîklê xalî ma,
Ku ca danendî halî ma, sîbîkbaramî sahil ha
- 7 Mera j'ewwel çî bîr xamê? Kîşand axîr bî bednami
Jî rengê Se'dî yû Camî, jî şuhret pê hîsîn amî
Bî deng û bang û awazî, dibêjît nexme ya sazî
Nihan key ma, nedan razî, kezû sazendî mehmîl ha
- 8 Jî Hafîz Qutbê Şîrazî, "Mela" fehîm er bîkî razî
Bî awazê ney û sazê, bîbî ber çerxê perwazî
Tuzed min hubbihes - sefwa, bihî ehl-ûl hewa neşwa
Meta ma telqe men tehwa, deid-dunyâ we ehîmîl ha

-
4. TAQ: Asîman. NÎHAL: Teze, fîdan. AWUŞ: Hembêz (Hembêzîrîn).
MÎARED: Hênîjandîn, xelandîn. CANÊŞ: Can, rîh. BUSPARED:
Spartîn. CERES: Zengîl. MÎDARED: Bîlîndkîrîn. BENDÎD: Bend,
helbest. MEHMÎL: Bar, zorî, dijwarî.
5. XERABAT: Meyxane, xîrbe, wêran. LAT: Pût, senem.
6. KEŞTÎ: Gemi DANEND: Zanîn. SIBIK: Sîwîk. SAHIL: Kenar, qerex,
kevi.
7. SE'D: Sadê şîrazî. CAMÎ: Mewlana Camîyê Kurdî. NÎHAN: Veşartî,
sîr, sergîrtî. MEHMÎL: Cîvat,, meclîs. SAZEND: Tîcnûrvan, sazci

"ÊKSİRÊ EVÎN"

- 1 İsmê te ye mektûbı dı diwanê qıdem da
Herfek qelemê ilmê bı teqwinê reqem da.
- 2 Eşkal û xetên daireyê nûqteyê 'ılm m
Ev neqş û misal m dı xeyalatê 'edem da.
- 3 "Mim" metleê şemsa ehed ayine sifet kır
Lamı' jı 'Ereb barqê lı fexxarê 'Ecem da.
- 4 Da şahidê esma bı hemi wechi bınasın
Yek mesti semed kır bı yeki nexşê senem da.
- 5 Yek gırtiye zulfê û yeki xalê numayi
Ayine bı İskenderi yû camê bı Cem da.
- 6 Erwahê mûqeddes şebê qedran te dıxwazın
Nûra te ye misbahı dı qındilê herem da
- 7 Da wextê liqayê bı te hey bın dı beqayê
Mın neqdê dıl û can dı fenayê bı selem da
- 8 Yaqûtı-firoşan dı kef elması şikestın
Ev sefhayê elması ku neqqaşî reqem da.
- 9 Ya reb jı çı rû, leb bı senaya te ku şayem
Subhaneke len uhsiye fı şe'nike hemden.

- 10 Minnet ji Xudayı ku bî 'ebdê xwo "Melayî"
Iksirê xemê ısqê ne dinar û derem da.

DENGÊ TÎPA (ĩ : A)

"ŞANÊ TE YÊN RIND"

- 1 Meşate yê husna ezel çengalê zulfan tabi da
Da'ısqı hılbit pêl bî pêl, qelbê me pê cellabi da
- 2 Husna hebib û lûtfı yar, avête dıl 'ısqa xedar
Lew selbı kır jê ixtiyar, wê husnê ev icabi da
- 3 Mın di seher zulfên dınest, hatın sema ihranı best
Çûn secdeya xalê bıqest, lew hacıban mihربی da
- 4 Rûh û rewanê mın hebib, disa bî telbisa reqib
Rencide kır miskin xerib, terka dilê ehbabı da.
- 5 Mehbûb û reyhan pur gulav, ker kır lı mın cerg û hınav
Zehra helahl bû dınav, lew saqi ew cullabi da
- 6 Wan dest û zend û sa'ıdan, mey dane şeyx û zahıda
Mesti bî çeşmê şahıdan, ew nêrqıza seyrabı da.
- 7 Miskê reşandı ez dibêm, wan nuqteyan hın bûne kêm
Lê xettê reyhani lı dêm, katıb ji nû ı'rabı da
- 8 Nazık-qeda nûrin-beşer, ew bû lı mın neqşê beser
Dına xıyalı her seher, nav dideyê bêxwabi da

- 9 Ew tiliyên nazîk rehiq, pur da me fincana 'eqiq
Ew bade ya nûrin rehiq, minnet bî mîn wehhabî da.
- 10 Da xef nebit bejna ferî, mey hate şehkasa sîrî
Minnet ku iro dêm-dûrê, disa şeraba nabî da
- 11 Mey hate fincana sedef, kes dê vexut iro bî xef
Saqi bî çeng û nay û def, ferfûriya mehtabî da
- 12 Îde w hebibê nezt e lê, yan dê bîqurban bî "Melê"
Ya Reb bîbînim roj hilê, sikkî dîdest qessabî da.

DENGÊ TÎPA (ĭ : A)

"MUXBEÇEYÊ MEYFIROŞ"

- 1 Muxbeçeyên meyfiroş, her seherê tên sema
Badexuran noşî-noş, mane lî dorê cema
- 2 Hîn gulî bû enber in, hîn dî şêrin esmer in
Hîn guherî daneyin, mîslê suheylê sema
- 3 Hîn zeri ne pûr sîr in, ser bî per in, dêm dur in
Mîn ku dî çerxê we dî, sebr û qerarîm nema
- 4 Sebr û qerarîm ku bîr, can û ceger hûr dîkîr
Zulmê wereng kî dîkîr? Can dîbîr û dîl teba

1. MUX: Melayê zerdeştî. BEÇE: Zarok. MUXBEÇE: Meyger. Zarokê mecûsiya.

- 5 Can û dilê min ew e, horiweşa min ew e.
Padişehê min ew e, ez li derê wê geda
- 6 Yarê ku di em geda, desti bî destê me da
Em bî semayê birin, reqs û sema ji we ma
- 7 Gote me durdaneyê, em ji te û tu ji me yi
Lew bî heqîdet yek in, mes'ele bêşubhe ma
- 8 Da me bî destê sirê, cama ji rengê durê
Cezbe gîha can û dîl, pîr şewîşandin hema
- 9 Bade me noşî ji dest, çûme ji xwo mame mest
Qître bî behrê gîha, behrî bî 'eynê xwe ma
- 10 Goşî bî amê me de, terkê mûdami me de
(Ekserûhum fi xuma, exlebûhum fi 'ema)
- 11 Herfî ji yek bûne fêsl, ger bîbîrî wan bîesl
Herfî dibît yek xetek, xet ku nema nuqte ma
- 12 Wehdetê mutleq "Mela", nûr e dî qelban cêla
Zorî divê mes'elê, ehlê dîlan şubhe ma.

6. GEDA: Parsek. SEMA: Reqş. WE: Wer, wisa, welê.

8. HEMA: Her weha, di ei da.

9. QITRE: Dîlop

10. GOŞ: Guh. MÛDAMÎ: Meyxur. EKSERÛHUM: Pîrê wan. FÎ: Dî
...de, têda. XUMA: Gêj, bêhiş. EXLEBÛHUM: Gelekê wan. EMA:
Kor.

11. FESL: Cuda, ji hev veqetandi.

12. WEHDET: Yekbûn. MUTLEQ: Serbixwe. CELA: Tîjî, (tije), mîşt.

"KA EHD Û PEYMAN"

- 1 Çin-çin kırım zulfên siya, kesk etlesa diba qeba
Êdî nişanî nabîn xuya, têkîl kırım lazîm seba
- 2 Mîn di seba dayê seher, madarê bedrê kîr du ker
Qews û qezeh jê hate der, disa be zulfan ra teba
- 3 Îro jî me l'bedra temam, 'enber- feşan bîn sed selam
Ey hudhudê şîrîn kelam, ehlen we sehlen merheba.
- 4 Mîn dilberêk wek dur heye, mehbûbê şîrîn sur heye
Husn û cemalêk pur heye, Belqîs-sîfet mesken Seba
- 5 Şox û şepala meyperest, ew zalîma hîşyar û mest
Vê nameyê xef di vîdest fî teyyîha neşrun-neba
- 6 Bêj ew şîrîna surperî, durdaneya ez muşterî
Ka ehd û peymanî berê? Bê fayde çûn şubhê heba
- 7 Me d'vê perîya dilberê, lê hê bî uslûba berê
Lê kîfş bîbite j'pencerê, bê û bîçît teşbihê ba.
- 8 Dilber mecala name di, nasi ku nişana me di
Nûnek mûxalîf tê nedî, hel qelbûha nehwe seba
- 9 Neyşekera s'pî dest û zend, zanîm mecala name xwend
Lêvan tebessum kîr jî qend, maset ke banîn fî rûba

- 10 Qasid bı meqşûda me hat, ba mujde û emr û berat
Nişan hınarın hem xelat, şehzadeya gulğûn qeba
- 11 İro mecal lê hat û wext, disa cuwan bû min dırext
Ew lamia dayi ji text, ma kane berqen xulleba.
- 12 Selwa rewan zerrin wereq, çiçek "Melê" din sed neseq
Yaqûtûha yehkiş-şefeq, yehki 'uqûden kewkeba.

DENGÊ TÎPA (ĭ : A)

"DİLÊ HÊSİR"

- 1 Dilber şikina şekerek, fe qultû: Ya rûhi meta?
Go min: Heta xatır hebit, min go: Çikim ez ba heta?
- 2 Zulfan tu bes çin-çin bıke, biskên mûqabil din bıke
Pêşkêşi yek zulfek te bın, mulkê Xeten textê Xeta
- 3 Dıl bendê dava zulfekê, kefti kemenda ulfekê
Hel fi yed-il meftûni şey, ew keyfe esne' ya feta?

-
11. *XULLEB*: Ewrê bê baran.
12. *NESEQ*: Tekûzi, pergal, tertib. *YEHKÎ*: Jê xeber dide. *'UQÛD*: Gerdanlîx. *KEWKEB*: Stêrk.
1. *ŞİKÎNA*: Şkand. *QULTÛ*: Min got. *META*: Kenge. *BA*: Digel
2. *ÇÎN*: Hunandîna por. *XETEN*: Navê welatckî. *XETA*: Navê welatckî.
3. *DAV*: Dahfîk. *KEMEND*: Bend yan jî werisê serê wî helqekirî, jî bo girtina tiştan jî durve. *ULF*: Hogirî. *HEL*: Ma, gelo, qcy. *YED*: Dest. *MEFTÛN*: Ketina fitnê. *SEY*: Tîşt. *KEYFE*: Çawa, çawan. *FETA*: Xort, cuwan.

- 4 Zulfên bı tew şêrin leban, jehri ne şubhet 'eqreban
Lê min ji biska pur giri, iro tenê girtim du ta
- 5 Nisbet peri ziba ye ew, wek nêrgîza yekta ye ew
Ya men rea xilli fe hel, yuşbi bi şey'in qameta
- 6 Jı baxçeya yar zeyyini, bê purs "Mela" sêvek çini
We b'ma ceneytû cenyeti, elqet 'eleyye cinyeta

DENGÊ TÎPA (ĭ : A)

"AGIRÊ CÛDABÛNÊ"

- 1 Bı narê firqetê suhtim, ji ferqê ser heta pê da
Xedenga xefletê nuhtim, ji berqa lamia tê da
- 2 Xedenga firqetê re'd e, dilê ew xefletê lê dît
Dibêjim wer cebel bit ew, bikerbit wê dî gavê da
- 3 Heçî firqet nedi hicran, nebê mîndax û key lê ne
Jı bîl derbê dî hîcranê, fîraqa rûh û can kê da?

5. ZIBA: Delal. MEN: Ki. REA: Dit, (Ditin). XILLÎ: Dosta min.

YUŞBÎ: Weke. QAMETA: Bejn

6. CENEYTÛ: Gunchê min. ELQET: Avêt. ELEYYE: Ser min. CÎN-YETA: Kuştinê.

1. FIRQET: Cuda. NAR: Agir. FERQE SER: Têpîka seri. PÊ: Pî, ling. XEDENG: Tîr. XEFLET: Nagihan, nişka ve.

2. RE'D: Dengê ewran. WER: Eger, wisa. CEBEL: Çiya

3. HICRAN: Xem û derdê dîrketinê. KEY: Dax, birin.

- 4 Jı her bê dax û bê derdi, mepırsın mihnetê 'ışqê
Çı zanın bêxeber, jana dılê dax û keser tê da!
- 5 Kesê mihnet di yû firqet, vexwari cur'eya hıcrê
Giri wan tê bı halê mın, dı vê hicran û zecrê da
- 6 Bı dama muhbetê bend ım, xedenga firqetê dıl nuht
Bı şubhê murxi nim besmel, dı hev wertêm dı xunê da
- 7 Bırûska batını da dıl, dı pêti sine wê wer bû
Ku dê bêtın tebita dıl, dı nav wê nar û pêtê da
- 8 Jı ulfê şubhetê zulfê, medam lew bê qerar ım ez
Ku canê mın eziz iro, çû û dıl wê dı ulfê da
- 9 Jı mehbûb dûr kırım çerxê, felek wê pur helavê tım
Nizanım dê lı ku dıt mın? dı vê dewran û çerxê da
- 10 Hebibê bê xeta kuştım, bı derba firqetê axır
Jı wê rojê dızani mın, ku yar ew tir lı cergê da.
- 11 Gelo disa bibinım ez, çıraya wesletê hılbit?
Bisojim şubhê perwanê, dı ber wê nûr û şewqê da

4. *MIHNET: Ezyet, derd.*

5. *CUREYA: Qulpeka.*

6. *DAM: Dahfik, faq. BEND: Girêdayi, esir, dil. MURXÎ: Navê teyreki heywana ku nû serê jê dibe. NÎM: Niv. BESMEL: Bismila.*

7. *TEBÎT: Tebat, semax, sebir.*

8. *ZULF: Kezi. MEDAM: Hertım, tımı.*

11. *WESLET: Gıhiştın.*

- 12 Bı derbê kewkeba subhê, lı meşrıq zuhre talı' bıt
Zûhel dûr bıt bı şeş burcan û wunda bıt dı xerbê da
- 13 Jı gundûs zuhre peyda bıt, jı hindis muşteri bêt der
Sîpêde dıt sûreyyayê şefeş dıt qametê pê da.
- 14 Jı şewqê ebrûwan bınmêt hilal disa dı qewseynan
Jı xawer bête xurşidi zelum werbit dı nûrê da.
- 15 Bı werdane zeyyinin gulşen, çimen da lale bışkıftın
Bıneş û çiçekan vêk ra, şefeş da yek, dı rewde da
- 16 Seherge 'endelib mest in, jı bîhna werd û bışkojan
Şubhê tûtak û goyinan, dinalın, em dı fîrê da
- 17 Lı kelbê asitanê xwe, ne pîrsi qet hebîb carek
Gelo nayêne birê em? dı vê nêçir û rawê da
- 18 Dızanım şehsuwara mın, xezalek wê dı fetrakê
Bıcayê seydê ez bûma, dı wê fîtrak û bendê da
- 19 Çı heddê sedhezâr can bın, dı fîtraka hebîba mın
Ku sed Cımşîd û Keyxusro, xulam in ser dı vê rê da

-
12. KEWKEB: Stêrk. SUBH: Sıbc. TALÎ: Derketin. XERB: Rojava.
ZUHRE: Navê stêrkekê. ZUHÊL: Navê stêrkekê.
13. QUNDÛS: Taristan. HINDIS: Şeva pur tari. SUREYYA: Stêrkek
QAMET: Bejn
14. BINMÊT: Bınimê, eşkere be, diyar be. QEWS: Kevan
XEWER: Rojhilat. XURŞID: Roj. ZELAM: Tari.
15. WERD: Gul.
16. 'ENDELİB: Bîlûl. TÛTAK: Bûm. GOYÎN: Pepûk.
17. ASITAN: Dergah. RAWÊ: Ravê, nusxe.
18. FETRAK: Bendê dahîkê. BÎ CAYÊ: Bı caweta, bı saya.
19. CİMŞİD: Navê padşahi.

- 28 Hebibê ezmê suhbet kır, dı caman lew şerab anî
Dılê mın di du seyyadan, jı buryan raberi wê da
- 29 Bı tûlên asitani ra vexwendım mir bı dergahê
Bı vi çavi hebib ditım, şukur ev şefqê Mewlê da
- 30 Jı şıklê ebrûwên saqi, hılatın sed hilal iro
We bedrek mın muqabil di, işaret mın jı 'eksê da
- 31 Bı zehrê xwey şerif xwendım, ku xızmetkarê dêrani
Te pur cewr û cefa dine, sılûk û se'y û cehdê da
- 32 Bıçin werdani jı gulzaran, ku exyaran bı dest xar ın
Jı mexsûsanı dergahı, du am ın ew dı hıcrê da
- 33 Bı teşrifa xwe ez xwendım, jı lutfê bende nişan kır
Xelat û şefqê û dıl dan, şukurxwaz ın ku ba xwey da
- 34 Me hadır secdeya şukrê, lı wi 'erdê muqeddes bir
Bı mujganên xwe dur suftın, eni malî lı 'erdê da
- 35 Heya binahiya çehvan, bût û uzza û latê mın
Tu yi pêşber sıcûda mın, sehergahan dı xelwê da

28. *EZM: Daxwaz, vexwend. SEYYAD: Nêçirvan*

29. *ŞEFQE: Mihriyan, dılsoz. MEWLÊ: Xwedê.*

30. *BEDREK: Hivek. 'EKS: Tirêj, wekilandın.*

31. *ZEHR: Zar, zıman. SILÛK: Mayına dı hıcrê de (Bı awayê Tcsawufi). SE'Y: Ger, cehd.*

32. *BIÇIN: Bıçine! (Emrê "çinin"ê). WERD: Gul. GULZAR: Baxçê gul, gulistan. EXYAR: Biyanî. XAR: Dırri, siturin. 'AM: Sal. HICRE: Zindan.*

34. *MÛJGAN: Bijang, peyv. SUFT: Rêtin, rijandın. MALÎ: Maland.*

- 20 Dı deh salan mulazım mam, û yarê rû ne da carek
We ger ne, yar eger rû dît heye carek dı salê da
- 21 Dılo mızgin e mın şa be, ku sultanê me dê bêtin
Jı mın bawer ke, peyxami seher mızgin bı mın pê da
- 22 Şukur binahiya mın hat û Ye'qûb dıde rewşen bû
Bıbûya Yûsûfê Mısri, lı Ken'anê beser peyda
- 23 Nesimê sunbul û sêvan, seher da hebs û zindanê
Vebû qufla me bê mifte, zıngini jı quflê da
- 24 Fıraqa şev bı axır çû, sipêde kıfşı bû dısa
Merixa-nehsı ava bû, xuya bû roj dı şerqê da
- 25 Dı çerxê wek nucûm dê m-dûr, sema hatın qıranayek
Heyiva bedrê bû ew sırperi mın di dı reqsê da
- 26 Jı wadi eymena dilber, nızam enguştek izhar kır
Ku xweş enwar û berq in ew, tecella bûn dı Tûrê da
- 27 Qırana zuhreyê mın di, dı ber 'eqda sureyyayê
Jı perwinan dıbêjim eks e hêj kefti dı camê da

20. *MULAZIM*: Xızmetkar.

21. *PEYXAMÎ*: Qasid, xeberbir.

22. *YUSUF*: Üsiv Pêxember. *YE'QÛB*: Yeqûb pêxember.

23. *NESİM*: Bayê sibê.

24. *FİRAQ*: Cudayi, duri. *AXIR*: Paş, dawî. *SPÊDE*: 1) Berbang. 2) Stêrka sibê.

25. *NUCÛM*: Stêrk(an). *QİRAN*: Nêzikayi. *BEDİR*: Hıva çardeşevî.

26. *WADÎ*: Newal, dol. *EYMEN*: Aliyê rast. *ENGUŞT*: Tili, bejn. *BERQ*: Brûsk. *TECELLA*: Diyar, eşkere. *TÛR*: Çiyayê Tûr.

27. *'EQD*: Gerden. *PERWÎN*: Stêrkek.

- 36 Lı bal 'ilmê te me'lûm e, jı jinê mın tu meqsûdi
Fidayê can me dê can bıt, dı qesta wesl û dinê da
- 37 Bı husna xwe Îlahi ki, bı sehın û heybeta dinê
Nıcûm û kewkebê lamı', jı bala tên bıbejnê da
- 38 Bı xalên werd û nesrinan, jı qudret xet kışandi lê
Bı terha nêrgıza êli, sehergahan nesim lê da
- 39 Ku tûlê asitani, dûr neki êdi jı dergahê
Jı ba xwo vi ricû nakın, dı babê lıtf û rehîmê da
- 40 Tu narê firqetê zani, dıkarım ez tehemmûl kım
Dıyarê kohê Qendil ım, meger fil ım dı 'ışqê da
- 41 Zehi derdê mezın firqet, ceger sot ateşı da dıl
Cihê sebrê nema çendan, ferec mın dı dı sebrê da
- 42 Mela bê qameta yekta, qiyamet mın bı çehvan di
Fıraçê rûsiya bın, te jı mın canê şırın cê da

37. SEHM: Saw, tırs. DINE: Ditinê. BALA: Bılind, jor.

38. NESRİN: Gula sıpi. Ê LÎ: Bılind, berz.

41. FEREC: Felat (Fereca xêrê).

42. CÊ DA: Cihê kır, cuda kır, qetand.

" DAXWAZÎ "

- 1 Serê zulfa te bî kullabî dua
Hate destê me bî cullabî dua
- 2 Sofiyê xelwenûşin bine sicûd
Herdu burhên te ne, mûhrabî dua
- 3 Erzîki dê bîkırım sûretî-hal
Ku tu yî qible yê erbabî dua
- 4 Jî duayê qedeheke der dest e
Her seher mestê meyê-nabî, dua
- 5 Gulê îqbali jî gulzarê qebûl
Me çînbû dî şekerxwabî dua
- 6 Ber du birhên te jî îxlas û yeqîn
Me dîbîr secde bî adabî dua

-
1. KULLAB: 1) Hinkirîna heywanan jî bo nêçirê. 2) Seyisê heywanên nêçirê. 3) Qulab, hesîneki sertûj. 4) Toq. CULLAB: 1) Gulav, ava gulan. 2) Celb. 3) Şemate; qelebalix
 2. XELWENÛŞÎN: Mayîna çîl rojan dî sîlûkê de.
 3. ERZÎKÎ: Daxuyani. BÎKIRIM: Bîkîm.
 4. MEYÊ-NABÎ: Şeraba xalûs.
 5. ŞEKERXWAB: Xewa şîrin. Xırmaş.
 6. ADAB: Edeb, terbiye.

- 7 Jı dilek safi tu mîhrabê bîbin
Secdeyek lazîm e der babî dua
- 8 Me dî dîl 'urwetê-wusqa ye bî dest
Jı senaya te ser elqabî dua
- 9 Jı ezel yek cihetî daye "Melê"
Her me îxlas e jî esbabî dua

DENGÊ TÎPA (ب : B)

"DÎDARA EVÎNÊ"

- 1 Destê qudret ku hîlavêti, jî bejna te niqab
Lî cemala ceberûtê, me neman perde w hicab
- 2 Lî gulên tey ter û nazîk, ku seher girti xunav
Dî ebarîqê qîninan, jî hesed suhtî gulab
- 3 'Eynî kafûrî ye meşreb, me jî husna te ye saf
Lew jî 'îşqa te dî dîlda, me vebû 'ilmê 'ubab
- 4 Me jî ser çeşmeyî-heywan, qedehek safî vexwar
Nagîhê lezzet û zewqa me, bî sed cîldê kitab

7. DER: Lî, dî... da. BAB: Derî

8. SENA: Pesîn.

9. ELQAB: Nasnav, leqeb.

1. CEBERÛT: 1) Qudret. 2) Şên. 3) Mezinayî. 4) Qehr.

2. EBARIQ: Mîsin. QINÎN: Şûşe. GULAB: Gulav

3. UBAB: Lehi. Pêlên behrê. 'EYN: Kehni (kani).

4. Dî beytê de "Çeşmeyi-heywan" bî mana "Ava Heyatê" ye.

- 5 Lew dî çengê me dixwûni, ku dî 'îşqa te bî saz
Me bî bejna te dixwûnî, ney û qanûn û rubab
- 6 Qelhweya telxi dîgel zehra helahlî bîderî
Me jî destê te mûbarek, şekeramîz e gulab
- 7 Qulzûmê 'îşqê jî bayê xwî mûxalîf demekê
Dî hemamâtê 'ecacê me lî ser destê xûrab
- 8 Seherê xudrê 'înayet, ku bîrîn çeşmeyê dîl
Bî cihanê me nezer da, ku cihan 'eynî serab
- 9 Bî hebabê mebe mexrûr, wehe sergeşt e "Mela"
Bavê ber keftî ye, wê beyhûde sergeşt e hebab
- 10 We ye Hudhud jî Seba bêt û bîzan î n çî ye hal
Ku lî halê me xerîban, ne sûal û ne cewab
- 11 Herdu bîrhên te ne nuhabî çî îman û çî kufr
Bûd û nabûd ku yek î, ev çî sewab û çî 'îqab?
- 12 Were nîşanî "Nîsanî" de xwî bê perde seher
Lê jî xûnê bîke perhîz ku şehîdan çî îhsab?

5. QANÛN Û RUBAB: Du aletên muzîkê ne.

6. TELX: Tehl. ZEHR: Jehr (jehri). HELAHIL: Giyayeki ku jehr jê çê dibe. ŞEKERRAMIZ: Şekerav, qend.

7. QULZÛM: Behr. XURAB: Pêlên behrê yê nî mezin.

8. XUDR: Kesk. Xocê Xîzîr. ÎNAYET: Alîkar. SERAB: Leylan

9. HEBAB: Peqpeqokê avê. WEHE: Wîsa, waye. SERGEŞT: Sergêj.

10. HUDHUD: Sîlêmanê du nîkul. SEBA: Navê bajarekî Yemenê ye.

11. BÛD: Bûn. NABÛD: Nebûn. SEWAB: Mîkafat. 'ÎQAB: 1) Ceza.
2) Padaşti.

12. NÎŞANÎ: Nasnavê (leqeb) Mela ye.

"TE DIZANIM TE DIBÎNIM"

- 1 Lillah-il hemd ji yarê , me dî dest cam e lebaleb
Jî lebê noşi peyapey, dî dîl ilham e lebaleb
- 2 Dî riya wan xet û xalan, ku ne herfên qelemin ne
Me ji feyza te ye mestane, rewan cam e lebaleb
- 3 Mestê şehkasê meya cazibe yîn rûhi dîdît me.
Rûh dîzanît ku jî ber lezzetê 'îşq mame lebaleb
- 4 Nêrgîza mestî jî bala çîmena sunbul û gul tê
Qedehê taze bî destê xwe tenê da me lebaleb
- 5 Wehdetî sîrf e me meşreb, te çî êksîrî wicûd?
Em lebaleb çî lebaleb? bîxwe hem cam e lebaleb!
- 6 Şem' û perwane bî zatê xwe jî halê me dî dîr in
Ateşek sîrf e jî 'îşqa te vewestame lebaleb.
- 7 Qedehek taze jî 'îşqê dî ezel da me hekimê
Jê dînoşîn hey û hey, hê bîxwe cama me lebaleb

1. *LEBALEB*: 1) *Şuşa tîjî (dagirti)*. 2) *Libo-libo*. 3) *Lebê*. 4) *Lev*.
2. *FEYZ*: *Bereket*. *REWAN*: *Çûyin, herîkin, Ruh û can*. *ÇAM*: *Şiir, helbest*.
4. *BAL*: 1) *Bejn*. 2) *Bazû*. *BALA*: 1) *Bilind*. 2) *Jor*.

- 8 Carekê gohti: "nişani", ne "Melayî", were bani
Ev dixwast me, jî dîl û can û dîhen, kam e lebaleb
- 9 Te dîzanîm, te dîbinîm ku tu yî nûra wu cûdê
Ellah Ellah jî çî nûr e, dî seraya me lebaleb
- 10 Jî 'mayet nezerê xass e ku her mesre' û beytek
Qedehên abêheyatî ne dî şî'ra me lebaleb

DENGÊ TÎPA (ب : B)

"ŞEHSUWARÊ KURD"

- 1 Şah bî qesda kuştîna min, rîm hejandî bê sebeb
Da me çêşmê qehr û xêşmê rîm lî dîl da, go: "Edeb"
- 2 Kuştîyên didar û dinê bê xeta her deh sed in
Her seher disa jî nû, wên têne kêrê sed celeb
- 3 Dê jî çêrxê pencemîn bêtin, tenezzul kîr merix
Mîslê şêmsê ger kîşînitî lî wan tixên xezeb
- 4 Her mecala ew dî cengê bêt û rêt her carekê
Rast û çep dê bêxîtin sed sed bî mîzraq û qeseb

-
1. ÇEŞM: 1) Çav. 2) Awir. XEŞM: Hêbet. Zordestî.
 2. DÎDAR: 1) Rûyê xweş. 2) Çavpêketin. CELEB: Pezê kêrê.
 3. ÇERXÊ PENCEMÎN: Asimanê pencean.
 4. BÊZ Û RÊT: Bê û biçe. QESEB: Rîmên dirêj.

- 5 Rostem û Cımşid û Xalid, Hemze yan Şêrê 'Eli
Aferin ya şehsuwarê Kurd û rimbazê ereb
- 6 Lê lı tûlê asitani, "çix" bı wan le'lan kırım
Dergehê fethê vebû, iro lı mehcûrân 'eceb
- 7 Bendeyê sadıq seher amancê reştûzên xwe kır
Mın bı qewlê dijmınan, dıt ber xedengan bê sebeb
- 8 Leşkerê qehr û xeman, wê çûn hesara dıl bıkın
Ke'be û Beyt-ül Heram e, lê bınûr bêtın receb
- 9 Suftiyên pur le'l û mircanan bı mujganan, heta
Dide rewşen bûn, bı dına dêm-dûrê simên xebeb
- 10 Ê bı Xudrı ra, divêt ava heyatê bıt nesib
Dê bı se'y û cehdê yeksan bın lı bal wi roz û şeb
- 11 Xızmeta pirê muxan dê kıt, kesê meqsûd e mey
Şişe û cama zucacê yê divêt, dê ret Heleb
- 12 Cewrı Hindê dê kışınıt, her kesê tawus divêt
Gewher û durra-yetim, bê terki ser têtın teleb

6. *MEHCÛR*: Macır, bê tékılı.

7. *REŞTÛZ*: Awirê çawa yê tûj. *XWEDENG*: Tır.

8. "*LÊ BI NÛR BÊTIN RECEB*", dı hın çapên dın da weha ye:
"Dê neborit lê rccc̣b"

9. *XEBEB*: Bırıqandı.

10. *YEKSAN*: Beranber, yekser, dûz, her zeman.

11. *PİRÊ MÛXAN*: Pirê Meyxanê. *RET*: Here! (çûyin)

12. *CEWR*: Zehmet, cefa, diwari. *HIND*: Hindistan.

- 13 Xefleti ew keşşîfî, şêr dest bî dest hatin ceger
Go: Xebînet ya "Mela" mîskîn me lê ker kîr kezeb

DENGÊ TÎPA (ب : B)

"EZÊ BEXTREŞ"

- 1 Mîn dî dîl kovan hezar in, dax û keyber bê hisab
Mîhneta werdên bî xar in, wên dî dîl da sed nişab
- 2 Sed nişab in mîn dî dîl iro jî xarên sorgulan
Yek bî yek peykan çevi bûn çûne cergê da kulab
- 3 Pur bî wan cerhan xwe tir in, lew ku wê derman dîkîr
Şerbet û ava heyatê şeker û qend û gulab.
- 4 Ger du sed peykan dî nîva dîl bûwan, dê xweş bûwan
Her dema kewkeb bîdîna necm û perwin bê hicab.
- 5 Zuhre û 'îqda sureyya keşşîfî bûn ew dî şerq
Sayeya bextê me dayê ma lî ser perde w niqab
- 6 Wajîgûn dewrê numa mîn, çerx û bayê lewleban
Kewkeban seyra mûxalîf girt û tîkîl kîr hisab

-
1. KOVAN: Birin. KEYBER: Birinê tira. XAR: Dîrî, îstîrîn. NÎŞAB: Tir. "DAX Û KEYBER BÊ HISAB", dî nusxekî da weha ye: "Dax û key pur bê hisab".
 2. PEYKAN: Sîntîrîk, sertîr. PEYK: Qasîd. Peyha stêrhan.
 6. WAJÎGÛN: Vacîkîrîn, qelîbandîn.

- 7 Vêk ketin şems û zuhel iro dî burca eqrebê
Seyfî çû destê merixê mulkê dîl lew bû xerab
- 8 Lew tenezzul kîr merixê newbe çû dewra zuhel
Çû teref mihra sîpîhrê nezzîlî 'erdan'ezab
- 9 Lew bî şeş burcan 'etarîd, j'afîtabê dûrî bû
Lê zuhel bû muşterî avête çerxê inqîlab
- 10 Şewwîşî nezma nîcûman hey'eta çerx û brûc
Lew lî wed'ek dernetetî mah û zuhr û afîtab
- 11 Munqelîb mîn dî menazîl vaji ew seyrê dîkîn
Yek bî yek xwûn jê dîbarîm ateş û lem' û şîhab
- 12 Zuhre-çengê ev suwaj dî, ew jî çenk avête çenk
Xweş lî pê qanûnê wê guh de tu qanûn û rubab
- 13 Ez dîbêm axîr-zeman e dê qiyamet rabîtîn
Lew şeva tarî kîşandî yû nehişt eswed-xurab
- 14 Xweş lî mîn alem siyah ma, stêr û kewkeb qet neman
Ez jî vê rojê dîtîrsam, axîrî zû kîr şîtab

7. LEWLEBAN: Pîraniya ''lewlecb''e (lewlecbê meşka dcw).

8. SÎPIHR: 1) Asîman, 2) Bext.

9. 'ETARID: Stêrkek geroke. AFÎTAB: Roj, xurşîd.

10. VED'EK: Rcwşek.

11. LEM': Tirêj. ŞÎHAB: Pîzotê agir.

12. SUWAJ: Herb, sosret.

13. ESWED-XURAB: Reşbelêk.

14. ŞÎTAB: 1) Rev. 2) Lcz.

- 15 Ev ne ew 'iqlim e ya şems û kewakıb tê bî seyr
Ez ne wê 'erdê dibinim, ya ku lê ew mahitab
- 16 Cinn û teyyarek me di wer bû dî min wînda kırım
Dame ber pence w kulaban hulfirandim wek 'u qab
- 17 Sufle wê inam û avêtım zemina zulmetê
Lê ku hîşyarım, gelo yan xewne min diti bixwab
- 18 Dêwê mel'ûn û munafiq ê Xwedê rû reş kîrî
Ma bî bala hîlkîşitın aqibet çêbît selab
- 19 Ehremen te'limê da bû, ebyedî dest tê hebû
Pur bî vê te'lim û rayê hatî bû çû bû xitab
- 20 Sır-peri 'illet nîzani sîhriya ebyed dîkît
Pur xelet erzana me dî der heq xwe ew alî cenab
- 21 Ahê eyyamên wisalê weh ku xweş borin û çûn
Ew şeraba 'îş û noşê ma lî pêşber min serab
- 22 Şerbeta şîrin leban zehra helahlî bû dî nav
Lew bî narê firqetê axir lî min dîl kîr kebab
- 23 Hudhudek xweş teb'ê min iro dîvê her wek nesim
Da bî bal dîlber hınara baniya disa cewab

16. TEYYAR: Mari teyyar, lezefîr.

17. SUFLE: Berjêr, serberjêr, perîşan.

18. SELAB: Qazox, hîşk. Daleqandîn.

19. EHREMEN: Şeytan. EBYED: Mirê cîna. Spîrî. Ziv. Faq.

21.. 'ÎŞ: Jin. Zewq.

23. HINAR: Peyu, xeber, danezan, mcsaj.

- 24 Erzê halê min bigota yê bî 'inwanê edeb
Asitan bıkra ziyaret çetr û seywan û tunab
- 25 Da dî çeşman, min werina xakê, her wek tutiya
Ya hebib pê lê nihayî baniya wê ew turab
- 26 Her kesê rabi dî behsê carekê mehder bıkıt
Xeyrî heftê hec didêrit, bel ku bêhtır ew sewab
- 27 We'de da bû dê şehid kım wî, bî şîrê xwey şerif
Ma nebi iro peşiman ew jî tedbira sewab
- 28 Şerhê halê min "Mela" narît beyadê hê temam
Vê sewadê gerçi herdem jê bîrîn sed intixab

DENGÊ TÎPA (پ : P)

"RAST Û ÇEP"

- 1 Lew seher cewlan dıdıt bayê sebayê rast û çep
Sosın û sunbul bî mesti bèn semayê rast û çep
- 2 Da jî mihraza du nûnan secde bît Eswed-hecer
Dıl bî mizan mahê new ebrû numayî rast û çep

24. ÇETIR: Gutıl, tıl. TUNAB: Kon, çadır.

25. TUTÎYA: Dermançî çava. TURAB: Ax, xak, xwelî.

26. MEHDER: Şefaet.

28. BEYAZ: Sîpî. SEWAD: Reşayi. ÎNTÎXAB: Hîlbijartin.

1. CEWLAN: Ger, tûr.

2. DU NÛN: Du çav. MÎZAN: Mêzin, terazi. BERAMBERÎ: Burcek lî asîman. NUMAYÎ: Diyar kîr, eşkere kîr.

- 3 Dıl jı bıska filfilin bû fir dıda xala siyah
Şehperê zulfa şepalê dalı dayê rast û çep
- 4 Alemek wêranı zulfên te, jı rengê 'enberê
Çerx û perwazê dıdın carek, lı bayê rast û çep
- 5 Xencer û tir û teber barin şıbıh berq û brûsk
Mısriyan lamı' jı elmasan dıdayê rast û çep
- 6 Teyrik û 'ıqd û şurab û netrik û berg û wereq
Her bı lerz û cezbeşên yaqûti ta yê rast û çep
- 7 Bışkuwên benda gırıbanê jı rengê kewkeban
Berq û tirêşên jı xurşidê vedayi rast û çep
- 8 Kewkeb û qewsê qezeh, lu'luê benda heyderi
Tên tewafa zulf û xalên dılrûbayê rast û çep
- 9 Dıl dıxunıt zulf û xalan, dêm û balayên jı nûr
Her bı qanûn mujdeya xeybê jı nayê rast û çep
- 10 Zengiyan cewşen vebestın pêşberi cûqa Hebeş
Daberistın yek bı yek çûn ber liwayê rast û çep

-
3. ŞEHPER: Pirtikê per ê dirêj. Serkezi. ŞEPAL: Cuwan, spehi, xwin-şirin, dclal.
 5. TEBER: Zerg, kuling.
 6. TEYRIK: 1) Teyrke ku lı zêr digere. 2) Navê xısrcki jinan e. 'IQD: Gerdanlıx. ŞURAB: Pelpelok, pelik. NETRIK: Guhar. BERG: Belg, pel.
 7. XURŞİD: Roj
 8. QEWS: Kevan. QEZEH: Keskesor. LU'LU: Sedef, inci. BENDA HEYDERİ: Kemer, pişteş. DILRÛBA: Dırevin, dılkışên.
 10. ZENGİ: Zenci, reşık. ÇEWŞEN: Sing, zırx, coş.

- 11 Çınqeçınqa bışkuwan awaz û dengê zerguwan
Sed melayık guh dıdın ber wê newayê rast û çep
- 12 Lew ji 'ışqa wê dinalın bazın û berg û wereq
Cezbeya dıl mın ji remza wan gehayê rast û çep
- 13 Zuhre û 'ıqda sureyyayê dı şerqê keşşıfın
Leylet-ül qedre ji mexrıb perde dayê rast û çep
- 14 Zuhrerengê mah û xurşidê ji bala wê nıma
Lew du kewkeb çûne vê ra istiwayê rast û çep
- 15 Bête eywanê ji xulwê horiya qudsi sırışt
Sed hezaran rûhi qudsi tên liqayê rast û çep
- 16 Ma "Melayı" ez lebi le'l abı-heywan bıt nesib
Qudsiyan ragırtıyın destê duayê rast û çep

DENGÊ TİPA (ت : T)

"ÇEP Û REST"

- 1 Nêrgızên şengi dı mest ın çep û rast
Saqiyan cami dı dest ın çep û rast

12. REMZ: Nişan. NİMA: Numa, diyar.

14. İSTİWA: Xeta istiwayê li asıman.

15. SIRIŞT: Xûş, tebi'et.

16. ABI-HEYWAN: Ava heyatê.

1. ŞENG: Xumar. Delal, spehi.

- 2 Rast û çep têne ceger sine kulab
'Er'erên şengi dîlestin çep û rast
- 3 Tox û ala ku xuya bûn jî 'Ecem
'Ereban tipî şikestin çep û rast
- 4 Ber vîşerqê dî seherê westayîn
Hîndûyên rojî-perest in çep û rast
- 5 Qeyserê Romê lî ser heddê Fîrîng
Toq û zincirî vebestîn çep û rast
- 6 Herdu destên xwe hemayîl, şevêkê
Me jî bo yarê dîxwestîn çep û rast
- 7 Ve "Melê" sır-periya horî-sîfet
Sed melek destî bî dest in çep û rast

DENGÊ TIPA (ت : T)

"WER JI BER PERDÊ"

- 1 Ger jî wê horîsîrîştê 'îşweyek îzharî bî
Dê bîbî narê Xelîlullah û doje sarî bî

2. *ER'ER*: Navê darekî ye. *DILESTIN*: Dîleyîştin, dîlistin.
 3. *TOX*: Nişan, tac.
 5. *HEDD*: Tixûb, sinor. *VEBESTIN*: Saz kîrîn, vedan.
 7. *VE*: Vin, xwestin.
 1. *ÎŞWÊ*: Pçyv. Naz. îşaret.

- 2 Wer jı ber perdê yedê beyda bı mu'cız bête der
Şems û kewkeb dê hılên alem teji enwarı bıt
- 3 Wer jı 'eksa xemriyan qewse qezeh dıt yasemin
Dê gul û reyhan bıbarın t êk û t êk gulzarı bıt
- 4 Şem'ı dê can dıt jı şewqê, bête ber subhê nefes
Narıt axır ger bı mûyek behsê zulfa yarı bıt
- 5 Sılsıla behsê jı xûna dıl, ber an zulfa bıçın
Dê xeta bıt navê misk er nafeyê tatari bıt
- 6 Toqê gerden helqeyê zunnarı zulfa yarı mın
Dê kılita kelbê 'ışqê helqeya zunnarı bıt
- 7 'Eqda ihramê dı 'ışqê da ku pirê 'ışqê best
Dê çı xem ger xerqê rehnê xaneyê xemmarı bıt
- 8 Gezmeyek qewse şevin aşıq bı nêva dıl kevit
Dê jı can destan bışot xasma kevan nûbarı bıt
- 9 Wer jı qewseynan bı mizan bête der cotek xedeng
Dê ceger bıt pare-pare, sine tar û marı bıt

2. YED: *Dcst.*

3. ENWAR: *Nûr (pr.)*

4. ŞEM: *Çıra, mûm, fınd.*

5. AN: *Wan, ew.*

6. ZUNNAR: *Kemera xaçporêzan.*

7. EQD: *Niyet, mebest. Grêdan. BEST: Gırêdan, tewlandın. Kırın.*
XERQE: *'Eba. REHÎN: Gerew. XEMMAR: Meyxaneci. Notırvan.*

8. GEZME: *Sıntırık, sertir.*

9. XEDENG: *Tir. SÎNE: Sing.*

- 10 Xwûn ji mêlakê bî derba xencerê ger bête der
Bû şehidê 'îşqê êdî, dê jî ku hîşyarî bît?
- 11 Dê jî wan le'lan şifayê dîl bî qanûn telbe kî
Da îşaret xweş bîkî herçî kesê bimarî bît
- 12 Bulbulê mecrûhê 'îşqê taqeta xaran nîhîn
Dê gulava rişê sine bîşkuwek bê xarî bît
- 13 Her dîlê bazi-sifet dê seydi teyxûnek we bî
Fîr û perwazê hemayî penceyê şunqarî bît
- 14 Yarı dê hakîm bîtin, qewlê reqîban guh nekî
Şahê mulkê dilberê dê fa'îlek muxtarî bît
- 15 Dîl bî zulmê nasoji xenc û xet û xalên dî dîl
Xeyrixwahên dewletê mirî jî wan guhdarî bît
- 16 Teyrê dîl bê tem'ekî nayête dest şehzadeyan
Qoşîçî şahin dî destê wî dîbê azarî bît
- 17 Bendeyî ba xwey bîvêt dê meylî sim û zer neket
Da 'etaya padişahan bê hed û îjmarî bît
- 18 Sar dîbît dîl ma bî sed cewr û cefayan zerreyek?
'îşqê teb'et naz e, hîngî dê bîçît dîjwarî bît!

11. *BÊMAR*: Nexweş, bêhal.

12. *MECRÛH*: Bîrindar. *XAR*: Dîrî, stîrîn.

13. *BATÎ* : Teyrê baz. *TEYXÛN*: Navê teyreki. *HEMAYÎ*: Bextiyar. *ŞUNQAR*: Navê teyreki.

15. *XENC*: Naz. *XEYRIXWAH*: Xêrxwaz.

16. *QOŞÎÇÎ*: Bezoke.

17. *SÎM Û ZER*: Ziv û zêr. *'ETA*: Dan (dayîn).

- 19 Leşkerê alem meger yekser, te dijmin bîn "Mela"
Xem bî mûyek nakışini, ger te dilber yarî bî

DENGÊ TÎPA (ت : T)

"QELBÊ ME ŞİBHÊ ZÊR E"

- 1 Qelbê me şubhê zêr e jî feyza te cêla girt
Ma rûsiyeh û sıfrê sifet rengê sefa girt
- 2 Teşbihê bî cedwel me dî nêv ateşê 'ışqê
Dîl qelbê heqîqet bî û iksirê hema girt
- 3 Salık ki ye hati jî mecazê bî heqîqet?
Sûret te şunasi yû bî me'na ne fena girt!
- 4 Tenha, ne lî mîn lamiê husna te şefeq da
Alem bixwe wê husn û cemalê dî xwe da girt
- 5 Teyxûnê dî destê te zehî dewlet û iqbal
Herçî te birî damê dî tora xwe huma girt
- 6 Canê xwe me kîr daneyê dava ku vedayî
Ahûsifet ew pê hîsiya rahî xeta girt

1. RÛSÎYEH: Rûreş.

3. SALİK: Rêwî. ŞUNAS: Naskırın, zanîn.

5. ZEHL: Wêke, çendî. DEWLET: Bext. HUMA: Piroz.

6. DANE: Tene, tov, dendik, heb, gulle. AHÛ: Xezal. RAHÎ: Rêwî, nêçirvan. rêçîk, şop.

- 7 'Enqa ne şigara kes e, davan tu biçin ver
Dava ku lı 'enqa tu vedi badihewa girt
- 8 Herkes seherê talibê tıştek bı çimen hat
Hın sosın û hın sunbul û hın zulfê duta girt
- 9 Destê me seher girt û bîrın seyrê, hebibê
Filhalı reqibi ji hesed lerze û ta girt
- 10 Ew kebkê xeraman ku dı kozê lı qeba hat
Şahinê qedayê bı texaful ji xwera girt
- 11 Zinhar e kesê destı bıbit erqemê ser wê
Bê 'işweyê le'lan ne bı teslimê jiha girt
- 12 Sebrê beri şırin e we ustadı xeber da
Lew dıl me bı tehli yû xeman, xurrem û şa girt
- 13 Her neşter û şewkên, ku hebibê, me lı dıl da
Mın yek bı yek û têki lı derdê xwe şifa girt
- 14 Aşiq ji xemê sayeyê wê, camê teleb kır
Pur 'eqli dîdêrıt, me ji qismê hukema girt

-
7. 'ENQA: Teyrê enqa. ŞİGAR: Nêçir., xenimet, heqşûr. BIÇİN VER:
Lı ber dayinê.
 10. KEBK: Kew. QEHRAM: Çêle, têjik, nazık.
 11. ZINHAR: Eman, nebînebi. ERQEM: Mar. JİHA: Ziha, ziya, ejderha.
 12. BERİ: Lı ber.
 13. TÊK: Tcu, hemû.
 14. SAYE: 1) Pawandin. 2) Sîh 3) Saya, pesn. HUKEMA: Aşiq, cuindar,
helbestvan.

- 15 Sef sef ne tenê gezme dıbarın jı kevanan
Dıl kakul û zulfan dı kemendê bı teba gırt
- 16 Diwane herê tê te dı vê sîlsîle û bendê
Ku musteheq e Xusrewê xûban bı ceza gırt
- 17 Peyweste du fêris jı me ra daberızın dıl
Zulfan bı çep û rastı lı oxılme cema gırt
- 18 Qewse du hilalan ku lı ser burcê esed bı
Bu şuhre dı amê 'emel enguşte numa gırt
- 19 Şı'ra te "Mela" sıhrê şeker-riz e bı mu'cız
Zanım jı lebê le'lê te ev lefz û eda gırt

DENGÊ TÎPA (ت : T)

"EM HENE! EW ÇIMA?"

- 1 Mehbûbı bı dıl bı, me bı evrazı çı hacet?
'Enqa bı xwe bê tın fir û perwazı çı hacet?
- 2 Ney dûr e hebîbê me çı fıryad û fixan kın?
Wê guh lı demira dıl e, awazı çı hacet?

16. XÛBAN: Ciwan delal, baş.

17. CEMA: Cıvat

18. AMÊ: Dinya. 'ÊMEL: Kar, kırım. ENGUSHT: Bejn, tili.

2. DEMİR: Dıl.

- 3 Go: Suxte, murada xwe ji min telbe ke iro
Min go: Jî kerim, telbe û daxwazi çî hacet?
- 4 Mî nale refiq in, xem û tehlin e musahib
Firyadî enisê min e demsazî çî hacet?
- 5 Dildan û newazîş çî ne? duşnami bes in min!
Pur derd û cefa, hurmet û i'zazî çî hacet?
- 6 Suhbet bî mey û çengê, hebibê me bivêtin
Firyad û fixan ma ne bes in, sazî çî hacet?
- 7 Razin me çî hacet? We ku xemmazî bîzanin
Eşkên me bes in, dideyê xemmazî çî hacet?
- 8 Her lehze çî hacet? Ku bî nazan bîkuji min
Cana jî xwe qurbanî te me, nazi çî hacet?
- 9 Ta çendi bî hicra xwe tu min tecrîbe ênî!
Zêrê jî xwe xalîs, mehek û gazê çî hacet?
- 10 Hacet niye cana yedê beyda bî der anin
Înkari dî din da nebit, i'cazî çî hacet?
- 11 Esrarê ezel dê dî ebed bêne zihûrê
Encamî ser encamî, jî axazî çî hacet?

3. *SUXTE*: Şagirt, xwendekar. *KERÎM*: Qenekîrox.

4. *MUSAHIM*: Hevri, hemra. *ENÎS*: Xemrevîn. *DEMSAZ*: Dost, heval.

5. *NEWAZÎŞ*: Lavakirin. *Îltifat*. *DUŞNAM*: Xewn û xeyal. *DILDAN*: Berdîladan. *I'ZAZ*: Rûmet.

7. *XEMMAZ*: Hefsûd, fesad, peyugêr. *EŞK*: Stêrê çav.

9. *MEHEK*: Kevirê ku zêr pê tê rindekirin jî bo kîşkirina eyar.

10. *I'CAZ*: Mucize.

11. *ENCAM*: Netice, dawî. *AXAZ*: Dev (pr.) Awaz.

- 12 Ger lu'luê mensûri jî nezmê tu dîxwazi!
Wer şî'rê "Melê" bin, te bî Şîrazi çî hacet?

DENGÊ TÎPA (ت : T)

"FIRYADI ÇI KÎT?"

- 1 Kes bî dada ma ne pîrsît gîleh û dadî çî kît?
Te nebit dadîresek beyhûde fîryadî çî kît?
- 2 Bî şêrinê negihît destî, eger Rostemî bît
Dê bî bazû û mîlan şubhetê Ferhadî çî kît?
- 3 Fa'îlek lazîm e, da fî'l û eserî peyda bît
Ger tu heddadî nebit, kûreyê heddadî çî kît?
- 4 Mumkînek dê hebitîn da ku teleb hasîl bibît
Seyd û nêçîr ku nebit, tûleyê seyyadî çî kît?
- 5 Her gîl û seng dîbîtîn zêrî bî tedbirê hekim!
Qabîliyet ku nebit, hîkmetê ustadî çî kît?
- 6 Kan bî gewher çî bîkît, gewher eger pakî nebit!
Tu besîret te nebit, sîretê ecdadî çî kît?

12. *LU'LU*: Sedef, inci. *MENSÛR*: 1) Nivîsara dûz. 2) Belaubûyi, reşandi.
3) Hêjayî. *ŞÎRAZÎ*: Şairekî farisî ye.

1. *DAD*: 1) Hewar. 2) Edalet.

5. *GIL Û SENG*: Herî û kevîr.

6. *BESÎRET*: Fem û fîraset. *SÎRET*: Xwûy.

- 7 Zêr û ziwerî dîkırın celbê gulûban, haşa!
Husn û sur zati nebît, qametê meyyadî çî kît?
- 8 Aşiqê mestê bî 'îşqê, niye hacet bî meyê
Waridê warid û ehwalê, bî ewradî çî kît?
- 9 Te xerez vêkktîna yek weliyek murşîdî bît
Salîk û talîbê îrşadê, bî Bexdadî çî kît?
- 10 Cehde û se'y û teleb bê eserek safî nehîn
Tu ne bî perdemîşîn, çaker û qewwadî çî kît?
- 11 Çî eser dê lî berî xare bîkît qetreyê ab?
Qelemê me bî dosê qetreyê zuha dê çî kît?
- 12 Dê jî heq cazibeyek dîl bigîrît werne "Mela"
Jî ezel ger tu hidayet nebît îrşadî çî kît?

DENGÊ TÎPA (ت : T)

"PAYA ME"

- 1 Ewwel ku yarê da me yek zerreyek 'îneyet
Qismet me xemr û cam e, dî deftera hidayet

7. ZÎWER: Zeger, xîşr. SUR: Dîlkêşî, şahî.

8. NÎYE: Nîne. WARID: Bêîrs. EHWAL: Rewş, hal. EWRAD: Pîne-
pîn, peyvên bî dîzî.

9. XEREZ: Mebest, meram, armanç.

10. NEHÎN: Nabîn. ÇAKER: Noker, pêxwas.

11. XAR: Haranî, dîrri, sitrin. DOS: Dewş, şûn. ZUHA: Zîwa.

1. ÎNAYET: Alikarî, razibûn.

- 2 **Husn û cemala canan, cama sedef ku gêra**
 Herçi nebit bidayet, esla nehın nihayet

- 3 **Feyza 'ulûmê hıkmê, cama sedef ku gêra**
 Me j'destê muxbeçan dit, bı mîshef û bı ayet

- 4 **Arif heta ne noşi, ji destê mey firoşi**
 Xaîb ne bû ji hûşi, peyda nekîr wilayet

- 5 **Gunah û zuhd û tamat, hîlnagirt xerabat**
 Kesê bı vî derî ret, divê bı kîr riayet

- 6 **'Îşqê ji herdu çeşman ewwel dî dîl eser kîr**
 Lê zerre zerre axîr sotin kîr û sirayet

- 7 **Şakis-silahi her dem, bı kuştîna "Melê" bît!**
 Gazîndeyan ji kê kîm, ji kê bîkîm şikayet?

- 8 **Cama dî destê şahîd, jengê ji dîl dîşotîn**
 Pîrê muxan ji rendan weh weh dîkîr riayet

- 9 **Etwarê 'îşq û mesti, esrarê but-peresti**
 Teqrîrê sed riayet, nakît ji bo kifayet

2. *BİDAYET: Destpêk.*

3. *MUXBEÇAN: Meygêran.*

4. *XAIM: Wînda.*

5. *ZUHD: Zahîdî, çêlekêşî. Terka dînê. TAMAT: Peyvên bê cih.*
XERABAT: Meyxane (pr.). RET: Here!, bîbore!

8. *PÎRÊ MUYXAN: Pîrê meyxanê. REND: Rind*

9. *ETWAR: Tewr, rewş.*

- 10 Li yetmeinne qelbi, 'eyn-ûl yeqin dıbxşet
'Eyn-ûl 'ıyan dıvêtın, kafi nehin dirayet
- 11 Miri û padişahi mûyek lı nık "Melayı"
Nadım bı mulkê alem yek zerreyek 'inayet

DENGÊ TÎPA (ت : T)

"NAZENÎN"

- 1 'Er'er-xerama bı qedd û qamet
Yek bûse da me bı sed qiyamet
- 2 Yek bûse bexşî ewwel bı ihsan
Axır lı mın kır curm û xeramet
- 3 Jı jeng û zerqê da dıl bışotın
Cama sedef bin rend û keramet
- 4 Jı herdu çeşmên tey mest û xwûnrêz
Nûra du çeşman kê di selamet
- 5 Lı derd û êşan peykan û nişan
Me j'herdu çeşman kıfş in 'elamet
- 6 Ruswayê 'ışqê tenha ne ez bûm
Kes di zemanan heb bê melamet?

10. LI: Jı bo. Yetmcinne: Têkcu ci. QELBÎ: Dîlê mın. EYN-ÛL YEQÎN: Rastiye nediti. EYN-ÛL 'İYAN: Rastiya ber çav. DİRÂYET: Zanyari, têgihîştin.

- 7 Du secde ferz in, filhal bîbîn ber
Dema xuya bî ew qedd û qamet
- 8 Da 'ey bî, rendan neki bî badê
(Nufûs û qewmin, biha tesamet)
- 9 ''Mela'' lî 'umrî bê feyde bori
Kêşa bî zoran qehr û nedamet

DENGÊ TÎPA (ث : S)

"'EMRÊ BEYHÛDE"

- 1 'Umrê dayî' bo me bê dilber 'ebes
Wey! tevê 'umrê me bori ber 'ebes
- 2 Dîl emanet da bî naehlan ne dî!
Lê bî naehlan me da gewher 'ebes
- 3 Da dî seyra 'îşqê bê dilber ne çî
Lê dîbî seyra te bê dilber 'ebes
- 4 Pur dî pey weslê me se'ye û cehde da
Cehde û se'ya me hatin der 'ebes
- 5 Ahî! wê kuştin bî derba xencerê
Ma dî mêlakê dîret xencer 'ebes?

1 'EBES: Beyhûde.

- 6 Dıl jı derba kaşûwan bû pare par
Goy dı meydanê dıbit sed ger 'ebes
- 7 Mehdera vi suxteyi iro bıkın
Ez dıbêjım: Nabıt ev mehder 'ebes
- 8 Kıfş e me'na, ki lı lewhê simê di?
Nuxteyê mısk û xetê 'enber 'ebes
- 9 Da "Mela" lışyari bi lê pur kesan
Sine pur lê dane seng û ber 'ebes

DENGÊ TÎPA (ث : S)

"BEHSÊ MEKE"

- 1 Namê 'enber-şikenê bêti, jı 'enber meke behs
Bıl jı wê sılşile û zulfê mû'enber meke behs
- 2 Veke lêvê û jı nivê bıwerin qend û nebat
Jı lebi le'lı-şeker bêj û jı şeker meke behs
- 3 Bı ser enguştê 'eqiqi, bide fincana rehiq
Abı-heywan te çi yım, navı jı kewser meke behs
- 4 Zeriyên şehla û durdane bıbın şahidê bezm
Jı genım reng û siye-çerd e û esmer meke behs

6. KAŞÛ: Darê gogê. GOY: Gog (top).

1. ŞIKEN: 1) Şkesti. 2) Badayi. MU'ENBER: Emberkırı.

3. ENGUŞT: 1) Bejn. 2) Tılı. REHIQ: Mey, şereba bēnxweş

4. ŞEHLA: 1) Çavkıl. 2) Şirin.

- 5 Dê bişaret bî işaret jî neyê bête sima'
Tu jî nayê dî simaê bike bawer meke behs
- 6 Wê nihalê bî der axûş û bîdi canê şêrin
Şaxê 'umrê bixwe ber jê, û jî Qeyser meke behs
- 7 Ayetê husnê mûfessel ke, jî Keşşafî Cemal
'İlmê 'îşqê bike tefsîr û jî defter meke behs
- 8 Razi dehrê jî sıphrê tu nîzani bî cedel
Hikmetê da wer, tu jî hîkmetê dawer meke behs
- 9 Abî-heywan te divêtin, tu bîbe hemrehê Xudr
Camî Cem bin û jî Dara û Sîkender meke behs
- 10 Jî ezel aqîbetê karê ku me'lûmî ne bît
Camê mey noş û jî teqdîrê muqedder meke behs
- 11 Dilê yarê me ne bû nermî, bî sed ab û giri
Jî dilê dilberî ma û berê mermer meke behs
- 12 Tîrî sed tenê cîger, sine lî ber maye çeper
Jî dîl û cergê kul û sineyê ker-ker meke behs
- 13 Şîrê elmasî kîşînit, tu jî lami' de xeber
Vegîrît huqqeyê yaqûti jî gewher meke behs

5. *BIŞARET: Mîzgînî. SIMAÊ: Bîhistînê.*
 6. *NÎHAL: Teze, leylan, cîh. AXÛŞ: Hembêz.*
 7. *KEŞŞAF: Navê tefsîreke quranê ye.*
 8. *DEHR: Zeman. Tekrar. SÎPIHR: Asîman.*
 9. *XUDR: Xocê Xîzîr.*

- 14 Jı şefeqê zuhre xuya bî, tu binê perwinan
Cebhetê ew binûmêt, tu j'meh û xawer meke behs
- 15 Lı rûwê yarê, du meh-new me qıran dine dı mest
Tu ji seyra qemerê talı' û exter meke behs
- 16 Pur ji dêm û xet û xalan, te xeber daye "Mela"
Nezerê wer bide bejnê, ji mufessır meke behs

DENGÊ TÎPA (ث : S)

"BAZARA DINÊ"

- 1 Tu sehergeh bî temaşa were bazarı hudûs
Lê te bêfaide azarı nedît, xarî hudûs
- 2 Da ji dıl xunçe-lebek nazık û ter dane bî jir
Bî tebessum bî te ra bête ji gulzarî hudûs
- 3 Sed gırîh mın dı dıl ın, lew ku çep û rastı dıkır
Şahê husnê qıdemi, zulfê gırîhdarî hudûs
- 4 Bıl ji sultanê qıdem, mın bî te iqrarî nehn
Ger lı kaba me nıhen metqeb û bızmarî hudûs

14. MEH: Hiv. XAWER: Rojhilat, roz.

15. NÊW: Nû. QIRAN: Nêzikayî. TALÎ: Avêtin derketin. EXTER: Navê stêrkeki ye.

1. HUDÛS: Peydabûn. Hebûn.

2. XUNÇE: Bîşkojên gulan.

3. QIDEMÎ: Qedimî, her hebûn.

4. KAB: Kabok, gûzek. NEHEN: Deynîn, daynîn.

- 5 Dıl dı deryayê qıdem qaf e, bı sabıt qedemi
Gerçi dûim lı serê ferq e me mınşarı hudûs
- 6 Belku diwarı bı guh bın, bı Xudê ki bı Xudê
Bı tu rengi negeri eşkere esrarı hudûs
- 7 Lem'eyek ger jı kenarê qıdemı pertewi dıt
Dê jı ber wê sietê mehû bın enwarı hudûs
- 8 Wê bı sed pencereyan daye şuaâ qıdemı
Gunbedı işqê lı ser kursiyê dewwarı hudûs
- 9 Tu hudûsê weh mebin, qencı nezerki carekê
Lı esasê qıdemê daniye diwarı hudûs
- 10 Here eslê xwe û tertib û qiyasê jê (bı)ke
Ger nızani çı ye, yekcarı berê darı hudûs
- 11 Ateşê işqê wucûdê hêl dıkıt şubhetê zêr
Heye mumkın ne fırt zibeqê ferrarı hudûs
- 12 Ellah Ellah ku dı 'umrê xwe tu carek nebihi
Çı seda têtê jı vê gunbedê dewwarı hudûs
- 13 Tu jı ber perdeya wehmê were der, da bıbıhi
Çı newa têtê bı sed nexme jı ewtarı hudûs

5. QAF: Çıyayê Qaf. QEDEM: Ling, pê. FERQ: Tepla seri. MINŞAR: Birek, xizar.

6. PERTEW: Tışk, tirêj, ronahi.

11. Ev rêz dı nusxeyeka dın de weha ye, "Ateşê işqê şebê zêri wucudê helı ket". ZİBEQÊ FERRARİ: Hılqevaztına beqê.

12. NEBİHÎ: Nebîhizi.

13. WEHM: Xeyal. NEXME: 1) Dengê xweş. 2) Hewaya muzikê. EWTAR: Jiya aletên muzikê.

- 14 Hal û musteqbel û mazi dı xwe da têkî yek m
Subhî mewcûd e bî 'eynê xwe dı êvarî hudûs
- 15 Rast û çep û gav û se'et her lı me ew datinî
Zulfeqarê qıdemê heyderê kerrarî hudûs
- 16 Rast û evraz û nışûvî me bîwarın yek û yek
Lê tenê wê lı me bû daire berwarî hudûs
- 17 Dê lı qelbê me çı dît lami'eya islamiye ?
Ku lı canê xwe me xef bestiyê zunnarî hudûs
- 18 Reng û jengê hedesê, neqşê hudûsê me dı dıl
Bıde ber rendeşî ısqê, ew e qessarî hudûs
- 19 Can lı ser destê nihai dı riya cananê da
Ruhî sef-sef ku vewestane dı bazarî hudûs
- 20 Dê jı xeflet bîretın saya-zewalê ey dılı
Rûnenê da tu emanet lı sıha darî hudûs
- 21 Tu jı feslê here eslê ku divê dêrî xerab
Da nebi merkebê cehlê tu dı bın barî hudûs
- 22 Da nigarê xwe bı sed rengi bıbini (tu) iro
Were carek bıke seyrê tu dı etwarî hudûs

14. HAL: Dema nıha.

15. HEYDERÊ KERRAR: Bernaukê Hz. Eli ye. HEYDER: Şêr.

18. RENDEŞ: Rende, rinde. QESSAR: Bırrin, birek, qutkırox.

20. SAYA-ZEWALÊ: Sıha (siya) nivro.

22. (TU): Jı ber kêmbûna heceki dı beytê de me nivisi. ETWAR: Rewş, tewr. Çiya (pr),

- 23 Tu bî halê me dîzani çî ye her lehze "Mela"
Me dîdîl têt û derî xencerî xeddarî hudûs

DENGÊ TÎPA (Ğ : C)

" BINEFŞA NAZENÎN "

- 1 Şîmşadı xeram û serwî xennac
Cananan dîbîrît bî 'îşwe tarac
- 2 Mîn di seherê dî xwabê mesti
Bê deng tezerû we lalî durrac
- 3 Bîşkîftî jî xunçe nêrgîza mest
Bû ferqî jî ser qedîfe dîbac
- 4 Cebhet keşîfî jî subhî sadîq
Nûrê ku veda lî ser şebî dac
- 5 Elması numane şubhê Mîsrî
Danin cegerê me dîl kîr amac
- 6 Nesrîn û binefşe tewwuzandî
Mawerd dîreşandî şûşeyî ac

-
1. ŞİMŞAD: *Cureyek ço. XENNAC: Nazdar. TARAC: Talan.*
 2. DURRAC: *Teyrê çil. Porê topîk.*
 3. DIBAC: *Cureyek qumaş.*
 4. DAC: *Tarî.*
 5. MİSRÎ: *Navê cureyek şûr e.*
 6. AC: *Dîranê fil. MAMERD: Gulav*

- 7 Cuhtê Hebeşan bî terfet-ûl 'eyn
Ani qederek jî Espehan bac
- 8 Sima ku numa nema lî hîş sim
Simabî jî xucle ma jî ixrac
- 9 Mir'ata Sîkenderî lî pêş e
(Behrûn we lehel 'ukûsû emwac)
- 10 Dora qemerê jî ber şefeq da
Ku spêde lî ferqî ser niha tac
- 11 Çerx e, felek û melek dîbazîn
(Şemsun we kewakibun we ebrac)
- 12 Zuhre bî qirani qabê-qewseyn
(Wen-necmû iza hewa bî midrac)
- 13 Dengê melean zîmîhne zîm-zîm
Ewrahî jî îşqê tene mî'rac
- 14 Dîl behr e, û sed hezarî mewc in!
Zahîd çî xeber jî behrî mewwac?

-
7. TERFET-UL ÊYN: Girtin û vekirina çav. Çavniqandin. ESPEHAN: Esfehan.
 8. SÎMA: Sû. SÎM: Ziv. SÎMAB: Ava ziv. Rêza duwemin dî nusxeyek din da weha ye: "Simabî jî xucle maye recac". XUCLE: Şerm. RECAC: Lerz.
 9. MÎR'AT: Neynîk. LEHEL 'UKÛSÛ: Lêwekîlandin. EMWAC: Pêl.
 11. ŞEMS: Roj. EBRAC: Burc.
 12. QABÊ-QEWSEN: Navbeyna birûwan. NECM: Stêr. ÎZA: Wextê. HEWA: Xuricandin. MÎDRAC: Pê bî pê.
 13. ZÎMÎHN: Galgalkirin.
 14. MEWWAC: Pêlên pûr.

- 15 Bori û bî xencekê "Mela" kuşt?
Ew xunçeleba delal û xennac

DENGÊ TÎPA (Ğ : C)

"BEXT Û TEXT"

- 1 Dîl jî 'îlacê ku bî der ket mizac
Dê jî lebê noşî 'eta bit 'îlac
- 2 Ayineyî camî cihan bini Cem
Badeyî le'li ne dî cama zucac
- 3 Jî ava heyatê bî me da şerbetek
Zinde kîrîn ma jî 'edû ra neşac
- 4 Bendî kîrîn gerçî şîbhê filî bûm
Simiberê sa'îd û bazû jî ac
- 5 Exterî îqbal û meh î burcê bext
Mîhrî sîpehrê kemer û text û tac
- 6 Kosî ku hîngaftî bî şahî lî text
Padişehan neqdi-rewan dan xerac

15. *XENNAC: Pîr bî naz.*

2. *ZUZAC: Şûşe.*

3. *NEŞAC: Şîr û gîrî.*

4. *SA'ÎD: Mîl*

5. *ÎQBAL: Bext. MÎHR: Roj, evîn, dostanî. SÎPEHR: Asîman.*

6. *KOSÎ: Defa hewarê. NEQD: Dîrav, pere.*

- 7 Xusrewê Şêrinê lı der bendı husn
Simi-beran lazım e lê muhr û bac
- 8 Sıkkeyê şı'ra me bı navê te hat
Lew bı 'eyarê dı cihan da rewac
- 9 Abı rewan mın diye şı'ra "Mela"
(Yunkirû lil mai li sû-il mizac)

DENGÊ TİPA (Ç : C)

"NEWROZ Û SERSAL"

- 1 Disa jı nû bêhal e dıl
Saqi, werin cama zucac
Muştaqê xemra al e dıl
Lê xwoşi ani bit mizac
- 2 Saqi ku dêm mehweş bitın
Kakul jı şêva reş bitın
Qerqef bıla ateş bitın
Em dê bı wê dıl kın 'ilac
- 3 Da em bı wê dıl hey bıkın
Pê sine dax û key bıkın
Sed menzılan pê tey bıkın
Ew dê dı seyrê kıt rewac

8. REWEC: Bîha, rûmet, berêzi, piyase.

9. YUNKIRÛ: İnkâr dîke. LİL MAÎ: Jı avê. LÎ: Jı bo. SU': Pis.

1- XEMR: Mey, bade, şerav. AL: Sor.

2. MEHVEŞ: Hîva geş. KAKUL: Temborik. QERQEF: Mey, bade.

3. HEY: Heyî, sax, xweş. TEY: Tewandın, mabest, niyet, hacet.

- 4 Bê nûr û narê muhbetê
Bê neqş û sun'ê qudretê
Naçin meqamê wesletê
(Nûrun lena wel-leylû dac)
- 5 Ev narê siqala dîl e
Daim lî wê qala dîl e
Newroz û sersala dîl e
Wextê hilitin ew sirac
- 6 Hetta bî nûra badeyê
Rengin neki seccadeyê
Dûri jî wê şehzadeyê
Durdaneya gerden jî ac
- 7 Durdaneya gerden bîlûr
Reyhan lî ser werdên dî cûr
Hey-hey bî mesti têne dor
Xala lî nîk ferqê bî tac
- 8 Mîhra te pur ebter kîrîn
Xalan jî ber bîskan derîn
Zulfa muselsel 'enberîn
Çin çin jî Çînê têtê bac
- 9 Tenha ne Kurdistan dîdîn
Şîraz û Yeng û Wan dîdîn
Heryek lî ser çehvan dîdîn
Jî Espehan têtî xerac

4. *LENA: Bo me.*

5. *SIRAC: Çîra. Roj.*

8. *EBTER: Bê bereket.*

10 Çehvên belek qewsên helek
 Çerx û felek xalib melek
 (Fi hubbî ha 'umri delek
 Wel hubbû yecri fi 'u cac)

11 Şahîd hezar reng xemmîlin
 Reqs û sema pê kemmîlin
 Îro "Mela" em sed dîl in
 Saqî werin cama zucac

DENGÊ TÎPA (Ç : H)

"XWÎNÊ NERÊJE!"

- 1 Pur meke israfê dî qetlî mûbah
 (Sefku dem-il aşîqî ma la yûbah)
- 2 Sine bî destê xwe mûbarek veke
 (Te'rifû kem fi kebedi min cîrah)
- 3 Dîl jî hewaya te dî fîkrên dî hûr
 (Fi lucecin beyne hubûbir-riyah)

-
10. HELEK: Helak, xetere. FÎ: Dî ...de. Lî ser. DELEK: Têgûhiştin, mızdan. YECRÎ: Diherike. UCAC: Balisok, ecac.
 1. SEFK: Rêtin. DEM: Xwin. MA: Ew, wî. LA: Na, ne. YÛBAH: Helal.
 2. TE'RÎFU: Tu dîzani. KEM: Çend. KEBED: Kezeb. MÎN: Ji. CÎRAH: Bîrin.
 3. LUCEC: Kûrayî. BEYNE: Navbera. HUBÛB: Gerinek. RÎYAH: Ba.

- 4 'Işq ku gîha kê û lî 'eqlê xwe ma?
(yeftikû bil-aşîqî husn-ul milah)
- 5 Dê du siyeh-surmeyî çehvên xwe kîr
Xakî rehî yarê seba her sebah
- 6 Toz û xubarî seherê ber çîmen
(Qed neşeret-tibe we bîl miskî fah)
- 7 Fêrîs û rumbazî gîhan yek, bî tir
(Ehmedo fil-beynî qetîlur-rimah)
- 8 (Bûse-zenan her kî ber an asitan
Mekkene min cubhetî hî la berah)
- 9 (Helle leh-ul qetlû bî şer' 'îl hewa
Men keşefes-sîrre we bis-sîrrî bah)
- 10 Husn û edaya te "Mela" her kî dî
(Sehhe lehû enne ke 'eyn-ul fîsah)

-
4. YEFTİKÛ: Kuştîna xedar. MÎLAH: Delalî. Bayê ajotîna gemiyê.
 5. REH: Rê. SEBA: Bayê sibê.
 6. QED: Miheqeq. NEŞERE: Belav bû. TÎB: Bihna xweş. FAH: Belav-bûna bihna xweş.
 7. RÎMAH: Rîm.
 8. BUSE: Maç. ZENAN: Kîrîn. BER: Lî ser. ASÎTAN: Dergah. MEK-KENE: Cih girt. MÎN: Jî. CUBHE: Enî. HÎ: Wî. LA: Na, ne. BERAH: Rabûn, terkîrîn.
 9. HELLE: Helal e. LEHÛ: Jê re. ŞER'T: Qanûn. HEWA: Işq. MEN: Kî, kê. BAH: Eşkere.
 10. SEHHE: Durust e. ENNE: Miheqeq. KE: Tu. 'EYN-UL FÎSAH: Serdarê Fesîhan. Qîserewan, peyrewan.

"HEYFA ZANAYÊN JÎR"

- 1 Heyf dî qeyda xak û gıl bît arîfê çalakî rûh
Dê mucerred bît ku pertew dît jî nûra pakî rûh
- 2 Qeydî xak û gıl nebit da bê hicab û û perde bi
Mîslê bedrê carinan têxît xusufê xakî rûh
- 3 Şem'ê ser nûr nadîrît ger ew nekît perhîzî dîl
Zewqê cama îşqê nakît ger nekît însakî rûh
- 4 Dîl bî tayek nêrgîzan de nazîkek terwende de
Gul dîkîn teşbihê xaran her xes û xaşakî rûh
- 5 Camî 'îşqê pakî rûhani tuhûra batîn e
Ê nenoşî, her we ma, hetta ebed, napakî rûh
- 6 Hey'eta keyf û kemê bê, keyf e keyfa arîf e
Dê bîminût ger nebit naçarî bê tîryakî rûh
- 7 Dê bî gulzara cemala sebze-poşan wê çî kît?
Ê dî mîhrê da nebit dîl pare pare çakî rûh

2. XUSÛF: Hivgirtin.

4. TERWENDE: Nûber, tazebîşkîftî. XES Û XAŞOK: Zîbl û zal, pûş û per.

6. KEM: Çend. Kêm. Pis.

- 8 Ber ji can derrakeyek rewşentir û wala divêt
Sûretê husna mûqeddes da bıkıt idrakı rûh
- 9 Ger xeberdar î, ji sırra "kunt û kenjen" guh bîdêr
Da bî sed tewrî beyan kıt me'neyê "Lewlakı" rûh
- 10 Lamê sırra tecelli ser lı Tûrî dıl dıdıt
Zebtı nakıt wê mecalê sed hezar eflakı rûh
- 11 Herdu ilanên te di mın toqî gerden kır mudam
Da me her bêtın tebessum wek gula dehhakı rûh
- 12 Cewherı husna eda تنها dıbit meqbulı teb'
Ger ne seyqel dıt bî nûrî 'ışqê wek hekkakı rûh
- 13 Dê bî vî endaz û terzi ki dıbêt sıhrı helal ?
Ger ne bala teb'ı bıt wek pehlewana çalakı rûh
- 14 Dıl bî rım avêht û wê lê bari kır qewsê şevin
Dê bıdıt ber gezmeyan bêsûc î ew seffakı rûh
- 15 Şehsuwar iro kemend avêhtine qelbê "Melê"
Bendı nakıt xeyrî fıtraka te sed fıtrakı rûh

-
8. DERRAK: Têgîştın. WALA: Hêja, berêz.
 9. KUNT Û KENZ: Bûm genc, xezîne. LEWLAK: Tu nebûyayî.
 10. TÛR: Çiyayê tûr.
 11. ÎLAN: Mar. GULA DEHHAK: Gula geş.
 12. SEYGEL: Mışt. HEKKAK: Siqalkırın, xurandın.
 13. ENDAZ: Avêtın. ÇALAK: Çıst.
 14. GEZME: Tır.
 15. FITRAK: Bendê (weris) girtına heywanê kovi.

- 7 Her şam û seher bî destê xûban
(Min xemretina tedûrû eqdah)
- 8 Seyyahî me din dî xelwe iro!
Ellah ku çî xelwe û çî seyyah?
- 9 (Îfteh bi liqa ke qufle qelbî
Fel-qelbû lehû liqa ke miftah)
- 10 Berqê ku veda jî ber niqabê
(Fel-lamiû min sena hû qed lah)
- 11 Qews û qezehan numan jî bala
(Wel-'enberû min şeza hû qed fah)
- 12 Ayine dîlê "Mela" cela da
(Min tel'eti hî fe qed sefer-rah)

-
7. ŞAM Ê SEHER: Êvar û sibe. XEMRETÎNA: Şeraba me. TEDÛRÛ: Dîgere. EQDAH: Qedehan.
 8. SEYYAH: 1) Îbadet. 2) Herikandin. 3) Gerok, turist. XELWE: 1) Tenêbûn. 2) Quncikê tari.
 9. ÎFTEH: Veke!. LIQA: Liqaybûn. KE': Te. QUFLE: Qefl. QELBÎ: Dîlê min. LEHÛ: Jê re.
 10. SENA: Pesîn. RUHNI, ronahi, tirêj. HÛ: Wî. LAH: Derketin. Eşkere.
 11. NUMAN: Eşkerebûn. BALA: Bejn. ŞEZZA: Bihna muskê. FAH: Belavbûn.
 12. CELA: Tije, dagirti. TEL'ET: Ditin. Avêtin. HÎ: Wî. BEFA: Safî. RAH: Mey.

"YEKBÛN PÊWÎST E!"

- 1 'Îşqê ku bîdîn bî yek dû erwah
Peyweste dîvê bî hev bîn eşbah
- 2 Can û cesedan ku ittihad in
(Wel maû leh-ûl mizacu bir-rah)
- 3 Wesla te li can û dîl heyat e
(Men zaqe meraret-el newa tah)
- 4 Tenha ne di sine min xedeng in
(Min lehzi ke filqulûbi ermah)
- 5 Perwin jî şefeq seher xuya bûn
(La bid'e we fihi min ke misbah)
- 6 (Lew mustû min-el hewa ke ban in
La bid'e we qed temidû erwah)

-
1. EŞBAH: Zincir.
 2. MA': Av. LEHÛ: Jê re. MIZAC: Tevlihev. RAH: Bade.
 3. MEN: Ki, kesê. ZAQE: Tam ke. MERARET: Tahli. NEWA: Dûriti.
TAH: Hilakbûn.
 4. LEHZ: 1) Tefekur. 2) Temaşe. KE: Te. QULÛB: Qelban.
ERMARH: Rîm(an).
 5. BID'E: Şik, gumman. FÎHÎ: Tê de. MÎSBAH: Çıra.
 6. LEW: Eger. MISTÛ: 1) Mîzdan. 2) Mest. 3) Germi. HEWA: Evin.
KE: Weke. BAN: Navê dareke dirêj. QED: Mîheqeq. TEMUDÎ:
Dirêj dibe, dilerize, diheje.

"AFAT Û BELA"

- 1 Ahî jî derdê dîl dîkît
Herçî ku di azarî çerx
Derbê lî nîva dîl dîdît
Lamî' sîfet nûbarî çerx
- 2 Tê nî sineyan peykan nîhin
Amancê wan tîran em in
Dama belayê der kemin
Her goşê dormadarî çerx
- 3 Bîra xwe tînin xenceyan
Aşîq dî nêv îşkenceyan
Tavête dîl ber penceyan
Her dem jî nû şunqarî çerx
- 4 Ku van letîfan gul-'îzar
Şûna gulan rîstîr
Lew tî nî bulbu za.
Nîva cîhê gulzarî çerx

-
1. *Rêza duwemin dî nusxeyek dîn de weha ye: "Herçî nedi azarî çerx".*
 2. *DAM: Tûr.*
 3. *ŞUNQAR: Teyreki pençetûj e.*
 4. *GUL-'ZAR: Gulançk, gulbîşk, gevdek por.*

- 5 Sed baziyan ev huqqebaz
Tînt bı hîle-kari saz
Geh geh ku naz e w geh niyaz
Sehhar û pur mekkarî çerx
- 6 Herçi bixûnit suhbetê
Axır dı cana şerbetê
Zehra-helahıl dê det ê
Da dıl nedın azarî çerx
- 7 Ev errey a jehri-dıdan
Mın jê dı dıl danin sinan
Ma I'behrê ferqı dujminan
Bêt û bîret minşarî çerx
- 8 Dijmın jı can talan bıtın
Ew xwe hero nalan bıtın
Mêlak û dıl kalan bıtın
Lê bêt û ret xeddarî çerx
- 9 Dav kuhne-xanî mîslê deyr
Çendın kewakıb têne seyr
Peykan bı davê şubhê teyr
Her jê dıbarın narî çerx
- 10 Şemsi bı şemsê cam bı cam
Hetta dıkın dewrê tamam
Ateş dirêjıt her mudam
Ev gunbedı dewwarî çerx

5. *HUQQEBAZ: Hilebaz. MEKKAR: Mıkr, hilebaz, hewnebaz.*
 7. *ERRE: Birek.*
 9. *DAV: Da ev. DEYR: 1) Warga feqiran. 2) Dêr.*

- 11 Ağır dı ab û gıl dıkıt
Qelban jı qelban hıl dıkıt
Mıtqeb dı can û dıl dıkıt
Daim evıstın karı çerx
- 12 Çendi ku xûban bën rezım
Mın jê dı dıl danin gezım
Amancê wan remzan ez ım
Ser-eskerê seyyarı çerx
- 13 Mın pur şevan hetta seher
Danine rê sem' û beser
Ew ınahê rû, ma bête der
Ta bıbme newbet-darı çerx
- 14 Kes di lı lewhê sine qet (?)
Neqşek vehati bê xelet
Herdem jı nû yek taze xet
Tavête der pergari çerx
- 15 Ma j'hesreta şêrin-leban
Xew têtê çehvan qet şeban?
Fıryad jı destê kewkeban
Pursê bıke j'bêdarı çerx!
- 16 Van rehrewên himmet-bılınd
Berdane meydanê semend
Şergeşte bın hetta bı çend?
Ev rekbê meş'eldarı çerx!

15. BÊDAR: Bê xew, şıyar.

16. REHREW: Rêwıngi, rêwi, karwan. SEMEND: 1) Hespê ağır. 2) Colê hespa. SERGEŞT: Sergêj. REKB: Sıwar.

- 17 Gavek ji dengê zengilan
Ê mûn çî rûnî menzîlan?
Hey hey dî binî mehmîlan!
Fîryad e her qentari çerx
- 18 Pur mî jî vê çerxê "Mela"
Kêşane afat û bela
Ebleh dîbinî wî hela
Herçî jî dîl bî yari çerx!

DENGÊ TÎPA (Ç : X)

"AX Û OX"

- 1 Dilberê iro seher avête cergê mî du dox
Yek lî sine, yek lî dîl da, lew jî mî tîn ax û ox.
- 2 Ah û oxên mî j' dîl tîn, lê jî ber tira qîzîl tîn
Yan jî kovanên dî kul tîn, jê dîzêt her xwûn û zox
- 3 Xwûn j' dîl cû-cû rewan tî, wek 'eqîq û erxewan tî
Lê jî dest selwa cuwan tî, ew şepala şeng û şox
- 4 Ew şepala şox û şeng e kafîra Rom û Freng e
Da me ber cotek xedeng e, zalimê kuştîm bî dox

17. MEHMIL: Bar, ezyet, nîrê zulmê, texterewan. QENTAR: Quntar.

18. EBLEH: Bêhiş, kêmaqîl.

1. DOX: Toqmaq, gurz.

2. CÛ: Co, cîhîk. 'EQÎQ: Kevîrê 'eqîq (sor e). ERXEWAN: Dareka çiçeksor e.

- 5 Zalimê kuştım, şepalê nazikê qencê delalê
Bûn hicaba zulf û xalê, êdek û ala û tox
- 6 Netrik û tayên bî rêşî, ê d'zêr in pê ve wêşî
Mîn du fêris dîn dî pêşî, murwet û insafî yox
- 7 Lew heriftım ez jî meylê, şubhetê sihlê w seylê
Muhbet û ışqa dî leylê, ez kırım yekser pılox
- 8 Dest nehêlım ez j'dinê, şubhê Ferhad û Şêrinê
Wer jî ber ışq û evinê, mîn dî rê çît ev kılax
- 9 Suhbeta çerx û sema tê, wek "Melê" sed muhtela tê
Zemzem û ava heyatê, muşteri sed şex û şox.

DENGÊ TİPA (Ğ : X)

"HEYHEYA DİCLE"

- 1 Heyheya reqs û semaya te çî xweş bestîye çerx
Ku dî burcê bî sema têtê lî ser destê xwe berx
- 2 Sofiyên her dî tewafê, Hecer-ul Eswed e qesd
Gul û sunbul bî sema têtê hemîyan zızmım û çerx

5. ÊDEK: Suxme, sencaq. TOX: Tac, nişan, arme.

6. WÊŞÎ: Weşî, guşî.

7. SIHL: Sêl. SEYL: Qûm, silekan. PİLOX: 1) Pızotê aqır. 2) Peli-xandi. 3) pıxpıxandi.

8. KILOX: Seri.

- 3 Neqşê elmasî lî elmasê bîni girtiye herf
Xettê yaqûti lî yaqûtê şikênandîye nerx
- 4 Kerixîm em dî qiyamê me jî dîl perde dîrand
Arîfê wextîm û Me'rûfî bîla bête jî Kerx
- 5 Da bînasi xeterên rê, tu nebi xafilê jê:
Dicle ye, lê dî pîrîm, bîrbîrê pêl û ber û merx
- 6 Pîrê şaarê dî şîrê û "Melê" şalî-fîroş
Tu nişan mîn mede ferxê, ku lî nîk mîn bûye ferx

DENGÊ TÎPA (3 : D)

"QENC ZANE BE"

- 1 Sîrrê wehdet jî ezel girtiye hetta bî ebed
Wahîd û ferdê, bî zatê xwe wî nînin çu 'eded
- 2 Dî qîdem da ezel û 'eynê ebed herdu yek in
Sermedîyyet we dîxwazî ne ezel bî ne ebed
- 3 Ferqê wahîd jî ehed, lê dî meqamê semedî
Bî heqîqet ku yek in herdu, çî wahîd çî ehed!

-
4. *QIYAM*: Rawestîn, lî piya mayîn. *ME'RÛF*: Şêx Me'rûfê Kerxê.
 - KERX*: Navê gundekî Diyarbekrê ye.
 5. *MERX*: Çavkani. Avzê, qiliç.
 2. *SERMEDIYYET*: Bê destpêk û dawî.

- 4 Yek e derya tu bızan qenci çı mewc û çı hebab
Dı esıl da ku hemi av e, çı av û çı cemed
- 5 Afitabı ehediyyet dı xwe da gırtiye kewn
Ne ku 'ewrek heyê, lê gırtiye çehvên me remed
- 6 Husna zatê but û latan jı cemala semed e
Jı misala senemi weh ku tecella ye semed
- 7 Xeyrı derya niye sehra bı heqıqet emma
Jı rûwê keyfe ku ev av e bûye şubhê zebed
- 8 (Kulle yewmin hûwe fi şe'nin) nebi xafılı jê
Her peyapey jı şûnan dıkırıt feyz û meded
- 9 Ger dı Adem bıdiya sırriyê 'ılm, İblisi
(Hinema ebsere hû kebbere hinen we seced)
- 10 Çı zeman û çı mekan û çı cihat û çı hıdûd?
Çı meqadîr û tefasıl û hısab ın çı 'eded?
- 11 Çı munafat û lızûm ın çı qiyas û çı misal?
Ev çı tewlid û çı terkib e, çı rûh ın çı cesed?

-
4. *HEBAB: Peqpeqok, kef û kunc.*
 5. *AFİTAB: Roj. KEWN: Madde, kurre. REMED: Çavêş.*
 7. *KEYFE: Çewa, rewş, kêf, hal. ZEBED: To. Kefik, reşayiya erdê.*
 8. *KULLE: Hemû. YEWM: Roj. HUWE: Ew. ŞE'N: Hal, rewş. ŞI-
ÛNAN: Rewşan.*
 9. *HİNE MA: Gava ku. EBSERE: Dit. KEBBERE: Tekbir da. HİNEN:
Hingê, wê gavê. SECED: Secde bir.*
 11. *MUNAFAT: Dîtinên zıt. Terkkırına hev.*

- 12 Ser bî 'ıczê dıderıt quwwetê derrakeyê ma
(Rece-'el 'eqlû kelilen we meta qame qe'ed)
- 13 Hıret û 'ıcz e, serencamı dı babê nezerê
(Key bî Xalıq nezerı qasırı mexlûqı resed?)
- 14 Guft û goyê me'rifet çendi "Mela" pey da biki
Gewhera me'rifetê nagihête kes bî xired!

DENGÊ TÎPA (٥ : D)

"CEJNA BÊ PIROZ"

- 1 'Îd e û herkes jî didara te lê piroz e 'id
Ez tenê Mehrûmê didarım bî sed menzil beid
- 2 Her seher dıhnêrım ez cana bî ahan ra jî dıl
(Barek-el Bari bi is'adin 'eleyha yewme 'id)
- 3 Dergehê lutfa te xanım ma lı mahrûman vebî?
(İnne kelben basiten dehren zira'en bîl wesid)

-
12. *RECE'E: Geriyaye. KELİLEN: Westiya. META: Gava. QAME: Ra-bu. QE'ED: Rûnişt, danışt.*
 13. *HİRET: Heyret. QASIR: Kın, kurt. RESED: Gıhaştın.*
 14. *XİRED: 1) Hış, akıl. 2) Leyiztek. 3) Fedikırın.*
 2. *BAREK: Bereket. BARÎ: Xwedê. İS'AD: Seadet. 'ELAYHA: Lı serê. YEWM: Roj.*
 3. *İNNE: Bê şık. KELB: Kûçık. BASİTEN: Vezelandi. DEHR: Zemanê dirêj. ZIRA': Mıl, pepık. WESİD: Ber deri.*

- 4 Pire-merd im, aşiq im iro murada min bîbexş
(Ya hebibi ya mûradi ya muna qelb-il murid)
- 5 (Ferre 'eqli min lehibi misle bazin ew 'uqab
Zabe rûhi misle ma inhelle fi narin celid)
- 6 (Dem'u 'eyni min bukain mislû nehrin fi sukûb
Narû qelbi min xeramin fi diramin fil weqîd)
- 7 Dîl ji ber narê mecazi bil heqîqet bû pereng
(Narû qelbi fi hewa hû mislû narin fil hedid)
- 8 Key xîlas ez dozexê hecri tu ya bîm ey cuwan
Her nefesdared sela û ne'reyê hel min mezid
- 9 Ki dîzanî min ji rîmbazan dema oxilme tên?
Têne dîl sed rîm ji wan û sine tènê sed cerid!
- 10 Mîn ji seffeynan ji nîva meqtelê rîm têne dîl
Lê li wan destan mîhî xwûna xezaya ez şehid
- 11 Mustefa husn û cemalê, sûreta xal û xetan
(Ma telewna xeyre herfi "La" we Qur'anin mecid)

-
4. *MUNA*: Umid, hêvi (yê ku daxwaza alîkariyê jê tê kîrîn).
 5. *FERRE*: Reviya çû. *LEHÎBÎ*: Pêlêdana agirê min. *'UQAB*: Qertel. *ZABE*: Herîki, heliya. *INHELLE*: Heliya. *CELÎD*: Xûzi.
 6. *DEM'*: Stêrê çav. *'EYNÎ*: Çavên min. *BUKA'*: Gîrin. *MEHR*: Çem. *SUKÛB*: Rîjandin, herikandin. *XERAM*: Evin. *DÎRAM*: Koziya agir. *WEQÎD*: Guriya agir, alaca agir.
 7. *PERENG*: Perengê agir. *HEDÎD*: Hesîn.
 8. *EZ*: Ji. *NE'RE*: Qirqîr. Hewar û gazi. *DOZEK*: Doje. *HECRÎTU*: Cudabûna te.
 9. *OKILME*: Belayên giran.
 10. *SEFFEYN*: Du reêz. *MEQTEL*: Şergeh. *XEZA*: Xaziti.
 11. *MA TELEWNA*: Me nexwend.

- 12 Gerçi her daim jî mîhrê neynîka dîl bedr e min
Wek hilala subhê tîm ez carînan bîm napedîd
- 13 Ma bî le'lên canfeza navê me bî nî carekê
(Bîd-dua bellîx tehhiyati li Selma, ya berîd!)
- 14 Tu jî "Melê" botî bîpîrs, esrarê 'îşqê hel dîkî
Vê mû'emmayê çî zanî sed mela û musteid?
- 15 Er bî kuştî wer bî hîştî emr û fermana te bî
("Ehmedo" 'ebdun-reqîqun, waqîfun beyn-el 'ebîd)

-
12. *MIHR*: Evin. *BEDR*: Hiv. *NAPEDÎD*: Nepenî. *Veşarti*.
 13. *BÎD-DUA*: Bî dua. *BELLIX*: Bigehîne. *TEHÎYYATÎ*: Sîlavên min.
LÎ: Jî bo. *BERÎD*: Name.
 14. *MU'EMMA*: Şîfre. *MESTEÎB*: Feqiyê talîb.
 15. *REQÎQ*: 1) Kole. 2) Tenîk. *WAQÎFUN*: Sekîniye. *'ÊBÎD*: Kole
 (yan).

"BAYÊ ŞİMAL"

- 1 Ney-şekera gerden ji ac
Disa ji reştûzên semed
Qewsên lî bala ferq û tac
Keyber reşandîn bê 'eded
- 2 Keyber reşandîn bê hisab
Mısri ku dan şîqal û tab
Sed Rostem û Efrasiyab
Kuştin lî wan ker kîr cesed
- 3 Sed padişah û Xusrewan
Can dan ji îşqê we rewan
Nesrin û lebsê erxewan
Mîn dîn lî bejna serwi-qed
- 4 Mîn dîn lî bejna 'er'erin
Tayên zûbad û 'enberin
Bayê seba da çemberin
Zulf çûne ser nûra semed

2. TAB: Tav, tirêj, çirisk.

3. QED: Bejn.

4. ZUBAD: Binxweş.

- 5 Zulf çûne ser nûra zelal
Carek were bayê şimal
Bîskan jî ser dêmê vemal
Zulfan jî ber cotê esed

- 6 Sehharê cohtê caduwan
Îro jî remza ebruwan
Dîl girt û da ber kaşuwan
Ker kîr lî mûskînan kebed

- 7 Dîl girt û da ber xenceran
Kuştîm nîgar û dîlberan
Me j' destê zulma esmeran
Dad û meded, dad û meded

- 8 Dîlber jî le'lên xwey şefaf
Da min meya gulgûn û saf
Deryayê 'îşqê qaf û qaf
Peyweste têtîn cezr û med

- 9 Husna munezzeh bê misal
Ser de, libasê xet û xal
Sergeşte heyran ma û lal
Ehmed ku di nûra semed

- 10 Ellah jî nûra sermedi
Yek qetreyek da "Ehmedî"
Şîrîni û remzek weh di
Medhûşî ma hetta ebed

5. *ESED: Şêr.*

6. *CADÛ: Sêrkar, bêxûy, pira sêrbaz.*

"HALEYA KESK Û SOR"

- 1 Ahî jî destê wê sirê, dîl bî meyê hewale kîr
Herçî lî mun kîrî "Mela", cama meya dusale kîr
- 2 Şengê bî nazi meşîha, mîsk û zû badi weşîha
Rûy ma dî bîn piyan e, hêj zêde lî mun delale kîr
- 3 Çîçek û gul sehergehan, nesterenên dî xergehan
Têkî jî mîsk û mawerê, mahê xunav û jale kîr.
- 4 Dêmê dî bîsk û xemrîyan, ta û lefên dî şetriyan
Mane temami kesk û sor, bedr e lî dorê hale kîr
- 5 Dûrî kîrîn jî sunbûlan, çîçek û bîşkoj û gulan
Dîl me jî rengê bulbûlan, şubhetê daxî lale kîr
- 6 Pîrê mûxan jî şîşe yê, da me sefineke meyê
Şukrê Xudê ku qulzemek min jî xwe ra qubale kîr
- 7 Xudrî bî remz û mu'cîzi, mesti me dî dî dengîzi
Hati peyaleyek dî dest, eşkere sed peyale kîr
- 8 Xunçeleta j' rengê gulê, dêmê bî sır numa "Melê"
Şubhetê bulbûlan seher, lew me fixan û nale kîr

-
3. NESTEREN: Gulên sor. XER: Dîrî. MAWER: Gulav. JALE: Avî, şebnem.
 4. ŞETRÎ: Kezi. BEDR: Hiv. HALE: Gera lî dor hîvê.
 5. DAX: Çiya.
 6. QULZEM: Derya. Behra sor.

"YARÊ MEDE BI DÎNARÊ"

- 1 Derê meyxaneya 'îşqê, seher arîf ziyaret kîr
Bî abî çeşm û xwûna dîl wudû best û tehareî kîr
- 2 Werin cama hilalê, da jî 'eksê mahî new bînî
Ku xwanê mîhr û cergê çerx û xwanî-roz e xaret kîr
- 3 Bî mîzan qewsê mahê new, lî wechê dîlberê mîn dî
Jî çeşm û goşe yê ebrû, bî dor camê îşaret kîr
- 4 Bî ebsaran nezer mîn çû, jî çerxê qewsê ebrûyan
Şukurxwazîm, ku çehvan karî ber 'eynê bisaret kîr
- 5 Jî ser dêmê nîqab avêt û destûra tewafê da
Dî se'ya beyt û îhramê, û mîn eswed ziyaret kîr
- 6 Dî didarê, hezaran can, nîsarê meqdemê yar in
Kesê canan bî can bînt, dî 'îşqê, wî ticaret kîr
- 7 Bî dinarê dînê zinhar, da yarê xwe tu nefroşî
Kesê Yûsîf fîrotî, wî dî alem da xesaret kîr

1. WUDÛ': Desbêj. BEST: Girtin, grêdan.

4. EBSAR: Çavan. 'EYN: Çav. BISARET: Dîtin. Zanin.

5. NÎQAB: Rûçavk, rûbend, perde.

6. NÎSAR: Amade, xweavêtin, şabaş. MEQDEM: Ciyê ling, pêpelûk.

7. ZINHAR: Haydar. Nebî nebi!

- 8 Tînê ew secdeya şukrê, te bîr mîhrabî qewseynan
Ku delq û şeml û seccade, bî vê avê qesaret kîr
- 9 Dî behsê le'li leb, her xamî narît teb'ê elmasî
Welê te'sîr û feyzî mîhrî tedbirê heraret kîr.
- 10 Dî î'cazî beyanê da, su xen ger bête însafê
Dîzanî mu xteser her kes, "Melê" sîhr û 'îbaret kîr

DENGÊ TÎPA (J : R)

"BIRCA BELEK"

- 1 Xelqno! lî mîn kî şîretê
Ew dilbera zerrîn kemer
Mîn dî dî halê xefletê
Hat der jî burcê wek qemer
- 2 Hat der jî burc û penceran
Dîl gîrt û da ber xenceran
Ev reng e halê dilberan
Lew aşîqan xwûn bû ceger
- 3 Qelb û ceger mîn bûne xwîn
Lewra ku nû derbûn bîrîn
Ey can were halîm bîbîn
Wer rûh jî qalîb bête der

8. *DELQ*: Ebaya dewrê şa. *QESARET*: Şuştî. Dî arava pis da werdan.
10. *SUXEN*: 1) Germî. 2) Germîya helbestan, edebiyat. *MUXTESER*:
Bî kurtî, xulase. *ÎBARET*: Beyan.

- 4 Canê mın er bê ser cesed
Mızgin bı afaqan resed
Alem hemi pê bın hesed
Însan û cınn û canıwer
- 5 Alem hemi têk bûne sef
Seyrin lı şahê mın bı xef
Hatın temaşa çarteref
Şatır xumar têtın dı ber
- 6 Hat padişahê pur sıpah
Qamet elif, dêm şubhê nah
Dad û meded sed ah û ah
Zulf û 'eqarib têne ser
- 7 Gestime xelqno 'eqrebê
Mest ım jı şewqa xebxebê
Talı' tınê mı d'kewkebê
Îro 'eqarib têne der
- 8 Îro 'eqarib hate xwar
Çû nivê baxê gul-'izar
Ew buxçeya her lê buhar
Lew bulbulan lê qal û şer

4. AFAQ: Hemû dinya, ufûq.

5. ŞATIR: Çaqırkêf. Çist. Bêheya. XUMAR: Serxoşi, bêlîşiya jı ber meyê. TÊTIN: Ev gotın dı nusxeyek dın de "tayin" e.

9 Bê hed jî dîl nali û keyb
Da buxçeya rîdwanê xeyb
Van naliyan nînin çu 'eyb
Suhtine em dîl bû seqer

10 Sotîn lî mîn cerg û hînav
Werdên dî hûr girti xunav
Zulf hate ser lê kîr bîlav
Bayê nesim wextê seher

11 Tîrsim muxalîf ba detê
Zulfên dî dora cebhetê
Rakît qiyam wê sa'etê
Alem bîbît zêr û zeber

12 Zahîr dîbêjîn pendegîr
Da dîl nedî zulfa herîr
Şubhê "Melê" d'mîni esîr
Guh dêre qewlê mu'teber

DENGÊ TÎPA (J · Z)

"TU DIZANÎ ÇI KESIM EZ?"

1 Cana jî cemala te mûqeddes qebes îm ez
Ger xûb û perîzade nezerkî te bes îm ez

9. KEYB: Xemgîn. RIDWAN: 1) Dergevanê bîhîştê. 2) Bîhîşt. 3) Rezvan. SEQER: Doje (chennem).

1. QEBES: Pîzot. Girtin. XÛB: Cuwan. Dî nusxeyeke din da "Hûr"e.

- 2 Mıslı mehê new ger te divêtın me bîbini
Mêze bike camê tu dîzani çı kes ım ez
- 3 Yexma jî me can kır, ku tecellayê lî dîl da
Mîn rûhê dî qalîb tu yî, تنها qefes ım ez
- 4 Hubba te ye mîn radihejîni ku bînalîm
Şeb ta bî seher nale, jî rengê ceres ım ez
- 5 Mîn go: Mehê new çasîtiyê ebrûyê yar e
Go: Mîn çı hed e, şubhetê ne'lê feres ım ez
- 6 Saqî jî ezel yek du qedeh bade bî mîn da
Hetta bî ebed, mest û xumar û teles ım ez
- 7 Cana tu yî mîn can, gulê bê xarî kerem bî
Mînnet ku ne wek bulbulê mîhnet 'ebes ım ez
- 8 Sed cewr û cefa dî bî me, naçîn jî derê te
Yekser tu nebati û lî teb'ê meqes ım ez
- 9 Ger weh te divêtın bîbîrî ser, bike ferman
Da vê se'etê ser bîbîrîm, xweş meqes ım ez
- 10 Ser ta bî qedem ez bîsojîm şubhê "Mela"yî
Perwane sîfet suhtîme bê sewt û hîs ım ez.

3. *YEXME: Talan.*

4. *CERES: Zengîl.*

"BI DIL PEYREW IM"

- 1 Tûr ım bı dıl û peyrewê Mûsa yım ez
Ateşperes û nûrê tecella yım ez
- 2 Bari j "'we 'ellem" ku xebardarî kırım
Îro tu bızan, Adem ê esma yım ez
- 3 Înşa 'ulûmê ledun çunkî mı zani
Zani bı heqîqet ku çî inşa yım ez
- 4 Herfên reqem-lewh, wucûda mın bixê wan
Da qencî bıbini ku çî imla yım ez
- 5 Zahır tu perişaniyê halê-m nebin
Mecmûî dî zatê xwe û tuxra yım ez
- 6 Alem çî? Î'rab û hurûf û kelmât ın!
Ew nuqte, dî nefsa xwe û me'na yım ez
- 7 Sed Nîl û Fîrat tên û derın qelbê me
Pê nahîsîhın, qulzem û derya yım ez

-
2. WE'ELLEM: Fêr kîr, hîn kîr. ADEMÊ ESMA: Adem pêxember.
 3. ULÛMÊ LEDUN: Zanîna xasê bı xwedê ve. ÎNŞA: îcad, peyda.
 4. Dî nusxeyek dîn de : "Da qencî bızanî ku çî imlayım ez".
 5. TUXRÊ: Mor, muhr, dexme.

- 8 Tu j'nusxey tewhid mexûn ayetê nefyê
Bê aletê isbatê, ku "Îlla" yim ez
- 9 Sed neql û riwayet, dî meya saf, mûyek
Îro ku jî pirê xwe bî fetwa yim ez
- 10 Peyweste tu her bang me ki, şubhetê ney!
Bê yar û mey û sazê, me go: nayê me ez
- 11 Herçi te bivêtin j'me wer can bixwe bit
Cana bîke ferwarî, vewesta yim ez
- 12 Sed şîş, lî dîl dane jî mûhrê me "Mela"
Lew her bî fixan mîslê ney û nay im ez

DENGÊ TÎPA (J : Z)

"SERFIRAZÎ"

- 1 Aşîq er carek jî bala, lê bîdît berqa mecaz
Dê lî nîk sahib dîlan, hetta ebed bit serfiraz
- 2 Keşf û esrarê sifatan, bê mehebbet nabîtin
Sûretê esma divêtin, da bîkî jê fehîmî raz
- 3 Lama husn û cemalê, dê jî 'ilmê bête 'eyn
'Îşqî da jê hîlîbîtin, kê dî heqîqet bê mecaz?

11. FERWAR: *Ferman*.

- 4 Husn û hubb, bê yek-du nabin, dê bîkîn şah û geda
Nûrê nadît şu'leya Mehmûdi, bê şem'a Eyaz
- 5 Me'neya 'îşqê dîzani, ayeta husnê bîxwûn
Da tu herfên muhbetê yek yek jî hev ki imtiyaz
- 6 Aştîqan bê gavî, lew kalin jî dîl tèn şubhê re'd
Wan jî bala lê dîbarîn wek bîrûskan remz û naz
- 7 Ki xebêrdar bît jî 'îşqê, key jî ber westa gîrît
Gerçi rah ez, zerre zerre sinesoz û cangudaz
- 8 Aferin sed aferin, hey mîn jî wan ra aferin
Ê jî tirên dilberan, daim dî dîl peykan û gaz
- 9 Guh de awazê neyê wextê sema tèn muxbeçe
Fehmê razi ger dîki, çawa dînalîn çeng û saz
- 10 Ew dîlê mîn wek kebûter nabîtîn kes lewme ket
Lew dîvê torê we da keftî me dîn sed şahîbaz
- 11 Wer dîlo! da çîn temaşaya cuwananên çîmen
Wê hîlani ser bî naz û sayeban dayê niyaz
- 12 Zulf û sunbul muşkî bûy û bîsk û sosîn sur-şîrîn
Serwî bala sebzi-pûş û kîl-nîşan û xunçebaz
- 13 Nêrgîzên qamet zumerred, sergîran hatîn xîram
Çarî etrafan bî ref-ref, lê bî meş tèn siy û qaz

-
7. *SOZ: Qelandîn, şewat. GUDAZ: Tewandî, xwar.*
 10. *KEBUTER: Kotîr, kevok.*
 11. *SAYEB: Seywan, nobedar, pawancî.*

- 14 Dıl bı ki dım ez jı wan, her yek bı xencan dıl dıbın
Dılru ba yın, canfıza yın, dılber ın, aşiq gudaz
- 15 'Eqdı ihramê, dema dilber xuyabi ferzi-'eyn
Secdeyek ber wan du bırhan, nagırıt cıh sed nemaz
- 16 'İde û mirê me iro dergehê lutfê vekır
Go: "Mela" hıngi bıxwazi dê bídım, bes tu bıxwaz

DENGÊ TİPA (J : Z)

"BARBARİYA CENGİZ"

- 1 Jı re'na nêrgızên tey mest û xwûnrêz
Zeman bû 'ehdê ceng engizê Cengiz
- 2 Te canê mın divêt ey canê alem?
Jı mın bıstın bı le'lên xwey şeker-rêz!
- 3 Du 'enber bû lı şımşadê bı mesti
Vebestın lew hewa bû 'enber-amız
- 4 Jı axa asitanê mıstekê bin
Lı daxan da bıbinım xweş sebatiz

14. *DILRUBA: Dılrevın, dılıkışın. CANFIZA: Rıhkışın.*

1. *ENGİZ: Barbari, wehşet.*

3. *AMİZ: Tevlihev.*

4. *MISTEK: Wirwarek, çengek.*

- 5 Tenê Ferhad dızanıt lezzetê 'ışq
Ku wi can daye Şêrinê, ne Perwiz
- 6 Teb û tabê hezar işkence da dıl
Jı Şirazê negahê mesti Tebrêz
- 7 Îlahi nêrgıza mey mest û nazık
Jı destê xwar û bedxwahan bîparêz
- 8 Ku lê têt ew qebaya asimani
Letifa şeng û nazık wek belaziz
- 9 Sewaşek rêhte disa alema dıl
Bı cadûwê du çeşmê fitne engiz
- 10 Xebais teb-'e, jahıl seg sırişt e
Yeşin ew ker jı canan lew dıkıt biz
- 11 Mebin ew ger bı sûret ademi ne
Hemi dar ın, jı êğır ra kırı rêz
- 12 "Mela" canê te çawan pehlewani kır
Lı tayê xemriyan zulfa dıl awiz
- 13 Jı husna bê nişan, nadi nişanek
"Nişani" ger jı dıl nekra te perhiz

-
5. *PERWİZ: Bernavkê Key-Xusro.*
 7. *BEDXWAH: Dîlpis, xêrnexwaz.*
 10. *JAHL: Jı aliyê. SIRIŞT: Xwûy, tebiet, eslû fesl. BÎZ: Bêzi, kin, nefret, rik. Xweparastin.*
 12. *AWÎZ: Hilavêtin, hilperikandin. DILAWÎZ: Dîlpêve.*

"DINALIM ŞEV Û ROJ"

- 1 Tu dîzani bî Xudê mîn tu xîyali şeb û roz
Bî xîyala xwe medam mîn tu lîbal î şeb û roz
- 2 Her bî mîzan dîreşîni ce " " tir û xedeng
Jî neseq saîqe me j'qewse " " li şeb û roz?
- 3 Mîslê goyin te rewan-nal jî dilê mîskîni tèn
Em nîzânî tu çîra her weh dînali şeb û roz?
- 4 Te bî fîryad û fixanan bîxwe bulbulî ker kîr
Ellah, Ellah jî çî derdî weh dîkali şeb û roz?
- 5 Da ku dilber, qedemê lê bînihed rewşenî kîr
Lew tu xwûnê weh jî çehvan vedîmali şeb û roz
- 6 Te tinê zewq û sefa kîr bî seyên dilberê ra
Sernîxûn geh şubê nûn geh weku dal î şeb û roz
- 7 Fetweya Pîr î "Mela", yan tu bî îlhamê nebi
Vê meyê her weh dînoşî bî helalî şeb û roz

2. NESEQ: Tekûz, tertîb. SAÎQE: Deng, bêhîşî. Bîrûşk.

3. REWAN-NAL: Nalînên lî pey hevdu.

5. QEDEM: Ling, pi. BINIHED: Pê lê ke.

6. NÛN: 1) Tîpa " " (N) dî elifba erebî de. 2) Navê masiyekî ye.
DAL: Tîpa " " (D) dî elifba erebî de.

"TURKÊN XWÛNRÊZ ME KIRIN ZÊR Û ZEBER!"

- 1 Şahidê cilwe numa, qudsiyê feyrûz e libas
Herçi rengê te nişan dît, tu nişanê xwe bînas
- 2 Husnî bê ayineyê îşqê tecelli naderît
'Îşqê Mehmûdî dî me'na nemeki husna Eyas
- 3 Herçi rengê te bivê tîn xwe bîbîni lillahi
Nezerê wer bîde kasê, çî xweş ayine ye kas!
- 4 Tu şerabê bî xerabê, bî nehîngan deh demi
Dê kifayet bî çî rengî me bîkîn kuze û tas?
- 5 Remz û razên ney û nayê ku semaine hemî
Jî mehalan e bî 'eqlê xwe bîzani jî qiyas
- 6 Wê dîkî mexlete her dem lî herîfan bî cedel
Bî du caman vedîxwun sîretê ebyed û weswas
- 7 Destegirê te nebît Xedrê 'înayet lî qîdem
Nagehê aba heyatê bî du eskerî Îlyas

-
1. ŞAHID: Dilber. FEYRÛZ: Pîroz, şen, kêfxweş.
 2. MEHMÛD: Mehmûdê Xeznewî. NEMEK: Nem, terayî. Xwuy, zêde bûn, grêdayî. EYAS: Eyaz, navê dîlketîya Mehmûd e.
 4. XERAB: Meşk. Qedeha ziv. Kûp. Dî du çapên diwanê yên dîn de, li şûna "bî nehîngan deh demi": 1) "bî nehînganê demi". 2) "bî nehîngan bîde mey". hatiye nivîsandin.
 5. SEMAÎ: Bîhistî.
 6. MEXLETE: Hilekari. HERÎF: Hevdem.

- 8 Tu binê mahê new û destê qezayê hey û hey
Ne lı zer'ê felekê, belki lı 'umrê me ye das
- 9 Turkê xwinrêz û xumari, me bı yek xemzeyeki
Zuhdê çıl sale lı mın zêr û zeber kır jı esas
- 10 Jı lebê le'lê şeker yar qe nekır pursa "Melê"
Mısriyan gezme reşandın, ku kışandıne elmas

DENGÊ TÎPA (س : S)

"ZUNNAR Û ÇELÎPA"

- 1 Dıl yek e, dê 'ışqı yek bıt, aşıqan yek yarı bes
Qible dê yek bıt, qulûban dılberek dıldarı bes
- 2 Mın dı benda zulfekê dıl da bı destê pirê 'ışq
Lew dı 'ışqê da ku best ihram û yek zunnarı bes.
- 3 Terh û terz e bûne zunnar û çelipa yek bı yek
Lew mı zunnar û çelipayek tenê yekcarı bes
- 4 Hın jı nık dêrê ve tên, qesta keniştê hın dıkın
Ney jı van ım, ney jı wan ım, mın derê xemmarı bes

8. ZER'Ê: Ziraetê, çandiniyê.

9. ZUHD: Zahid, xebat. Ev qeside eşkera dike ku wextê Mela Divan. nûisiye umrê wi çıl sal bûye.

3. TERH: Tip, biçim. ÇELÎPA: Xaç.

4. DERÊ XEMMAR: Derê meyxanê.

- 5 Gerçi tèn reqs û semayê, her seher sed ney-şeker
Mın dı bezma surşırinan, ew şırin reftarı bes
- 6 Weh çı wala gewher ın, hatın libasê cism û can
Mın ji wan hori-sırıştan, ew peri ruxsari bes
- 7 Hewce sıhrê Samiri nin ın, ku zulfa reş bıkıt
Çeşmê benda dılrûbayan, kakula 'eyyarı bes
- 8 Bulbulan sed gul dıçav ın, çav lı sed gul dı dıkmın
Mın dı baxê gul'izaran, yek gul û gulzarı bes
- 9 Mın dı baxê gulfiroşan di 'eceb resmek xerib
Xarê teb'an gul dı dest ın, gulperestan xar i bes
- 10 Ew cefa çû der ji hed zulma te bir hetta bı Çin
Rehmkê carek neki hey zalım, ev azari bes!
- 11 Xerqê deryayê gunah ın, teşneyê lutf a heq ın
Rehmeta amirzigar û şefqeyê xeffari bes
- 12 Elilê dunyayê seraser dijminên mın bın "Mela"
Piştêmêrê mın 'Eli bi heyderê kerrar i bes

5. *BEZM: Cıvat.*

6. *WALA: Bılind, berz. Hêja. RUXSAR: Dê m, rû.*

7. *'EYYAR: 1) Rıhetiya dıl. 2) Hespê serbılind. 3) Siwarên Ewropi. 4) Fêlbaz.*

11. *TEŞNE: 1) Têhn (ti) 2 Hewce, mehtac. AMIRZIGAR: Bexşıwan.*

12. *HEYDER: Bernavkê Hz. Eli ye.*

"QEDRÊ GULÊ ÇI ZANE
KERBEŞ DIVÊ KERÊ REŞ!"

- 1 İro "Mela" serapa lew têkî bûme ateş
Min di seher xeraman neyşekera şirin-meş
- 2 Ya Reb, çî turfe-mêw e, ev reng e mey dî bexşî?
Şî'ra me tê perîşan, nezma me tê muşewweş
- 3 Dîl geşt e min jî dêrê naçim kenîşteyê qet
Mîhrabî wê bî min ra, wer da biçîne "Laleş"
- 4 Mehbûbê wek stêr e, govend û 'îşqîbazi
Têkîl biçin semayê, hîşyar û inest û serxweş
- 5 Heywan lî ku dibinî, em muftiyê zeman in?
Bîstin jî destê saqî, cama zelalî bê xeş
- 6 Wer guh de çeng û nayê, şîrin ku bîn semayê
Camê bînoşe vêra, çî sade û çî zerkeş
- 7 Talî' ku bêt û furset, muhlet lî nîk heram e
Min 'uînrê Nûhî nine, saqî were bîlez xweş
- 8 Neyşekera şêrin qed, me j' dest te mey divê tî
Da sine pê cêla dîn, rewşen bîkî dîlê reş

-
1. SERAPA: *Jî serî ta pê, serdanpê.*
 2. MÛŞEWWEŞ: *Tevlîhev. Bê tertîb.*

- 9 Camid çı kın bı husnê, ku wan nezer lı xwar e?
Xer-teb'etên dı ebleh, çı nêrgız û çı kerbeş!
- 10 Kor e xwe nasîpêrit carek bı dest delilan
Ebleh çıkıt tewafê? nabinitın berê reş!
- 11 Bêzi dıkıt jı qencan, jı remz û naz û xencan
Qedrê gulan çı zanıt? kerbeş divêt kerê reş
- 12 Feyza me şubhê Nil e, em Dicle û Fırat ın
Ger şeyx û wer imam e, vêra ye mın keşakeş
- 13 Soxa ku ez dı bendê, dıl gırtiye kemendê
Letif e zuhre-sima, ebrû hilal û mehweş
- 14 Burhên jı qewse qudret, nişane kır "Nişani"
Lamı' jı ber dıbarın, çı yengiyek weh perweş?
- 15 Ellah lı mın hubba te, çı şekker û nebat e
Jı nû ve dê cuwan bım, ger bıhn bıkm gula geş

DENGÊ TÎPA (ش : Ş)

"KUŞTINA ZENGÎ"

- 1 Şebê qedrê lı me rewşen ke, tu rûhi were xweş!
Me jı nû xweş ke, lı ser çehvê şehidên xwe bimeş!

9. CAMID: Bê rih. XER: Ker.

13. MEHWES: Hiva geş. Wek delaliya hivê.

- 2 Ma lı mın ki nezerek lutf û jı dıl xemzeyeyan
Bireşini cegerê rişı jı qewsên xwe biweş
- 3 Seherê cumle şehidên te bı rım avêhti (ye)
Ê jımarine yeka yek me hemi şeş sed û şeş!
- 4 Lê şehidên te bı iymarê bı xencer kuşti(ye)
Hê neçû xwûn jı birinan, sed û heftad û du leş!
- 5 Cengê Hındi dıkırın Fêris û rumbazê 'Ereb
Tox û ala dı Fıringi ne, kemandarê Hebeş
- 6 Tu bınê, Rom û 'Ecem kuştine Zengi dı kemin
Hane her têtê peyapey jı teref Rom xweş û xweş!
- 7 Da me şehzade bı destê xwe mûbarek qedeliek
Ne xubarek jı xumari yû ne tundi yû ne xeş
- 8 Du qedelı mey bı "Nişani" dıderit rengı bı reng
Nêrgıza nazık û re'na û gula taze ye geş
- 9 Xaliba ehlê zemanê, ma "Mela" ademi yın?
Venumayın jı kerê mey reş û gayê te yê beş!
- 10 Arifên ehlê besiret, jı neseq merdumê çeşm
Surmepoş ın dı beyadê û qebayê xwe yê reş.

-
2. XEMZE: *Awirê bı naz. Kortıka dê m û erçenê.*
 6. ZENGÎ: *Emaddinê Zengi, paşayê Mûsilê (550-600 hicri).*
 7. XUBAR: *Toz, xwelî. XEŞ: Kewş (qırş û qal).*
 10. NESEQ: *Tekêz. Herwek. MERDUM: Meriw, mîrov, insan. BEYAD: Sıpi, sıpitayî.*

"DERDÊ MELE"

- 1 Selwa sehi-qed xemûlî
Lew kemmûlî mestane reqs
Wer suhbetê ger qabûlî
Dê bêt û ret şahane reqs
- 2 Mestane mestan noşe noş
Qerqef dî caman hate coş
Ma dê bîmînt kes lî hoş?
Weqtê ku bîn durdane reqs!
- 3 Suhbet bî sazan hate saz
Pê mewwîcî deryayê raz
Da dîl jî nû bayê mecaz
Wê keştîyê sukkan e reqs
- 4 Mehbûb bî 'eynê kewkeb ın
Reqsê ku tê dîlber hebın
Sed can gîramê mîn hebın
Bavême rê, erzan e reqs
- 5 Kır şîme û raza beri
Arîf venebîn lê derî
Hetta dî nîva agîrî
Ew xef nebit perwane reqs

3. RAZ: *Ev peyv dî nusxeyek dîn de "NAZ"e. SUKKAN: Sekin, rû-nîştin (pr.).*

4. GIRAM: *Nîrx. Xweş.*

- 6 Perwaneyê şem'a geş in
Zulfên weh nazik raweşin
Şewkên dî dîl da pê xweş in
Me j'penceyên şêran e reqs
- 7 Ala û tayên qurmızin
Eslan dî ber da berızin
Nêrgız dî baxan tewwızin
Ney şekeran nişan e reqs
- 8 Weqtê ku ba bîn erxewan
Gulçiçek û terhên cıwan
Wêran e bê selwa rewan
Arif lî ferqê can e reqs
- 9 Îro şeker xendê bîrin
Destê sıpi zendê bîrin
Disa bî govendê bîrin
Derdê "Melê" derman e reqs

DENGÊ TÎPA (ض : D)

" ZIMAN PÊ WÎST E "

- 1 Şiweyê dilberê bîzan, sunnet e şîwe, 'îşwe ferz
Her,du nezer ku bîn qeran wacib e yek kırışme ferz

6. *ŞEWK: Dîrî. Şewka masîyan.*

7. *QURMIZÎN: Sor.*

8. *Dî nusxeyek dîn da rêza pêşî weha ye: "Weqtê xuya bîn erxewan".*

- 2 Herdu qeran ku qible bîn, her çî dema xuyabîn ew
Wê se'etê dî dinê 'îşq, lazîm e yek du secde ferz
- 3 Xırqeyê zerq û jengi-zuhd, mîn bî meya muxane şuşt
Şust û şuwîk dî meykedê ewwelê karê ferz e ferz
- 4 Neyşekerên şêrin zeban, mestê bî cam û bade bîn
Ferz e dîbît jî tewbeyê, salîkê îşqê tewbe ferz
- 5 Saqiyê simî saqî ma zehra helahîlî bî dest
Canê me şukr û minnet e, tîzî-rewane reqs e reqs
- 6 Xalî eger bî wecheke bête qelbê ebrûwan
Şubhetê Beytê Meqdes û Keşîk dîbîn du qible ferz
- 7 Ez ku dî de'wa aşîqî, kîfşe dîkît zeban derew
Ketmê şehadeti dîbît, wê se'etê bî şehde ferz
- 8 Cebhet û dêm û gerdenê, perde dema jî ber bîret
Ferz e "Mela" lî hacîyan, se'y û tewaf, û 'umre ferz

DENGÊ TÎPA (ض : D)

"ÇÎ XEREZ ?"

- 1 Mê jî bîl husn û cemalê çî xerez?
Bê cemalê, jî peyalê çî xerez?
- 2 Ger ne teşbihê du burhên te bitîn!
Me dî 'îdan, bî hilalê çî xerez?

- 3 Ger ne qesta dıl û canê me dıkıt!
Me jı wê şox û şepalê çı xerez?
- 4 Ger ne rûhê me dı pey dıl bîretın!
Me jı wê qenc û delalê çı xerez?
- 5 Ger ne b'ismê te mu'emma bın hırûf!
Me bı şıklê xett û xalê çı xerez?
- 6 Ne ku şermende jı rûyê te bûwa!
Afitabı bı zewalê çı xerez?
- 7 Qestı wehdet dıkırıt rûhı bı rûh!
Wer ne, aşıq jı wisalê çı xerez?
- 8 Dı şebê qedrê tecella tu biki!
Me lı pey mûm û şemalê çı xerez?
- 9 Ne cemala te tecella bıkırıt!
Me jı xuban bı cemalê çı xerez?
- 10 Ne jı le'lên te "Mela" behsê bıkıt!
Me jı vê behs û sûalê çı xerez?

"MALÊ ME"

- 1 Disa li bedrê katîbî
Kêşa jî nû jengarî xet
Nûr e reşandi wahîbî
Der girdîşê pergari xet
- 2 Herfên jî qudret nûqte pur
Madarê hewza le'l û dur
Ev rengî kê di weh bî sur?
Qudret numûn zengari xet
- 3 Ev çiçekên şetî şîbêht
Ef'a sîfet qelbê me mêht
Selwa jî balayê we rêht
Ev perdeya gulnarî xet
- 4 Neqş û nîgarên dilberan
Dercin jî remzên esmeran
Her tîn jî dest neyşekeran
Me j'gulşenê ferxarî xet

1. GIRDÎŞ: Gerandin.

2. MADAR: Dormedar.

3. ŞÎBÊHT: Teşbih. EF'A: Mar. GULNAR: Çiçeka hînarê.

4. DERC: Xuricandin. Têxistin. Weşan.

- 5 Me j'dest-xeta terhên şelal
 Xal û xetên nûra zelal
 Dani dî sindoqan lî bal
 Malê me sed qentari xet
- 6 Bergên gula reyhaniyê
 Katîb nîmûçek daniyê
 Kes di bî vê şiraniyê?
 Der sen'etê cebbarî xet !
- 7 Reyhan û sunbul tê hene
 Sed çiçek û gul tê hene
 Zerbav û bulbul tê hene
 Ew bexçeya gulzarî xet
- 8 Gulçiçek û neqşên xerib
 Nesrin û reyhanê 'ecib
 Lê rast û çep bûyin selib
 Cedwel keşî zunnarî xet
- 9 Îro seher tuxra nişan
 Î'rab û herfên zerfîşan
 Hatîn dîgel bayê sîban
 Me j'canibê dîldarî xet

5. ŞELAL: *Xemrevîn.*

6. NIMÛÇ: *Nîmûne, mestere.*

7. ZERBAV: *Zerzerok.*

8. SELÎB: *Xaç.*

9. zerfîşan: *Zêrweşîn.*

- 10 İro berata Ehemd i
 Tuxra nişan zerkeş medi
 Xettê humayûn ki weh di?
 Şêrin û me'nadarî xet !
- 11 Ellah dî ber "Qal û belê"
 Da yexme kîr qelbê "Melê"
 Avêhte çerx û cedwelê
 Ev reng e 'enber bari xet

DENGÊ TÎPA (𐬵 : T)

"PÊLÊ XWÎN

- 1 Xwûn ku jî dîl bî mewcî bêt
 Eşkê rewan me têne xet
 Nîl î jî dîdeyan dîzêt
 Keftîme navê şubhê bet
- 2 Katîbê neqşê qudrêtê
 Zêrê reşandî ser xetê
 Erzen û dêm û cebhetê
 Pê neqqîşand û kîr nuqet
- 3 Cebhet û dêmê neqqîşand
 Mîsk û zûbadê lê feşand
 Nûrê jî zulmetê reşand
 Taze kîşandî xet bî xet

2. ERZEN: Erçen. NUQET: Nuqte. CEBHE: Eni.

- 4 Hor û fireşte kê we din?
Nazık û xûb û surşêrin
Dê mê numûne pur bı kin
Sûretê Çin numa xelet
- 5 Şî'rê "Melê" ku wek rewan
Daye te canê merivan
Pur me lı bergê erxewan
Dine xezel lı nık şetet

DENGÊ TÎPA (**ل** : T)

"YEXMA Û TALAN"

- 1 Mey ne noşî Şeyxê Sen'ani xelet
Ew neçû nêv Ermenistanê xelet
- 2 Mıslê Mûsa wi tecellaya te di!
Ê tu di, kanê xeta hanê xelet?
- 3 Wi nedi bejna te, û dayê qiyas
Hıkmê lew çûye burhanê xelet
- 4 Setweta Leylê yeqin Mecnûn tepand
Wer ne. Qeys nakıt be yabanê xelet

3. BURHAN: *Belge û delil.*

4. SETWET: *Şiddet. Şıdandına gemê (destgin, dızgin). QEYS: Mecnûn. YABAN: Biyan. Welatê dereke.*

- 5 Wek "Nişani" neqş û nişanek te di
Ê ku nişanek te di kanê xelet?
- 6 Ez geham ava heyatê xef ji dîl
Xudrî vaji çûye heywanê xelet
- 7 Şahneşînên nazîkan dayî' mekîm
Da nebîni dîl bî vê xanê xelet
- 8 Ellah Ellah çerx û dolabê dinê!
Nuqte qet nakît dî dewranê xelet
- 9 Roz û şeb her seyîrî didara te tîn
Nakîrîm ew dewr û seyranê xelet
- 10 Hûn nebên meşşateyê xef daniye!
Hem qeran kîr xal û nişanê xelet
- 11 Dê bî ser canê me mîrwet da me îx
Bîşkuwên benda giribanê xelet
- 12 Ser nebi ber kufîrî zulfê aqîbet
Ez dîtîrsîm lê jî îmanê xelet
- 13 Pehniya vê çerx û dolaba dinê
Nîsbeta erbabê 'urfanê xelet
- 14 Nûsxeya alem hemî 'înwanek e
Nuqteyek nabî dî 'înwanê xelet

6. *HEYWAN: Ava heyatê.*

- 15 Qulzem û bayên muxalîf tê pur in
Da nekelşin darê sukkânê xelet
- 16 Da bîzani pehlewani mûyekî
Dest nedi lillahi mîzanê xelet!
- 17 Wê dî destê min gula geş pur xunav
Heyfî bulbul çû gulistanê xelet!
- 18 Hêji sehwa xameyê bû, wer ne, min
Ev xelet nakir dî diwanê xelet
- 19 Wê lî ser bejna te ev seywan veda
Wer ne, nada rojê seywanê xelet
- 20 Geh dîl û geh can dîbîn Turkên te tîn!
Nakîrîn yexma û talanê xelet!
- 21 Meşrebê Turkan Furat û Nîlî kir
Teşneleb çû terfê Ummanê xelet
- 22 Pirê hikmet bîn lî wîfqa meşreban
Kes nedi mey rêhte fincanê xelet
- 23 Rast e yek qanûn seraser nine tê
Xwehri yû pêçên perîşanê xelet
- 24 Pakî teb'an quwwetek mewzûn divêt
Da ne dît sen'et bî idmanê xelet
- 25 Merdumên çehvên "Melê" 'eksa xwe di
Wek "Nişani" ma lî nişanê xelet

"GER HÛN REWANBEXŞ IN!..."

- 1 Bê lebê le'le "Mela" mûn ji meya alî çî hez?
Suhbeta tê nebitî yarı bî her halî çî hez?
- 2 Qedehek bade bî destê xwe lî qelbê me birêj!
Aşiqê suxite bî, ateşê seyyalî çî hez?
- 3 Ne ku wek teyrî, jî inûjen te bîbarî peyikan!
Jî birinên dî dilê şubhetê xîrbalî çî hez?
- 4 Hezz û lezzet me bî 'uînrê xwe dî îşqa te nedî!
Hem bî van derd û xeman zêde tu îsalî çî hez
- 5 Husn û sur zatî nebit, cezbe lî dîl (dî) dît mehbûb
Me jî zulf û xet û xal û qedê meyyalî çî hez?
- 6 'İlmê 'îşqê but û latan, bî riwayet nabitî
Qederek hal ku nebit, şubhetê her qalî çî hez?
- 7 Bedewê pakî çî kîr, feshetê meydan ku nebit!
Mustemî' guh nedîrî, muîrib û qewwalî çî hez?
- 8 Durrê-nasufte dîrêjî, jî lebê le'li "Mela"
Ger rewanbexşî nebit, nezamî ker û lalî çî hez?

1. HEZ: Par, beş.

2. SEYYAL: Rewan, Harikandî. Geş û gur.

4. XIRBAL: Bêjing, scrad, moxil, qalbûr.

6. QAL: Peyv.

7. MUSTEMÎ': Guhdar.

"MUŞKILÊN DÛR Û DIRÊJ"

- 1 Ser dîdît abî kewserê
Zemzeme û semayê zulf
Saye numayî xawerê
Sidreyê muntehayê zulf
- 2 Saye numayî cebhetê
Neqş û xetê jî qudretê
Nuqte û herf û cezme tê
Bal û perên humayê zulf
- 3 Bal û perên sîfet huma
Saye lî cebhetê numa
Xemrî û lef çûne sema
Yek bî yek ew lî bayê zulf
- 4 Netrîk û berg û şîtrîyan
Reqse jî rengê xemrîyan
Baz û 'uqab û qumrîyan
Seyre seher tebayê zulf
- 5 Her me jî burcê sunbul e
Pence dî sine û dîl e
Dûr û dîraz û muşkil e
Qisseyê macerayê zulf

2. CEZM: Îşaretê hevgirê dana tipan dî erebî de. HUMA: Teyrê dewletê.
5. DIRAZ: Dirêj.

- 6 Bestine zulfê derkemin
Helqe bı helqe çin bı çin
Yexme dıkın dılan nıhın
Têne yeqın xetayê zulf
- 7 Rom û 'Ecem jı her teref
Hındi û Zengi sef bı sef
Ceng û suwaş e wan bı xef
Hatine ber liwayê zulf
- 8 Her dem û her se'et jı nû
Pêt e dı sine nar û dû
Sebr û qerarê mın jı kû?
Aşiq û muhtelayê zulf
- 9 Zulfê siyah i bê wefa
Qet me nedi jı wê sefa
Kuştıme ez bı sed cefa
Ahi jı dest cefayê zulf
- 10 Zor û feqir û muhtela
Zahıd û sofi yû "Mela"
Kuştıme ew bı sed bela
Kes nekevıt belayê zulf!

"TİRÊN XAN ŞEREF"

- 1 İro jî şehkasa surê
Mey hate fincana sedef
Minnet ku iro dêm dûrê
Da min meya husna xwe xef
- 2 Xef da me cama kewserê
Şêrinqed û leb-şekerê
Bayê seba da çenberê
Hatın sema şetri yû lef
- 3 Şetri yû zulf û belg û per
Hemyan lî dêm de'we yû şer
İlan lî selwa bûne ger
'Eqreb xuyan ez her teref
- 4 'Eqreb nihîn ew sunbul in
Bo 'enberan dava dîl in
Nişan jî mîsk û filfil in
Wan sineyê min kîr hedef
- 5 Da sine cohtê tîrxweş e
Qewsê hilali tûzreş e
Yek tîrî pur kuştî nî leş e
Xwûnê dî cerhan daye kef

3. İLAN: Mar. EZ: Jî.

5. TÛZREŞ: Reşê bîrçok. CERH: Bîrîn.

- 6 Mın xwûn bı cû têtın jı dıl
Ew baziye bê tor û sıl
Dakefte nêv tûra qızıl
Qumri nehiştın ref bı ref

- 7 Ref ref nehiştın zaxı-zax
Danin lı dıl mın daxı-dax
Dê ki bımınıt saxı-sax?
Westane leşker sef bı sef!

- 8 Sef sef me dın Hındi û Zeng
Cengızı hat Timûrileng
Xef wan reşandın dıl xedeng
Teşbihê tirên Xan Şeref!

- 9 Tirek jı qewsê malzırav
Tê dıl qewi tavêje nav
Xwûn tê puri teşbihê av
Fıryad û efxan sed esef

- 10 Can dê nedıt ew malxerab
Her sineyê cotek xurab
Tê da bırın pence w kulab
Wê can dı dest û rûh dı kef

- 11 Canê "Melê", rûha "Melê"
Nûra jı qudret nuqte lê
Remzek nıhın da mın welê
Nalim jı ber wek nay û def

7. ZAX: *Qijik*.

"SORÎYA XÛNA ME YE!..."

- 1 Nazîka mîn dî semayê bî serenguştê eqîq
Da me iro dî serayê qedehek taze rehîq
- 2 Mî jî dest û yedê beyda, qedehek safî vexwar
(Şe'şaniyyin ke necmin bî senahû we berîq)
- 3 Sîrrê le'le lebe can-bexşî nîzani tu bî behs
(Eidin-nezrte ya nezîrû, fes-surrû deqîq)
- 4 Bî lebe le'le şeker-xende şîkêna şekerek
(Ena bil we'dî le wasîq, fe leh-el we'dû wesîq)
- 5 Dî rîya durrê muradê me serî daniye rê
(Xuttu fil behrî we la zewreqe wel behrû 'emîq)
- 6 Mîn jî xeflet serhê dî û bî du remzan kuştîm
Xweş bî heqqê xwe gehistîm (ena bil getlî heqîq)

-
1. SERENGUŞT: Sertîlî. REHÎQ: Mey, Bade.
 2. ŞEŞEANI: Dê mên xweş. Şeraba têkîlav. KE: Weke. NECM: Stêrik. BÎ'SENAHÛ: Bîruhniya xwe. BERÎQ: Tirêj.
 3. EÎDÎN-NEZRETE: Car dîn mêzeke, disa binêre. NAZÎR: 1) Mêze-kîrox. 2) Tamaşaker. DEQÎQ: Kûr. Têgîhistina pur zor. Tîştê pur hûr.
 4. ENA: Ez. BÎL WE'DÎ: Bî peymanê. LEWASÎQ: Bî bawerî, xatîrcem. LEHA: Jê re. WESÎQ: Qewî.
 5. XUTTU: Nîqo bûm. FÎL BEHRÎ: Dî deryayê de. LA: Na. ZEWREQ: Kelek, qeyik. 'EMÎQ: Kûr.
 6. BÎL QETLÎ: Bî kuştînê. HEQÎQ: Musteheq, xwevayî.

- 7 Qet nego, qetle dıkım, bê guneh(e) û mezlûm e
(Reşeqetnı bi nibalın we remetnı bi remiq)
- 8 Tir û rım herdu lı dıl dan, lı ceger çespanı kır
Ew jı xwûna mune rıştı, tliyên sohr i 'eqiq
- 9 Sosınên tey ter û nazık lı gulan te'ne dıdın
(Fe bih-el 'enberû faih, we bih-el miskû 'ebiq)
- 10 Çı bı kuştın, çı bı luştın tu ku ferman bıkrı
Ez bı hukmê te xweş ım ("Ehmedo" 'ebdun we reqiq)

DENGÊ TİPA (ق : Q)

"YAR HAT Û MEST"

1	Mın di ji xef Roj hat şeref Zulmet nema Lê ew dema	-let cam dı kef stêr bûne xef suhbet veh ma zulf bûn cema	şahê Necef her çar teref nûra şema hatın sema	dıl kır hedef nûra yeqeq -lan çû sema -yê yek neseq
2	Werdan gulav Mın di bı çav Nûra beser Xalên dı qer	girtın xunav zulfên bılav guft û xeber bavê seher	lê mın dı tav lê bûne dav qend û şeker da bête der	suhtın hınav bend kır bınav zulfan ji ser subha bı heq

7. *REŞEQETNÎ*: Reşande mın, lı mın weşand. *NİBAL*: Tiran. *RE-METNÎ*: Avête mın. *REMIQ*: Awurê tûj. *Nêrtına* bı hêbet.
8. *ÇESPAN*: Bıcıkırın, te'sir. *Zeliqandin*. *RIŞTÎ*: Rijandi.
9. *FAIH*: Belavbûna bîhnê. *'EBIQ*: Belavbûn.
10. *REQIQ*: Kole, jar, tenik.
1. *YEQQEQ*: Geş.

3	Mı j'behr wiyan Wer kuştıyan Kır şefqe mir Negha feqir	pur naliyan j'wan yengiyan anime bir zulfa herir	şevtariyan bı wan tliyan berdan me tir avêhte şir	ceng bû meyan xweşke giyan kırme esir da pê meheq
4	Ê muştêri Avêt seri Kelbê deri Behr û berî	dêmê zeri gava berî nişan berî 'ışq û surî	nebır seri lazım herî tir awurî avêhte rê	ney can berî wê ev perî mujgin perî ser ma qeleq
5	Mın dı dı new Mın bû dı qew Hêstır rewan Dul wek guwan	-bê yarî tew -sê bûyî ew tên wek cûwan ber kaşûwan	sundus e ew şivan mı lew tir dan ewan ser lu'luwan	bêm bê derew nayê me xew reş-êbrûwan bergên wereq
6	Bejna şepal Neqşê celal Ez telbe ya Cama xwuya	dêmê bı xal cama zelal ava heyâ bû 'ışweya	ı'rab û dal xeınra.helal tê bûm teya yar lew peya	qewsê hilal sulhbet bı hal kij badeya pey tèn sebeq
7	Canê "Melê" Belgên gulê Perde w sutûr Nûra Xefûr	j'qal û belê rû-lıeykelê da bê qusûr xalên dı hûr	bend ım welê ew musk e lê bêtın zuhûr cama tehûr	der kakulê carek hilê dêmê bı nûr le'lên şefeq
8	Yar hat û mest Kakul dibest Ew lebşeker Xalên dı qer	subha elest tayek verest wa hate der zulf çûne ser	mın dest bı dest vêra şikest rabû jı ber eslan seher	dı cam dı dest nişan e qest tayên dı ber lê bûn fereq

5. GUWAN: *Gog. (pirane)*. KAŞUWAN: *Darên gogê*.

"ZEYD Û 'EMR XEYALÎ NE!"

- 1 Dilbera min seherê hati bî tox û bî yedek
Sed yedek bûn dîberi têkî bî sincab û weşek
- 2 Yarı bû çûme bîwarê bî ziyaret kef 1 pa
(Qale: Ya aşiqo hati ke yedi hati yedek)
- 3 Dîl û can herdu mî danê ku icazet jî me xwast
(Qultu: Estewdiûk-el Bariye Ellahû me'ek)
- 4 Te dîvê safî yû zexel jêk vedi, tecrîbe ke!
Da îyarê bîtemami binumêtin te mehek
- 5 Dewrê zulfa te muselsel bî nezer hel ku nebit
Nezerê safî dîlî ser dîderit nuqtîyê şek
- 6 Ahûwa min ne ku rencêk te bixatir bigehit
Bî Xudê kî lew ku ew seg bî Xudê hate mesek
- 7 Bî evîni melek û çerx û felek tene sema
Rewşen in tîkî bî mîhrê jî sema ta bî semek

-
2. QALE: Got. HATÎ KE: Ha jî te re. YEDÎ: Destê min. HATÎ YEDEK: Ka destê xwe bide.
 3. QULTÛ: Min got. ESTEWDÎÛK-EL BARÎ: Te dispêrime Xwedê. MEÊK: Bî te re.
 6. MESEK: Girtin.
 7. SEMA: Asiman. SEMEK: Masi.

- 8 Ne ku peyweste bî yek bîn jî surê îşqê du rûh
Dê bî eşbahi bîbîn wasîl û peyweste bî yek
- 9 Jî musemma 'eded û kesretî esma tu mebin
Zeyd û 'emrên me heta çendî? dunîn e yek û yek!
- 10 Çî fesahet bî melahet weh dîdêrî tu "Mela"?
Ev edaya te dî şî'rê weh şîrîn bî nemek

DENGÊ TÎPA (ک : K)

"MURADA MIN BIBEXŞÎ"

- 1 Tealellah zehê husna mûbarek!
Tebarek sed tebarek sed tebarek
- 2 Meger şêrîn bî vê şîraniyê bû
(Ela şems-ûl melahet qed tuşarek!)
- 3 Jî xunçên buxçeya wê gulizarê
Jî her xunçe dî dîl da maye xarek
- 4 Lî textê dîlberê rûnê bî şahî
Lî te şahî mubarek bî mubarek

8. EŞBAH: Zincîr.

9. MUSEMMA: *Tîştê ku nav lê tê danîn. KESRET: Pur. ESMA: Nav. ZEYD Û 'EMR: Du navên xeyalîne dî "serfû Nehv" a erebî de. DUNÎN E: Xwedest in.*

2. ELA: *Haydar be! ŞEMS-UL MELAHET: Roja geş a belavbûyî. QED: Bêguman. TUŞAREK: Beşdarbûn, Ortaxî.*

- 5 Jı didarê mûrada mın bıbexşı
Murada mın jı te didar e carek
- 6 Dı dıl dani û disa dıl dısoji
(E tehrıq ya melik-el husni darek?)
- 7 'Îzarê ger lı mın di tu, lı dıl de!
(Li enn-el qelbe qed yehwa 'izarek)
- 8 Te cergê mın jı dıl kır pare pare
(Fe carek ya bedi-'el husni carek)
- 9 Were xanım bıkuj bıste bıxencer!
"Melê", emma bı destê xwey mubarek.
- 10 Lı tayê 'er' 'erê mestane nazık
Jı lewnê 'enberê mexmûri barek
- 11 Dıbêjım da bı halê mın bızani
Jı ber hubba te bêhal ım bı carek

-
6. *ETEHRİQ: Gelê tu yê bışewitini? DAREK: Xaniyê te. (Lı gor beytê: Xaniyê xwe).*
 7. *Lİ: Jı bo. ENNE: Bêguman. YEHWA: Aşıq e. İZAR-İZAREK: 1) Tır. 2) Gulançk. 3) Rûmet. 4) Lome.*
 8. *FE CAREK: Te zordesti kır. BEDİ: Taze, delal, spehi.*
 9. *BISTE: Bêtirs.*
 - 10-11. *Ev herdu beyt, lı ser gotına Sadıq Behaüddinê Amêdi, bı tenê dı du çapên Diwanê yên destnûisar de hebûne.*

"AHÎ JI BİSKA TE"

- 1 Nazıkek mın seherê dî, bî cemala xwe, ne wek
Hor û wildan û peri bû, ne beşer bû, ne melek
- 2 Wer tamaşayê şehidên xwe ke, carek tu binê:
(Ehsenellahû tebarek) jî du çêhvên dî belek
- 3 Sunbulên ter lî gulên pa lê bî mesti dîderin
Sosinên taze lî nesrin-wereqan bûne helek
- 4 Nazıka mın ku bî mesti dî çemen hati xeram
Jî hesed çûne xusûfê meh û mîhrê dî felek
- 5 Ê jî xeflet te bîbînî ku dîmînî heyhat!
Te bî çêhvên dî belek kuştîne mezlûmî gelek!
- 6 Zerreyek îşqê gehe kê û jî 'eqlê xwe nebır!
(Kullu men sade fe hû dahiyet-ul 'îşqî helek)
- 7 Xusruwê îşqê ku rûniştî lî ser textê wucûd
(Feteh-el qelbe 'elel fewri we lir-rûhi melek)

6. KULLU MEN: Her kesê. SADEFÊ HÛ: Laqê wî hat. DAHÎ: Bela.
HELEK: Ço hîlakê.

7. FETEHE: Fetih kir. 'ELEL FEWRÎ: Bî lîz.

- 8 Weh çı 'ışq û çı selamet herdu dûr m ji yeki
(Kullu men yesluku hubben, subulen-nari selek)
- 9 Ahê bêgavi ji dıl tên me ji pêta dı ceger
Bes tu bê feyde nesihet ke, me dıl bûye pelek
- 10 Ma ji 'umrê me çı mabıt were êdi vı me ra!
Da dı eqtarê wucûdê bıkırın seyrê melek
- 11 Dı s'tiwaê ku ji husna te veda lamı'ekê
(Nezeruş-şemsi mineş-şerqi ilel xerbi delek)
- 12 Afitaba ku ne teswirê ji husna te bitın!
(Nûru ha fi nezeri zulmetu dacin we helek)
- 13 Jı hewa bend te kırım şubhetê bayê dı sıvık
Çı ji bıska te bibêm? ahı ji bıska te çeklek
- 14 Ez ji zulfa te verıstım, mı teleb kır lebı le'l
Lê dı çaha zeqenê, bê ser û pa çûme helek
- 15 Bı umida te humayê, ne, "Melê" tûrı veda
Wer temaşayê cihan bûye hemi tûr û şebek.

-
8. YESLUKU: Lırê dıçe. SUBULEN-NARÎ: Riya êgr. SALEK: Dıçe.
 11. NEZER: Nihêrtın. ŞEMS: Roj, tav. MÎNEŞ-ŞERQÎ: Jı rojhilat. İLEL XERBÎ: Heta rojava. DELEK: Çû ava.
 12. NÛRÛ HA: Nura wê. FÎ HESENÎ: Lı ber çavê min. ZULMET: Tarifi. DAC: Şevatari. HELEK: Şeveres.
 13. ÇELEK: Sergopal.
 14. ZEQEN: Erçen, çene.
 15. ŞEBEK: Faq, dahf.

"CEGER ŞUBHETÊ BARÛT E"

- 1 Ku îşaret bî bîşaret bîdırît nexmeê çeng
Jî rûwê ayineê dîl bîretîn perdeê zeng
- 2 Fehnu raz er bîkîrî wer bîbehi mujdeê saz
Çengî bêperde dîbêjît ne ney û nayê bîdeng
- 3 Weh ku bê şahîd û mehbûbî te 'umrê xwe buwar
Karekî rabe bîke weqt e ku êvar e dereng
- 4 Berê meqsûdê jî tûbayê negerin me'lûm e
Me jî destê xwe yê kotah û jî payê xwe yê leng
- 5 Dîlê yarê me ne bû nermî bî sed abî gîrî!
Eserê dê çî bîkît abî bî sed qetre lî seng?
- 6 Sine geh têt ku bî ker bît ew jî derba muhbetê
Me ceger şubhetê barût e û dîl maye pereng
- 7 Bî çî rengî me dî dîl xef bîbîtîn gewherê îşq?
Aşîqan muhbet û muhra zeriyan kîfş e jî reng!
- 8 Kîfş e mecmu-ê perişaniyê halê me dî dîl
Jî serê zulfa perişan û jî bîska te ye şeng

1. BÎŞARET: Mîzgîni.

4. KOTAH: Îşâ kotibûn (şel). LENG: Qop.

- 9 Ne tenê gezme dıbarın mē, jı qewsê du hilal
Me jı mujganê siyeh têne ceger tir û xedeng
- 10 Mıslê wi qewsê hilali ku du nûnê reyhani
Ki nişandane jı Şiraz û ki anine jı Yeng?
- 11 Her lı dora Hecer-eswed Hebeşan çerx û tewaf
Tên wuqûfa 'Erefatê bı sema Nûbi û Zeng
- 12 Sef bı sef Turk û Moxul duguş û Hındi dı kemin
Bı 'eceb hatine cengê Hebeş û Rom û Fıreng
- 13 Mir û kırmancê lı holan qederê ki westane
Lê dı nivê bı sef û tipê 'Ereb hatine ceng
- 14 Jı guher xunçe ku şayi dıgırıt durcê 'eqıq
Bı şeker xende zenı ger bıgırıt şekerê teng
- 15 Were bê perde "Mela" vê xezelê bine meqam
Her dema bêne sema def bı def û çengı bı çeng

12. DUGUŞ: Şer.

14. "KU ŞAYI" lı gor nusxeyekê "Kuşayı": Kışandın, hılkişiyayı.
TENG: Bar. Teng, tengayı. DURC: Qutiya xışra. XEND: Ken. ZENİ:
Jin. Lédan. Birin. Barin. XENDEZENİ: Keniya. (Kenê bı qehqehe)

"DUJMIN RÊ NADE!"

- 1 Ger bîdiya ew senema sur-cemil
Nazîlê erdan ne dibû Cebrail
- 2 Mîn nezerek husn û cemala te kır
Ayineyek di mî jî nûra celil
- 3 Lew jî lebê le'lê te cam bû xecil
Badeyê enguri kuca selsebil
- 4 Dil, me hezar in te dî bendê, we lê
(Leyse lena 'enke mecalu bedil)
- 5 (Ma ena wehdi bike min mu xremîn)
Kem leke qebli şexefen min qetil)
- 6 Daruwê derdê mî tu yî canê mîn
(Hel bi siw-el wesli şîfa-ul 'elil?)
- 7 Sebr û sukûn çûne me nêv Dicle da
Lew jî du çeşman me dîzêt abî Nil

-
3. XECIL: Şermîkar. ENGÛR: Tîrî. SELSEBİL: Navê kaniyeka bîhîştê.
 4. LEYSE: Tunc. LENA: Jî me ra. 'ENKE: Jî te. MECAL: Mecal, firset. BEDIL: Şeref, rûmet.
 5. MA: Ne. ENA: Ez. Wehdi: Bî tenê. BÎKE:Bî te. BÎN: Jî. MUXREM: Êsirê evîn. KEM: Çiqas. LEKE: Jî te ra. QEBLÎ: Berî min. ŞEXEF: Nexweşîna dîl. QETÎL: Kuştî.
 6. DARUW: Derman. HEL: Qey. SÎWE: Bîlî. WESL: Gîhaştîn. 'ELÎL: Nexweşî.

- 8 Bes ne mı sed çeşme jı çeşman dızêt
(Mezce demin dem'u 'uyûni yesil)
- 9 Pur me nezer da te jı ser ta qedem
(Qed rece'et-terfu we 'eqli kelil)
- 10 Mıslê te ma bûne, weya ma dıbın?
Roj ku tecella ye! çı hacet delil?
- 11 (Qed seleber-rûhe 'ela xefletin
Îz hecem-el qelbe bî terfi kehil)
- 12 Gerçi lı ber derb û cefan fıli bûm
Bê mefer ez matı kırım şah û fil.
- 13 Can dıdırım, guftı bı yek bûse deh
Lê bıbıtın le'lê şekerxa kefil
- 14 Gerçi dı nêv helqeyê şêran ım ez!
(Leyse 'eleya li 'idana sebil!)
- 15 Zorı "Mela" fıřetê ebter kırım
(Înne mines-sa'eti yewmer-rehil!)

8. MEZC: Têkılı. DEM: Xwin. DEM': Stêrk. 'UYÛNÎ: Çavên min YE-SİL: Dîherike.

9. QED: Mîheqeq. RECE'E: Vegeriyaye. TERF: Çav. KELİL: Jar û wes-ta.

11. SELB: Kaşkırın. 'ELQ: Lı ser. Bı. ÎZ: Gava. HECM: Êriş. KAHİL: Kıl.

14. LEYSE: Kaşkırın. 'ELQ: Lı ser me. LÎ: Ji. 'İDANA: Dujmînên me. SEBİL: Rê û dırb.

15. İNNE: Bê şık. BÎN: Ji. SA'ET: Qiyamet. YEWM: Roj. RAHİL: Koç.

"LEW, ME JI HEV DIKIN!"

- 1 Şahîdê qudsî nişan husn e jî remza ezel
Da me bî destê surî camê meya lem yezel
- 2 Mey ku biçît saxerê dî destê wê dilberê
Sondî bî Xalîq dîxwum roj e dî burca hemel
- 3 Dêmê dî camê me dî, sur medamê me dî
Lew me jî mey xaneyê girtîye ber der mezel
- 4 Her jî kevanê bîweş, qebde zerê goşe reş
Gezme bî cuht têne dîl, kes dîmîrît bê ecel?
- 5 Husn û sura sûretê, kes dîdîrît qudretê?
Lew dî eslî dûr e jê, te'neyê (lemma efel)
- 6 Zorbe weh têtî 'Ereb, Têkî çevandî qeseb
Qencî bî çehvan me dî, ceng û cidala cemel
- 7 Şîr û rîman vêkîran, pence bîrî têkîran
Lew me dîkî jêkîran, qîme dîkî dîl dîgel

-
2. SAXER: Peyale, qedeh.
"Dî destê wê dilberê": Dî çapek de "Hêj dî destê dilberê" ye.
 3. MEDAM: Bade, Daimî, tîmî.
 4. BIWEŞ: Bîweşîn.
 5. (LEMMA EFEL): Dema ava bû.
 6. QESEB: Rî. Qamiş. CÎDAL: Herb, şer. CEMEL: Deve.
 7. JÊKIRAN: Jî hev û dinê.

- 8 Nazik û qenca şepal, dıl vegerinî mehal
Lê ji me dê dıl bîbî, dıl bî me dît muhtemel
- 9 Neyşeker û dêm-dûrê, da me bî destê surê
Cam û qedeh şubhê av, lew me rewan tên xezel
- 10 Gerçi di çehvên (ena), alem "Mela" kîr fena
(Dûne fena babikum, innehû 'ebdun eqel)

DENGÊ TÎPA (J : L)

"WEHYA NEYÊ"

- 1 Îro ji remza dêm-dûrê
Mînet ku mîn mesrûr e dıl
Dilber bî fîncana surê
Mey da me û mexmûr e dıl
- 2 Remzek nûnîn avêhte dıl
Mîhrê ji batî mîhte dıl
Şehzadeyê sur rêhte dıl
Şehkaseya ferfûr e dıl

10. (ENA): Ez. DÛNE: Jî bîl. BABIKUM: Deriyê we. INNEHÛ: Bêguman ew. 'EBD: Kole. EQEL: Kêmtirîn.

1. MENSUR: Şad, kêfxweş. MEXMÛR: Mest, xewgêj.

2. FERFÛR: Kasa Çini.

- 3 Hostayê 'îşqê dîl hevot
Ser ta qedem hîngî dîsot
Remza (Enel heq) her dîgot
Bawer bîkîn mensur e dîl
- 4 Dîl lê bîdît nûra meyê
Weqtê sewaş û heyheyê
Fehm er bîkît wehya neyê
Jê dît xeber me'mûr e dîl.
- 5 Nûra jî qudret lê du nûn
Jêra dînalîn erxenûn
Wer ayeta 'îşqê bîxwûn
Xweş nusxeyek mestûr e dîl
- 6 Tefsîrê sırra ayetê
Arîf dîvê tîn guh de tê
Raza rîmûzên qudretê
Ger deyn bîkît me'zûr e dîl
- 7 Dîl ke'be ye mewla ye lê
Narê Kelîm îsa ye lê
Bangê (Enel-lah) daye lê
Hem Ke'be û hem Tûr e dîl

3. *HEVOT*: Qewartîn, fêrkîrîn, hînkîrîn. *MENSÛR*: Mensûr Hellacê ku dî dema cezba evînê de dîgot : "Ez xwedê me".
(Enel heq): Ez xwedê me.

5. *ERXENÛN*: Dengê xweş. Navê sazêki ye. (Bî tirkî: org e.)

7. *NARÊ KELÎM*: Agrê Mûsa Pêxember. *ÎSA*: Çîrist.

- 8 Sed cû û sed cûbar e tê
Sed gulşen û gulzar e tê
Çendan ji 'îşqê nar e tê
Safi nezer di nûr e dîl
- 9 Suhbet ku kamîl bû bî ri
Carek bî cayê 'enberi
Qelbê bî avê mecmeri
Xweş 'enber û kafûr e dîl
- 10 Şox û şepala leb jî qend
Ew nazîka wê qenc û rend
Wê dîl, jî dîl, dîl da û xwend
Îro yeqîn fexfûr e dîl
- 11 Er dîl jî te mesrûr bîtin
Mîn jî "Melê" destûr bîtin
Dê kîr cihan pur nûr bîtin
Lê daima rencûr e dîl

8. CÛBAR: Çemê mezin.

9. MECMER: Mênqera agir. Koziya agir. KAFÛR: Şîrê darek c, li Japon û Çîn û Endonezyayê çê dibe, bîhna wê pûr xweş e û jî bo serêşê bîkar tinin.

10. FEXFÛR: Qiraleki Çîn e.

11. RENCÛR: Nexwes. Tengayi. Keder. Bî derd.

"TU 'EBD Î..!?"

- 1 Şerbeta "L"am û "B"êyan, ez bî heyatê nadim
Badeya le'lê, bî ava zulûmatê nadim
- 2 Hor û wildan û peri cumle cema bîn iro
Mûyekî pê jî xetê wê but û latê nadim
- 3 Ger bîdî dest, tewafa pê yû destan bîgîrîm
Wê mecalê bî wuqûfa 'Erefatê nadim
- 4 Ez û yar ger şevêkê herdu hem axûş bîbîn
"Leylet-ul qedr"e me ew şev bî "Berat"ê nadim
- 5 Canê şêrin ku jî yar ra, bî Xudan ez dîkrîm
Ne bî yarê xwe, dî weqtê sekeratê nadim
- 6 Şerbeta zehrî-helahlî ku hebîbê me b'dest
Bî gulab û şeker û qend û nebatê nadim
- 7 Ne b'qanûn ku îşaret bî şifaê bîkîrît
Ez hilakê xwe dî 'îşqê bî necatê nadim
- 8 Telbe kîr weslê j'dîlber me bî 'inwanî zekat
Go: Tu 'ebd î û bî 'ebdê xwe zekatê nadim

4. AXUŞ: *Hembêzkirin.*

- 9 Wê bî peykê bıkırın matî reqîbî disa
Bî rex û fil û feres, ez şeh û matê nadım
- 10 Dî semaya seherê, destî bî kes di, iro
Xeyrî şêrin qed û mewzûn herekatê, nadım
- 11 Hate destê me, dî reqsê, û dîgo: bî j' "Melê"
Dest bî kes di dî semaya ku "Mela" tê nadım

DENGÊ TÎPA (P : M)

"HÊSÎRÊ QELBAN"

- 1 'Îd e û da alemê bangî sefayê xas û am
Mahî new ebrû numandın çû jî ber 'ewr û xemain
- 2 Xweş bî dor camê îşaret kır, hilalê saqiyan
Mahitabên zuhre-sima, çarî deh salî temam
- 3 Name tey kır rozeyê 'îdê vekır fesla meyê
Lê bî zım zım tên bî awazê neyê fincan û cam
- 4 Şahîdên gulrengê saqî belkî nesrin ın beşer
Ê dî lebsê erxewani nêrgîzên 'er-'er xeram
- 5 Ya Reb ew rûh ın mucessem, yan misalê rûh ın ew
Lew bî sır caman dî bexşın nazîkên şêrin kelim.

3. *TEY: Pê çan, tewandın.*

- 6 Ew çî ali gewher in hatin libasê cîsm û can?
'Işweyên wan şubhê îksirî dî qelban in meqam!
- 7 Wek "Mele" gavek tenê xaîb jî didarê nebîm!
Wer bîbîm wê saetê lê bîn jî min da sed selam

DENGÊ TÎPA (ʔ : M)

"BERQ Û TÎRÊJ"

- 1 Daneyên 'enber lî nîsrinan reşandî xalî xam
Sosînen nazîk lî ser xalan çevandî dalî dam
- 2 Cebhet û dêmê jî qudret lê nîvisî herf û herf
Kakulan ta ta lî ser herfan kîşandî lam û lam
- 3 Leylet-ul qedr û berat in, zulf û cebhet subhê 'îd
Dêm weku fesla bîharê lê qiyamet qedd û qam
- 4 Ew perî weqtê dî sundus da, jî qundus bî xwuya
Bende dê şah û geda bî, Xusruwê şêrin kelam
- 5 Her kesê carek diye, ew zinde ma hetta ebed
Ê neditî ew perî rû, zîndegî lê bî heram
- 6 Her kesê camê jî destê wê bînoşî, noşî bî
Ê jî wî destî ne noşî, zehri bî lê ew medam

4. *SUNDUS: Qumaşê hevrişim ê avzêrkirî. QUNDUS: Taristan.*

- 7 Wan dî reqsê da ku dim, awur peyapey dane min
Berq û tirêjan lî dîl dan, cezbeya 'îşqê revam
- 8 'Umre ke, dûr bûm jî canan, ketme benda firqetê
Nagihan perde hilani, go: "Melayê m esselam"!

DENGÊ TIPÂ (٧ : N)

"STÊRA KARWANKUJ"

- 1 Ya Rebb in guldestei ya nergîsî re'nastî in
Serwî gulşen ya elif ya qameti yektastî in
- 2 În melek ya şahîdî qudsistî ya mahî felek
Horiya rûh-îl qudus ya nûrî çeşmî mastî in
- 3 Kewkebî subhestî ya xurşîdî ya durrî yetim
Ya tenî şîmîn berast ya gewherî walastî in
- 4 Arîdest in ya şua'î şemîsî ya bedrî munîr
Lale ya nîsrîn û gul ya badeî xemrastî in
- 5 Sunbulî ter ya binefş, ya sosîn û gulçiçek û
Zulfî ya muşkî Xeten, ya suretî tuxrastî in
- 6 Xemze in ya gezme in ya tîrî ya sîhrî helal
Sahîrî in ya çeşmî şox Turkî bêperwastî in
- 7 Mîmî ya yaqûtî ya serçeşmê abî heyat
Huqqê durdaneî ya le'î şekker xastî in

- 8 Xetti ya qewsi du nûn mektûb zı muşkı ez ferand
Ya hilal-ul 'idi ya ebrûwı bê hemtastı in
- 9 Koyi ew ya Ke'beya beyt-ul muqeddes ya bîhişt
Xulde ya Firdewsi in ya cennet-ul me'wastı in
- 10 Hatıfı xeybesti in ya tercumanı rûhı quds
Bulbulı şeydasti der gulzarı ya "mella" stı in

DENGÊ TÎPA (٥ : N)

"DERB IN LI CANÊ ME"

- 1 Remzên te dı canan ne bî endaze dirazın
Her yek bî hezar rîşewanê me dıxwazın
- 2 Wan derb e lı canê me ki berq û birûskan
Tirê te dı canan, ne tinê sine gudaz in
- 3 Cana jı cefaya te û zulmê çı xeber dın?
Ku tirê jı cewra te dı dıl da, me bî gaz in!
- 4 Perwane û bulbul bî dıl in, şu'leyê 'îşqê
Lê ger tu nezer dı, bixwe ew gulşen û raz in

1. *DIRAZ*: 1) *Dirêj*. 2) *Razan*. *ENDAZ*: *Avêtin, avêtkirox*.
2. *GUDAZ*: *Dewixandin, singtewên*.

- 5 Peyweste ji weslê, te dimênim ku seraser
Bîşkoj û tılısm û wereq û netrik û bazın
- 6 Subbûhi yû quddûsi yû horên dî bîhiştê
Peyweste şebî qedrê liqaya te dîxwazın
- 7 Sunbul bî sema tèn û gulan perde dîrandın
Bîşkiftine al al, û hîşin bûne terazın
- 8 Cûbar dî rewanın, çemenan terhê cuwan ın
Mestane bî ref ref, lî kınaran siy yû qaz ın
- 9 Her yek bî temaşagehê husna te ji her ca
Teşbihê nigaran bî cemala te dînazın
- 10 Tiran lî me dît dostî me tê sine hedef kır
Nazan lî me kîr yarê, me zari û niyaz ın
- 11 Mihrabî du ebrû ku ji bala ve xuya bîn
Der secdegehê 'îşqê niyazê me nemaz ın
- 12 Ger husn û mehebbet bîsera perdeyê can bîn
Geh şah û geda, geh bîxweh Mehmûd û Eyaz ın
- 13 Ev hor û periçehre but û latê cemalê
Der sûretê tehqîqê "Mela" 'eyni mecaz ın

5. *DIMÊNIM: Mîz dîdîm.*
7. *TERAZIN: Mêrg û çîmen.*

"SED BÛSE MANE DEYN"

- 1 - Mela, me l'gerdena dilber, jî nû sed bûse mayîn deyn
Mecalê dê bixwazim jê, dîbê deynê te (fewqel 'eyn)
- 2 Bî remza qabê qewseyî, jî wan bîrhan xeberdar in
(Fe atil qewse bari ha, ela ya ramiyel qewseyî)
- 3 Jî sırra la mekan wacîb, tenezzul kîr dî imkanê
(Fe eyne 'ilmu eyne 'eyn, we eyne eynu iz la 'eyn)
- 4 Jî mabeyna du ebrûyan, peyapey berqê lamî tèn
Bî 'eynî ger bîbî safe, çî nûrek sır e ew mabeyn
- 5 Bî destûra te da, wî jî jî vê navê verêkîm ez
(Fe seffil 'eyne nûr-el eyne, ela ya zeyne kulliz-zeyn)
- 6 Buhayê îşweyek le'lan, me yekser "ma melek" bexşî
Dîl û can jî lî ser danî, we zalîm hêj dîbêjî, deyn
- 7 "Mela" her wî bîbîn her wî, eger her wî dînasi tu!
(Hûw-el me'bûd, hûw-el meşhûd, bel la xeyre fid-darey)

-
1. (FEWQ-EL EYN): Lî ser çavan.
 2. ATÎ: Bîde. QEWS: Kevan. BARÎ HA: Hunermendê wê. RAMÎ:
Tiravêj.
 - 3- EYNE: Lî ku. EYNU: 1) Westa. 2) Zeman. 3) Mar. 4) Zîlam.
 4. 'EYNÎ: Çavên min.
 5. ZEYN: Muzeyyen. KULL: Bî tevayî.
 6. "MA MELEK": 1) Milk û mal. 2) Herçî tîştê ku hebû.

"BÊKES Û DERMANDE ME"

- 1 Mın dı ber "qal û bela" batın vı wê ra bû evin
Hêj lı ser 'ehda "elest"ım, ta bı roja axirin
Mın dıvê lê eşkera kım, carekê daxa nıhın
Guftem ew ra ma duagoyı tu em ey hori'eyn
(E'redet 'enni we qalet: ma dua-ul kafirin!)
- 2 Ey şehê ali cenab, pur acız û perkende em
Ah jı dest cewra evinê, çı b'kırım mın bende em
Sebr û taqet mın neman, lê bêkes û dermande em
Ger bixwani wer berani, bende em ta zinde em
(Wacibun li imtisal-ul emri maza te'murin)
- 3 Suhtım ez pêta evinê, têk buwam gırd û heba
(İnne li ayati sıdqın kane fı hazen-neba)
Horiya roja liqaê, nazıka mexmûr-qeba
(Hebbeza rewdat û necdın zurtûha 'ehdes-sıba)
(Rewdetun yecrı 'ela ercaı ha maun mein)

-
1. "GALÛ BELA": Gotın erê! E'REDET 'ENNI: Rû jı mın vege-
rand. QALET: Ewê got. MA DUA-UL KAFİRÎN: Daxwaza kafıran
çı ye?
 2. İMTİSAL-UL EMRÎ: Ber fermanê. MAZA TE'MURÎN: Çı ferman
kî.
 3. GIRD Û HEBE: Toz û 'ecac. AYATI SİDQÎN: Nişanên rastiye.
KANE: Bû. FÎ HAZEN-NEBA: Dıvê xeberê de. QEBA: Kefî,
keunîk, egal. HEBBEZA: Çı xweş bû. REWDATÛ NECDÎN: Çi-
menên gıra. ZURTUHA: Mın ditar kır. (Ziyaret). 'EHDES-SİBA:
Çaxê zarûktiyê. YECRÎ: Dıçe, dıherike.. 'ELA ERCAÎ HA: Lı
hawidorê wê. MAUN MEÎN: Avek rewan.

- 4 Mın lı ser bedrê mûnir, mektûb diye neqşê sewad
 Ser bı yek ani du nûnan, xettê reyhani du sad
 Hadırı mın secde bır, lew xerqê xwûnê bû fuad
 Ber derê baxê wisaleş, hatîfî awazi dad:
 (Hazi hi cennatu 'ednin fe-dxulû ha xalidin!)
- 5 Naêtın gohtın bı qal, şerh û beyana husnı tu
 Dê bı hal û sır bınasın dıl, fesana husnı tu
 Xweş "Mela" amancê tiran kır, kemana husnı tu
 Qısseê 'ışqa celal û dasitana husnı tu
 (Tilke enbaun yeqûlun-nasu minna be'de hin!)

DENGÊ TÎPA (Û : N)

"ŞÊR Û PILING"

- 1 Senemê ji qewsê ebrû, du hilalê new numandın
 Du keman lı burcê mizan bı xezeb lı mın kışandın
- 2 Ne du nûn qelem muqabil bı bedîi xet nivîsi
 Du hilalê destê qudret, bı qerani yek kışandın

-
4. MEKTÛB: Nivîsandî. HADÎRÎ: Dî ci de. FUAD: Dîl. HATÎF: Dengê xeybê. HAZÎHÎ CENNATU 'EDNÎN: Ev bı hîştâ cigra ye. FE-DXULÛ HA XALÎDÎN: Têkevînê, heta bı hetayê.
5. FESAN: Efsane. DASÎTAN: DESTAN: Serpêhati. TÎLKE ENBAUN: Ew deng û behs in. YEQÛLUN-NASU: Xelq dêbêje. MÎNNA: ji me. BÊ'DE HÎN: Pîştî zemanekî.

"TÎRÊN QEWSÊ MALZIRAV"

- 1 Îro ji husna dilberê
Disa lûlak û serxweş in
Remzên dî wê şêrinsurê
Sohtim bî pêta atêş in
- 2 Sohtim bî berqa lamî' e
Ew necm û bedra talî' e
Şemsa semayê rabî' e
Lew pur ji şewqê şewwîşin
- 3 Pur şewwîşandin wê dîl e
Zulfên siyah ser dan mîl e
Tûra mûxalîf sîlsîl e
Selwa 'eqarîb lê mesîn
- 4 Selwa 'eqarîb lê wetî
Ew nazîka nûrin-beden
Qendê dirêj in guft û ken
Bîskan dî lê kîr bawêşin
- 5 Bîska siyah re'na ye mest
Yek dî bî heyran pê ve best
Hemyan bî mesti helqe best
Derbendê ew zulfa rêş in

- 3 Çı beratê husn e ya Reb, bı nişanê padişahi?
Bı teref du turre tuxra weh bı mawerê reşandin
- 4 Elif û du lam û hê din me dı ayeta cemalê
Jı ceger me kır teselli û jı sine dest feşandin
- 5 Ne tenê jı qışt û zulfan, me dı sine sed kulab ın
Lı ceger siyeh kemanan du hezar tiri reşandin
- 6 Jı ceger "Mela" pilingan bı kulab û pensı ker kır
Esedan jı pence vêran dıl û sine herişandin

DENGÊ TÎPA (Ö : N)

"XEŞMÊ LI FEQİRAN MEKE"

- 1 Xeşmê lı feqiran meke zû padişehê mın
Pursê bıke carek lı xeta û gunehê mın
- 2 Teftêşê bı mû mû bıke er em bı xetain
Hınca neke bêtin tı welati tı cihê mın
- 3 Cewra te behitın û cefaya te peritın
Qurbanı te bım guh bıde carek gilehê mın

3. *TURRE: Nexş û nivisara lı ser morê. TUXRA: Mor, muhr.*

5. *GIŞT: Porê top lı ser serê qıza. KAKUL.*

6. *ESEDAN: Esed: Şêr.*

1. *XEŞİM: Zordesti, toriti.*

3. *BEHÎTIN: Behitand. PERÎTÎN: Peritand.*

- 4 Zani ku jî ber cewr û cefayan, elem in dîl
Rehmê bî gedaê xwe ke, sultan û şehê mîn
- 5 Sîh sal e, jî derd û jî belayê te hîlak in
Hetta bî felek her dîretin, ah û ehê mîn
- 6 Ma yek nefesek mîn dîbîtin sebr û qerarek
Qed bê te û bê te dîbîtin mîslê sîhê mîn?
- 7 Ger şubhetê perwane, dî bezmê te, çî sed ger?
Sed nale, hezar rengî, wekî çeng û jîhê mîn!
- 8 Nûrên qedeha xemr û heyata me bî ser dan
Ger wê bîdetin destî bî dest, muşterihê mîn
- 9 Yek 'îşwe "Mela"yî bî buha bête jî le'lan
Sed can me hebîn, hêj ku muqessîr dîbe hê mîn

7. *BEZIM: Cîwat.*

9. *BEHÊ: Bîhayê , nîrxê.*

"ÇIRA DÛRÎ KIRIN?"

- 1 Ez nîzanîm sebebê yarê çira dûrî kîrîn!
Şahê şêrîn dehenan em jî xweh mecbûrî kîrîn.
- 2 Mîslê goy, bê ser û pa, bûme lî ber derb û şekan
Lew bî çewkanê cefaya xweh jî dîl hûrî kîrîn
- 3 Da me sed camê fîraqê, jî xweh xaîb nebûyîn
Jî wîsalê qedehek da me, û mexmûrî kîrîn
- 4 Nûrê çeşmê me ku alem me bî çeşmên te dîdî
Bî cemala xweh te wek dîdeyê bê nûrî kîrîn
- 5 Nefesek bê te me naçî, nedîjin bê te demek
Jî te hat emrê humayûn, te weh me'mûrî kîrîn
- 6 Me dîzani ku tu dê "aqîbet-ul emr"î çî ki!
Lebê le'lê şekerin ahi ku mexrûrî kîrîn
- 7 Zerreyek bûm dî hewayaya te dî wêraneyekê
Mîslê rojê bî şîaa xweh te meşhûrî kîrîn
- 8 Jî "enel heq" bî lebên le'î xebêrdarî bûyîn
Bî gulaba serê zulfa xweh, te mensûrî kîrîn
- 9 Mûnserîf ma dîbûyîn em bî du sed "Carr"î "Mele"?
Lê bî wê "kesr" û "îdaf" ê ve xwe mecrûrî kîrîn!

- 6 Êsir kırım zulfa çelek
Ew horiya şubhet melek
Tir dan jî reştûzên helek
Mecrûhê qewsê purweşin
- 7 Tir dan jî qewsê malzîrav
Ew gewhera pur şewq û tav
Sotîn lî mûn cerg û hînav
Lew têk jî cergê herîşin
- 8 Cerg û cesed têk sohtine
Lew xef xedengan nuhtine
J'qewsê hilalî jîh tune
Heyranê dîma mehweş in
- 9 Hem bedr û hem zûhra ye dêm
J'wê alema kubra ye dêm
Xweş dest-xet û tuxra ye dêm
Herfan jî mîskê lê nîşin
- 10 Lewhê jî nû şîqal bîdîn
Her dem jî nû ve xal bîdîn
Da dîl bî yek dî pal bîdîn
Nuqtan jî zêra bê weşin
- 11 Zulfa şîyah 'enber bîke
Xemlê jî zêre zer bîke
Zerbafe û dîba ber bîke
Mîsk û gulavê lê reşin!

- 12 Mawer ke terh û bışkuwan
Ciranê berg û lu'luwan
Ew 'er'er û selwa cuwan
Şetri bı mesti lê xwuşin
- 13 Şetri û tayên sor û zer
Bayê nesim lê da seher
L'wê cebhetê hejyan du per
Lewra sukarê bê hış in.
- 14 Meşha seher yarê şefiq
Da mın bı enguştên 'eqiq
J'wê badeya nûrin-rehiq
Mexmûrê xemra bê xeş in
- 15 Mexmûrê wê camê ez ım
Yexmakırê ramê ez ım
Çavnêrê peyxamê ez ım
Perwaneyê şem'a geş in.
- 16 Perwaneyên soti kebed
Dilber jı ber burca esed
Tir dan jı reştûzên semed
Lew têk jı xwûnê neqqışin
- 17 Kuştım bı qewsê 'enber e
Şoxê jı dıl mıl dan ber e
Ê xiste dıl sed pencere
Ev reng e em mihnet-keşin.

18 Mihnnet-keşın roz û şebê
Der firqeta şerınlebê
Zulma jı ber destê te bê
Ew edl e, em pur pê xweş ın!

19 Zulma tu ki, pur pê xweş ım
Sohti dilê hicran-keşım
Mislê perengê ateş ım
Rûhek mûcerred bê leş ın

20 Mın di sehrgaha elest
Camek jı kewser dost dı dest
Jê da "Melê", lew maye mest
Hetta heyatê serxweş ın.

DENGÊ TÎPA (٠ : N)

"RAST Û ÇEP BEZÎ"

- 1 Were canım ku çı nazık weres ın
Jı gul û nesterinan em te bes ın
- 2 Tu şehinşah i besi mın jı butan
Ne muhıb her ne kes û xar û xes ın
- 3 Jı xwe xanım ve dê naki me bı têx
Tu nebati û lı teb'ê meqes ın

1. WERFES: Navê kulilkeke sor e, ku jê boyax çêdibe.
2. XES: Xar, dîrî.

- 4 Her şevem ne're zenan ta bı seher
Bı segê koyê tu ra hem nefes ın
- 5 Bê tu, billah nebûyin yek nefesek
Me tu yi rûh, û mucerred qefes ın
- 6 Cezbe dıl ra dı hejînt jı me, lew
Dı şevan nale, jı rengê ceres ın
- 7 Me jı zulfên dı butan reştır e bext;
Seheran têtê peri, pê nehısın.
- 8 Were mey xaneyê şahıd peresan!
Şem'ê te ger nebitın em çı kes ın?
- 9 Me jı narê diye nûra te dı dıl
Lew jı 'ışqa te her ateşperes ın
- 10 'Eyni 'ışq ın û dı dıl ateşê Tûr
Jı sena berqê cemalê qebes ın
- 11 Te divê dawî biri bît? nıhe da
Bıbırım ser bı du enguşt meqes ın!
- 12 Gerçi yekser lı rexên filı sıfet
Rast û çep bazi lı seyrê feres ın
- 13 Bı meyê safi bıdın xerqeyê zerq
Bı xerabatê muxan er bıresın!

5. MÛCERRED: *Bes Tek. Nenêrbır. Ezep. Tazi.*

13. ZERQ: *Hêşın, şın. BİRESİN: Bıgijın. Bırêsin.*

14 Em qedim bade dinoşın jı tuhûr
Lew, mûqim mest û xumar û teles ın

15 Me şevan cam dı kef, û yarı dı ber
Hey hey û suhbet û mêrê 'eses ın

16 Me sera perdeyê horan e meqam
Jı siya zulfê butan er veris ın

17 Qelbi e'e'yan dıkırıt hub û wucûd
'İşqı ıksir e, we em sim û mes ın

18 Mulhımê xeybê weh imla dıkırıt
Meded û feyzı jı rûhıl qudus ın

19 Cewherê ali ye 'unsur me "Mela"
Bil heqiqet ne jı xwar Estuqus ın

DENGÊ TÎPA (Û : N)

"DİL Ü HESTİ HERİŞANDIN"

1 Peyweste du ebrû lı me mehbûbê kışandın
Sed gezme peyapey lı ezê xeste reşandın

15. *MÊRÊ 'ESES*: Mêrê taritiyê (Şevgêr)

16. *VERIS*: Rızgar, Azad.

17. *IKSİR*: Jehri. *SÎM*: Ziv.

18. *MULHİM*: Yê ku ilhamê dıde.

19. *ESTUQUS*: Pisporeki Yewnan

- 2 Tirek ji kemanê xezebê, da cegerê riş
Mîl dane ber û ser, ji du goşan vewేశandin
- 3 Cohtê esedan, pence lî ser sine nîhandin
Kullabê gîhandin dîl, û hestî herîşandin
- 4 Burhên te ji qudret ku numan goşeyê i'caz
Peywest e kemanan lî guhan goşe kîşandin
- 5 Mihra te dî canê xwe, ji dîl xef kîrîbû min
Dîl çû, ceger û sine lî ser canê veşandin
- 6 Nûnên te hilalî bî qeran yek ji sura heq
Bê 'eybî lî dêmê qelemî xeybê kîşandin
- 7 Neqqaşî ezel ismê cemalê ku nîvîsî
Herfên te mucessem ji surê taze reşandin
- 8 Reyhani yû diwani yû hem suls û muselsel
Yek yek weh hezar rengî ji husnê neqîşandin
- 9 Ev ayetê nûrê ji "Mela" ra ku nîvîsî
Katîb ji surê nuqte bî zêrabê feşandin.

"KUŞTIME NAKIT YEQÎNÊ"

- 1 Şox û şengê zuhre-rengê
Dîl jî min bîr dîl jî min
Awurên heybetpîlîngê
Dîl jî min bîr dîl jî min
- 2 Wê şepalê mîskî xalê
Dêm-durê gerdenşemalê
Cebheta bîskan sema lê
Dîl jî min bîr dîl jî min
- 3 Zulf û xalan nûn û dalan
Wan jî min dîl bîr bîtalên
Goşê qewsê hilalan
Dîl jî min bîr dîl jî min
- 4 Dêm-nedîrê bo bîrê
Xemrî yû ges û neîrê
Sine kîr amancê tirê
Dîl jî min bîr dîl jî min

4. *NEDÎR*: Agirê serê çiya, jî bo agahdariyê. *EBÎR*: Pêhusandin, bihna xweş.

- 5 Sur-şêrinê nazeninê
 Kuştım û nakıt yeqinê
 Wê bî çengala evinê
 Dıl jî mın bır dıl jî mın
- 6 Fetl û taban da xuraban
 Ebleq û cuhtê şebaban
 Dame ber pence w kulaban
 Dıl jî mın bır dıl jî mın
- 7 Xwoş xeramê ez xulamê
 Nazikê şêrin-kelamê
 Tûtiya eywan meqamê
 Dıl jî mın bır dıl jî mın
- 8 Mahırûyê mısکی bûyê
 Sur-pilingê şêrixwûyê
 Wê bî zulfa şubhê goyê
 Dıl jî mın bır dıl jî mın
- 9 Herdu weşman naz û xeşman
 Kê jî ber wan 'eqî û hış man?
 Sa'eta mın di bî çeşman
 Dıl jî mın bır dıl jî mın
- 10 Mahıtabê, afitabê
 Dêm jî roj û şeb niqabê
 Xweş bî çengal û kulabê
 Dıl jî mın bır dıl jî mın

6 EBLEQ: Reş û sıpi. Mermer. Lehi. Ehmeq.

9 "WEŞMAN": Dı çapek dın da "Çeşman"e.
 WEŞIM: Xal-nişan.

- 11 Serwinazê serfîrazê
Şubhê zêr remza mecazê
Dame ber çakûç û gazê
Dîl jî mîn bîr dîl jî mîn
- 12 Bejn û bala tox û ala
Mîn kîrîn vêk ra mîtala
Çiçekî terhîni wala
Dîl jî mîn bîr dîl jî mîn
- 13 Mêrê xazî şîrê tazi
Vêkîran mîn dî bî bazi
Kîr lî mî j'xeflet ve gazi
Dîl jî mîn bîr dîl jî mîn
- 14 Şîr û xîştî n, zulf û qîştî n
Hîn veşarî n hîn vehîştî n
Pehlewana n dest vemîştî n
Dîl jî mîn bîr dîl jî mîn
- 15 Rohniya çehvên "Mela"yê
Ew tecellaya te dayê
Ya jî Ehmed dîl revayê
Dîl jî mîn bîr dîl jî mîn

12. WALA: Bîlînd.

14. VEŞAR: Veşartî n.

"DURRÊ NASUFTE NEFROŞIN"

- 1 Jı remza dilberê disa
Lı mın batın vejın derd e
Dı lebsê tariyê mın di
Xwûya bû ew siyah-çerd e
- 2 Dı lebsê tari yû nûrê
Perirengê sifet-horê
Jı wadi eymena Tûrê
Mûqeddes kır lı mın 'erd e
- 3 Jı nar û nûrê teqdisê
Tecella kır lı mın disê
Lı ser textê xwe Belqisê
Hılanin bê hicab perde
- 4 Hicab û perde avêhtın
Seba, reyhan hılavêhtın
Jı burcan tırî pur rêhtın
Gıhan mın rast û çep cerd e

1. SIYAP-ÇERD: Rengê genım, reşesmer. ÇERD: Çehre.
4. CERD: Tır. Rêgir. Crid.

- 5 Kırım amancê mızrağan
Dı dıl da tiri çûn fağan
Bı celladê xwe ew xağan
Dibêjît: hej tu xencer de
- 6 Bı derbên xenceran kuştın
Bı xwûna sohrî lê muştın
Dı çina sunbulên qışt ın
Me dıl pur musk û mawer de
- 7 Gulên her mîskê ezfer lê
'Ebir û 'enberê ter lê
Semaya sosınan her lê
Bı zulfan hem tu mawer de
- 8 Bı ser wi sunbulên tari
Bı hev ra bazi yû yari
Bı cû. da xwûn bıbît cari
Jı qewsan gezmeyan berde
- 9 Ez ım amancê wan tıran
Jı peykanan û sertıran
Bûyım polad lı ber şıran
Seraser têki mam ber de
- 10 Ku dilber hate vê yolê
Jı ber pur hın ketın çolê
Jı qencan ku revand holê
Jı mehbûban bırın nerd e

6. *MIŞTIN*: Gevızandın, têwerkırın.

10. *NERD*: Tewle. (Cureyekî leyzê ye).

- 11 Jı qedd û bejn û balayê
 Jı rengê dêm û simayê
 Tu rengi qet xeber nayê
 Dı husnê cewherek ferd e
- 12 Bı xeml û reng û re'nayê
 Bı mehbûbê bı zibayê
 Bı ew husna Xudê dayê
 Jı gulrengan gulazerd e
- 13 Nebat û şekkera lêvê
 Nesimê wê gul û sêvê
 Hilinî perdeya şêvê
 Şifaya hindeki derd e
- 14 Jı neqş û sun'ê cebbari
 Muterra turreya tari
 Lı nûrê mîskê Tatari
 Lı ser wan xemriyan berde
- 15 Lı ber rojê bı xêli
 Bînêrım qameçeli
 Qedif û zerkeşe teli
 Zubad û mîsk û 'enber de
- 16 Bı simavê bı zêravê
 Tu, rojê neqşeki bavê
 Ku da erjeng jı wê navê
 Lı ber rojê nebit perde

16. *ERJENG: Wêne. Asteng.*

- 17 Eger berqek jî wê rojê
 Jî ber wê 'îqd û bîşkojê
 Bîdît qelbê wekî dojê
 Lî ber dojah dîbît berd e
- 18 Dî meydanê şêrin xencan
 Bî çexên mîslê şetrencan
 Turaba ber piyê qencan
 Zubad û 'enberên gerd e
- 19 Dîbît bêjin wi sultani
 Bî heft ayatê Furqani
 Lî mehbuban tu xaqan î
 Were derbê lî Qeyser de
- 20 "Mela" zanîm jî meczûban
 Tînê naji tu bê xûban
 Dema dîl di bî mehbûban
 Bî şox û şeng û esmer de
- 21 Dema celladî bîn bazi
 Bî şîr û xencerên tazi
 Lî dergeh da neki gazi
 Delal û naz û perwer de
- 22 Emanet da jî bêhuşî
 Durên nasufte nefroşî
 "Mela" zanîm jî medhûşî
 Te dîl bê xwab û bê xwurd e

17. 'IQD: Gerden. BERD: Serma.

18. GERD: Toz. Ger. . Xem. Keder. Gerinek.

"QEY ROJ BI PERDÊ XEF DIBE?"

- 1 Dilberê serdarê xûban ez nîzam agah heye?
D'hebs û zindanê esir û girtiyê dermande ye!
- 2 Girtiyê maym dî hebsê, ki gelo mehder bîkî?
Carekê navê me bînit, pur sewabek zêde ye!
- 3 Mîhnet û halê esiran, ki lî miran erze kî?
Dê bitn pûrsê lî min, lew pur bî rehî û şefqê ye!
- 4 Ger bîpûrsî carekê xatûn lî halê suxteyî
Qûfl û zincir dê vebî, bê ism û dest û mîfte ye
- 5 Bend û zincir dê vebî, cerhên dî kul dê xweş bîkî
Lew ku navê dilberê dermanê derdê bende ye
- 6 Herçî bê vê rê, ku navê dilberê bitn, lî ser
Xweş dîbî hadîr dî gavê bê guman û şubhe ye
- 7 Bê guman xaka rîya wê, tûtiya û dane ye
Ger dî çêhvên kor ve ênî, xweş dîbî pê dîde ye
- 8 Meyitê sedsalê jî, wê, rê veber qebrê kevî
Dê veji, rûh bête ser sata xweh bitn zinde ye
- 9 Meyyitan lew radîkî, yekser dîlan yexma dîkî
Îsmê e'zê ma dîzanî, ya Mesîh ew bîxwe ye

- 10 Ez dîbêm: Îsa ye ew, ya Bu Eli Sina ye ew
Lew bî remz û 'îşweyan pur mu 'cizat û şîwe ye
- 11 Şîwe û remzên dî wê, teşbihê berqê lamî' in
Kohê qaf bit ker dîkî sata xuya bit perde ye
- 12 Perdeya mehbûb dî nêv qelban ku dê ker ker bîkî
Qet dî perdê xef dîbin xurşîd û mah û zuhre ye?
- 13 Zuhre û xurşîdî min ditin dî qewsê hem qeran
Surrê da dîl 'eqreban çerx û sema û heyhey e
- 14 'Eqreb û qews û qezeh vê ra, muqabîl muşteri
Roj û şêv û nûr û tirêj berq û hem ispide ye
- 15 Ew hemî vêkra mî dîn, têkîl dî çerxê carekê
Hê jî wan bêhal im ez ehwal û 'îşq û cezbe ye
- 16 Hal jî wê remzê gîha min, mestê wê remzê me hêj
Serxweş im hetta ebed, bê cam û neql û bade ye
- 17 Serxweş im bê cam û mey, remza nîhin ebter kîrîm
Nagîhan tir dane dîl, lew kuştî hadîr suxte ye
- 18 Kuştîyan xewn di liqaê, lew bî wê dê xweş bîbîm
Hêvîyan qet nabîrîm, meqsûd me didara te ye
- 19 Hêvîyan qet nabîrîm, carek tu bêyî şefqe kî
'Eqdê îhramê dê binîm, hadîrî bîm secde ye

14. MUŞTERÎ: Navê stêrekê ye.

16. NEQL: Meze-fêkiyê badexwîran.

- 20 Secdeya ber eswedan, nadım bı sed hec-ekberan
Sond bı wan zulfan û xalan, heç weki bêjım we ye
- 21 Sond bı wê zulfa siyah, ez abidê husna te me
Xef dınoşım vê şerabê, xweş şerab û qehwe ye
- 22 'Umrek e d'sojım bı xef, çehvnêrê yek pursek te me
Da beyan kım şerhê halê dıl, bı herf û nukte ye
- 23 Sed hezar bar şakır ım ez ku ji Belqisa peri
Hudhudê şêrinzeban iro xeberdarê me ye
- 24 İsm û navê tey şerif, hey kır lı mın qelbê mırî
Lew dı medhê te w senaê bûyime çeng û ney e
- 25 Şubhetê çengê dınalım, hêj ji dest daxa qedim
Herweki meş'el dısojım, dost nızam agah heye?
- 26 Mın divê ser l'asitanê, herweki tûlan nıhım
Belki carek keyl bıpursıt: ev çı mehrûm tûle ye?
- 27 Ger bı navê tûleyan carek vexwûnıt bendeyi
Bı "Melê" xweştir ji mal û gewher û gencine ye
- 28 Gewher û gencên "Melê" husn û cemala dılber e
Sed tealellah tebarek, ev çı husn û cilwe ye?

"TU DIL BIŞO JI NÎFAQÊ!"

- 1 Feleka etlesê sergeşt e, dî cama me hebab e
Mewc dîdît qulzemê 'îşqê me lî ser destî xurab e
- 2 Dîl kemer besteyê 'îşq e, me xweh zunnarî perestîn
Mey û me'şûq e duayê me, û seccade qîbab e
- 3 Jî hicabê were der, nazîk û mestane bimeş tu
Te cihan zêr û zeber kîr bî Xwedê, ev çî hicab e?
- 4 Destê Cîbrîlî hîlavêti jî bejna te nîqabê
Bî yeqîn Qaf e lî rojê were der sine nîqab e
- 5 Me bî îşraqê sûalek jî lebê xunçe kuşa kîr
Go: Bî îlhamê dîzani? dî suala me cewab e!
- 6 Tu binê sazê bî awazî çî rengî me dîxwazî
Ellah Ellah bî Xudê qet dîbîhî, ev çî xîtab e?
- 7 Guh de nayê jî lebê le'lê bî qanûnê hikayet
Dê çî şehde bî defê ra bîdîrît şehde rebab e
- 8 Xweş perişan sîfet û mecme'eyê sûretê hal in
Pîrê 'îşq in û cuwanteb' û dîlî 'ehdê şebab e

2. QÎBAB: *Sûrê tûj.*

6. DÎBÎHÎ: *Dîbîhîze.*

8. 'EHD: *Dem. Soz.*

- 9 Dûredest in jî xıyalan me divê yek jî Xudê ra
Xef dî behsa me jî dîl bêt û bîrît 'eyni sewab e
- 10 Me mûşerref ke, du çeşmên me bisata qedemê ke
Pur lî nîk mîn heyê mey, mêzeke mîn sine kebab e
- 11 Kesk û soran tu binê çerxê lî dora du hilalan
Du qeran mane beraber, şefeqê perde 'isab e
- 12 'Er'eran ta dî şepal in, wereqan cezbeye vê ra
Nêrgîzan ser dî gran in, lî binefşan xem û tab e
- 13 Çêçekên qews û qezehrengî hezar rengî sema ye
Sunbûlan girti xunav û lî gulên tazegulab e
- 14 Mest û hîşyari hemî keç ku lî hîn reqs û sema tîn
Ez nîzanîm çî neseq keyf e nîzanîm çî şerab e?
- 15 Xakîpayên te dî rêza seg û tûlan xwe dînasîn
Me ne sûc û ne gunah û ne xeta, ev çî 'îtab e?
- 16 Jî wisala xwe zekâtê bîde muskîn û feqîran
Ku cemala te ye kamîl dî kemala xwe nîsab e
- 17 Aşîqê mes'elêxwahi were em muftiyê 'îşq in
Destekî sunnet e têda, dî yekî nessê kitab e

10. *BÎSAT: Cirax (Raxistîn).*

11. *ÎSAB: Pêş-enîk. Îsabet.*

14. *"KEÇ KU LI HIN" dî nusxeyeke dîn de "Kec Kuleh in" e. NE-SEQ: Tekuzî.*

16. *NÎSAB: Mîqdarê zekatlêketîne. Standart.*

17. *NESS: Heqîqet.*

- 18 Dıl bışo tu j'vê nifaqê, ku bîdît sine beraqê
Bı sefa hemrehê erbabê dıl û ehlê sefa be
- 19 Nezera 'eynê 'inayet bı me da şahê wilayet
Jı 'inayet nezerê dıl me tiji 'ilm û 'ubab e
- 20 Lebê le'lên te dıbi her bı yeki nuqteyê 'ilm in
Bı xetê herfê elif cezme şubê helqe yê bab e
- 21 Xet û xalên te bı mûm û ji me ra meselegoyin
Me ji wan haşiyeyan sine teji şerhê lûbab e
- 22 Abıheywan te divê rasti binoşi şebi qedrê?
Destı ber gerdenê pîrpêç û xem, an zulfê duta be!
- 23 Me ji biskên te girêhdarî, ji bextê xweh girine
Me ji zulfên bı xem û tabî, dı dıl da, xem û ta be
- 24 Te divê berq û birûskan bireşini, tu nezer de
Te divê rojı xuyabıt, ji şıbakê tu xuya be
- 25 Te divê zêr û zeber ki me, du zulfan bîde ber ba
Te divê qencı qiyamet lı me rabıt, bixwe rabe!
- 26 Qesdî ser çeşmeyê-heywani heqiqet ke "Nisani"
Bı cihanê mebe mexrûr ku cihan eyni serab e
- 27 Serkeşê şiweyê erbabê wefa nine. rihê mın!
Te ji dıl sohti "Mela", bes bı "Melê" ra bı cefa be

19. 'UBAB: *Despêka tişt. Ava ji binê erdê hiltavê je. Lehi. Pêlê avê. Pelê xurmê.*

20. BAB: *Deri*

21. ŞERHÊ LUBAB: *Navê pirtûkekê ye. LUBAB: Xalis. Kakıl ê guzê.*

"BO MIN TENÊ XELA YE"

- 1 Muhbet û muhnet dî zor in
Hub, dibêm bêşek bela ye
'Umr û ji, xweş pê dîborin
Sotîn û derd û cefa ye
- 2 Sotîn û derdê evinê
'Illetê dax û bîrinê
Xweş dîbîn ma ew bîdînê?
Şerbeta lêvan mufa ye!
- 3 Her dîlê soti bî ulfe
Yar ne derman kît bî zulfê!
Ta ebed ew bend dî qulfê
'Îşqî, derdek bê dewa ye
- 4 'Îşqî, derdek bê tebib e
Lê, mufa wesla hebîb e
Kuştîme cewra reqîb e
Pur leinê rûsiya ye
- 5 Dax û key mûn lê hezar in
Gul dîdest şewkên bîxar in
Surperi dêw wê l'kenar in
Ehremen xatem revaye

2. MUFA: Mefa, çare.

5. EHREMEN: Şeytan. XATEM: Gustil.

- 6 Teb'ê dêwan dest gehîştê
 Hor û wildanên bîhîştê
 Aşîqê dîl bendê qîştê
 Can bîdît yekcar rewa ye
- 7 Mîhnet û cewra hebîbê
 Qehr û azara reqîbê
 Heq tenê da min, xerîbê
 Lê şukur baxwo weh daye
- 8 Rohniya wê şewq û tavê
 Şerbeta qend û gulavê
 Kes nehîn mehrûm jî navê
 Lê tenê bo min xela ye
- 9 Bê nesîb min di jî camê
 Dûrî dîr mehrûm jî ramê
 Girtiyê wê qeyd û damê
 Ev xerîbê canfîda ye
- 10 Duredest im bê nesîb im
 Dîlber im xanîm hebîb im
 Pur jî dîna te xerîb im
 Rûh û rahet min liqa ye
- 11 Pur mulazîm tîm liqayê
 Mame hetta multeqayê
 Min rîhê şêrin di dayê
 Hudhud er mîzgin bîdaye

- 12 Hudhudê rîdwanê xeybê
Sed xeber şêrin jî ceybê
Da dilê min murde, hey bê
Guh lî rê min wek seba ye
- 13 Çehvenêr im guh lî rê me
Lê seba rê daye bê me
Erzihala muhbetê me
Bendeyek sadîq Mela ye
- 14 Canfidayê min dî rê da
Fırqetê derbek weh lê da
Qalîbek bêrûh e wê da
Kuşt dibêm min lê rewa ye
- 15 Dem bî dem ew çehvenêr e
Bête nişanek me jê re
Da bîbît ew zinde vê re
Yarê sadîq bê bîha ye
- 16 Aşiqên sadîq dî kê mî n
Ma dîbî sedcan fidê min
Zanîm ew najite bê min
Aşiq û pur mubtela ye
- 17 Alîm mî em vê dîzanî
Cism e ew, em rûh û can mî
Qet jî hev batî xwuyanî?
Ger çî zahîr ew cuda ye!

12. RIDWAN: *Dergevan. Rezvan. CEYB: Kêlek. Teref. Berik. MURDE:*
Miri.

- 18 Hudhudê wê remz û razê
Ba bû ew çû guft bî sazê
Qisse bîr behsa mecazê
Qasîdek xweş teb'i ba ye
- 19 Bademê weqtê mecal da
Çû ku ew yar e bîpal da
Qisseyâ halê bî hal da
Guh dîdêrit yarî ba ye
- 20 Muhibeta mehbûb û latan
Pur vekîr zîwer-sîfatan
Daye qelb û rûh û zatan
Roj dî mir'atê xwuyaye
- 21 Muhibeta sûrî du qîsm e
Qûfl û miftah û tîlîsm e
Hîn jî rûh in hîn jî cîsm e
Nar û nûr e hîn hewa ye
- 22 Hubbê cîsmânî du roj in
Gerçî dîl pur pê dîsojm
Xef ceger peykan dînojm
Mîslê neqşê bê beqa ye
- 23 Gul heta sohr in bî têt ve
Bên tebessum pêve-pêve
Bulbulê serxweş dî nêv e
Nexme û nal û newa ye

20. *MIR'AT: Neynîk.*

21. *SÛRÎ: Şîklî.*

22. *BÊ BEQA: Bê mayîn.*

23. *TÊ: Çîqîl, ta.*

- 24 Herçi celwa bû jî navê
 Nû gulek di girt xunavê
 Wê jî dîl çû muhbeta vê
 Ew bî ya di ra teba ye
- 25 Her kesê muhbet jî rûh e
 Muhtelay nûra sibûh e
 Wê di dîl da sed curûh e
 Cezbe û lerzin û ta ye
- 26 Herdu rûh yek nûr û tav in
 Çerxek û du stêr di nav in
 Herdu dane murxî dav in
 Îsmê hey, dav lê veda ya
- 27 Nûr e pur nadir wucûd e
 Gerçi ewwel nar û dûd e
 Berqê lamî' dê lî kû de?
 Hub di qelban kimiya ye!
- 28 Arîfê cewher-şunasi
 Ê bî vî wesf û libasi
 Dê qedir bêhtir bînasi
 Meq'edê sîdqe ceza ye!
- 29 Dûr neki da wi j' derê xwe
 Wernegeri j' wi berê xwe
 Bûriye ew di serê xwe
 Ser di nava rê nîha ye

24. CELWA: *Bu hurandîn. Fawîstandîn. Çalmisandîn.*

25. SUBÛH: *Piroz, pak.* CURÛH: *Bîrînan.*

26. TEYRÊ DIL: *Heywana serjêkîrî.*

- 30 Ma dibît ew dûredest bît?
 Dê ji fîncana te mest bît!
 Cam ji şehkasê bî dest bît
 Ebteran ew mey dewa ye
- 31 Yarê pur husnek lî bal bû
 Dilberek xayet cemal bû
 Ew bî hal ageh bî hal bû
 Şubhê wê şefqe w 'eta ye
- 32 Mehdera wê xeyrîxwazê
 Nukteyek j'wê remz û razê
 Wê bî dîl seh kîr jî sazê
 Muxnî yû qanûn û nay e
- 33 Yusîfê dewr û zemanê
 Go: Nesim han vê nişanê!
 Lê jî bo nekhê dehan ê
 Nexweşan ew lê şîfa ye
- 34 Mawêra belgên gulê bû
 Bêhn û bû ya kakulê bû
 Daruwê qelbê "Melê" bû
 Lew bî çehvên mîn cêla ye
- 35 Ya nesim dê çî lezîni?
 Sax û salîm ma tu bîni?
 Vi kumêdî lê gehîni?
 Da suwar bît lê, peya ye!

33. NEKH: *Bîhna xweş*. DEHAN: *Devan, Dev.*

34. MAWERA: *Hawî dor, etraf*. DARÛW: *Derman*.

- 36 Xefletê bayê nesim hat
Xef ji bal yarê kerim hat
Pur bî ihsanek 'ezim hat
Qasîdê şahê geda ye
- 37 Dîl nefes disa bî ber hat
Lew Hekim-luqman bî ser hat
Nafiê derdê ceger hat
Talîê kewkeb numa ye
- 38 Mîn ku ew nişan gihîştê
Ev dîlê sed daxê reş tê
Zerreyek xweş lê nehiştê
Îsmê ee'zem pê gihaye
- 39 Çûme ser pîştî kumeydî
Mîn jê pur ew jan û key dî
Behr û ber me l'ber xwe tey dî
Deşt û çol û kerbela ye
- 40 Me w nesim xweş pence tîk ra
Wê dîçîn wek teyrî vîk ra
Behsê zulfa yarê pêk ra
Borê îşqê pur fîra ye
- 41 Gunbeda nûrin xwuya bû
S'pêdeya sadîq numa bû
Yek bî yek şewqê veda bû
Qesr û eywan û sera ye
- 42 Qumrî yû bulbul dîxwûnîn
Lê 'eceb ew xweş dîminîn!

Her seher mehbûb dîbinin
'Endelib vê ra teba ye

43 Buxçeya sorgul dî geş tê
Çiçek û reyhanê reş tê
Dilrubayan têne geştê
Sunbula ta ta sema ye

44 Sebzeya şebnem gulav lê
Sur-'eqiqan dur-xunav lê
Dilberan seyran û rav lê
'Er'era sê tabî daye

45 Bûm şerîf ez b'asitanê
Şahîdên wê gulistanê
Saqiyan cam cam dîdanê
Kewkeban seywan vedaye

46 Çendeki çîmen xwurem bû
Lê medam ew subhedem bû
Mîn bîhîş, baxê İrem bû
Lê seba go mîn: Seba ye

47 Sef bî sef wildan perî bûn
Bendê zulfa 'enberî bun
Têk lî dêmê muşterî bûn
Reqs û govend û sefa ye

46. "XWUREM" dî hîn çapan de "herem" e. XWUREM: Xweş. Şen Rûken. Xwezi. HEREM: Pawan. SEBA: Ya pêş, bayê sibê ye. Ya dawî, navê bajarêkî ye li Yemenê.

48 Pur 'umur mın çû bı suxtê
Lê şukurxwazım jı bextê
Zuhreyek bû ew lı textê
Belku bêm: şemsudduha ye

49 Perdeya xelwê ku hılda
Yengiyek mın dı dı mıl da
Gezmeya jehrê lı dıl da
Qet nego, qetl û xeta ye!

50 Hadiri çûm secde jê ra
Lê niyet ihram ne vê ra
Aşiqê ev gezme tê ra
Her çı ta'et kıt, rewa ye!

51 Çûm ziyaret pê yû desti
Lê nehıst ewwel bı qesti
Da bısojıt rûh û hesti
Aşıqan sotın dewa ye

52 Şerbeta w... xwe nadet
Ta hınek aş... ceza det
Dilberan ev reng e adet
Mehrûwan kemter wefa ye

53 Pişeyê wan xenc û naz e
Sın'etê aşiq niyaz e
Yar lı ber zaran icaz e
Şerbeta şêrin mufa ye

54 Çûm tewafa pê yû destan
Şubhetê sekran û mestan

- Ehlê hal û xûbperestan
Wan ji 'umr, ev muddea ye
- 55 Tilliyên nazîk-şemalîn
Mî n lî ser çehvên xwe malîn
Talîbê werdên bîxalîn
Dîl dî vê fîkrê teya ye
- 56 Çû 'umur mî d'vê xîyalê
Ma şevêk 'îdân dî salê?
Bê m ziyaret zulf û xalê!
Roj û şev mî n ev dûa ye
- 57 Çerx dîtîrsîm kî şîtabê
Zû ecêl pê det rîkabê
Can bîret mî d'vê 'ezabê
Ev sîhareng ejdeha ye
- 58 Çendekî sadîq cema bî n
Er bîbêjî canfîda bî n
Wek "Melê" lazîm tuna bî n
Wî jî dîl canê xwe da ye.

55. TEYA: Tewandîn. Xewr. Jixweçûyin.

DENGÊ TÎPA (♣ : H:E)

"RADIKIN EW QETL Û XWÛNAN"

- 1 Dilbera serdarê xûban
Ez nîzam ageh heye?
Arîf e b'halê qulûban
Alîm e b'halê me ye!
- 2 Alîm e b'daxê fûadan
Gezmeyên wan nûn û sadan
Çûne dîl hetta bera dan
Yengiyê reş-goşe ye
- 3 Gezmeyên wan sad û nûnan
Awurên eswed-'uyûnan
Radîkî ew qetl û xwûnan
Mîn di ye w dîl şehde ye
- 4 Lazîm e l'sultan û miran
Purskîrîn, l'halê esiran
Em kîrîn amancê tiran
Suxteyên dermande ye
- 5 Hêj nîzanîm mîr dî bir î
Zanît em si sal esir î!
Çehvenêr pursek emîr î
Lew bî rehm û şefqe ye

- 6 Pur dîbêm, şefqe lî bal e
Arîfe w sahîb-kemal e
Carînan bine xîyal e
Purs bîkît çî lê heye
- 7 Şefqe kîr car car nihêni
Tûleyê astan vîxwûni
Da vekîm daxan bîbîni
Nar û pêt û şu'le ye
- 8 Da bîzanîr pêt û nar îm!
Kuştîyê cohtê xumar îm
Muhîbetê sohtîm buwarîm
Lazîm ew zanîr we ye
- 9 Alîm e b'derd û bîrînê
Ma dema didar û dinê
Xef dîbîr remza evînê?
Vê bîzan bê şubhe ye!
- 10 Her dema dilber diyar bîr
Can û dîl têk tar û mar bîr
Dê çî reng muhbet sîtar bîr?
Xefkîrîr bêfeyde ye!
- 11 Her dema mehbûb zuhûr bîr
Zêde mezher bê qusûr bîr
Dê tecellayek lî Tûr bîr
Berqê lamî' cezbeye

7. *NIHÊNÎ*: Bî dîzi. *VIXWUNÎ*: (*Vexwandî*). Bî ezminî.

- 12 Cezbeyê dıl jî wucûd bir
Xef jî ber 'eynê hesûd bir
Mın dı mihrabê sucûd bir
Lê hecer nişane ye
- 13 Secdeya ber nûn û dalan
Mın tewafa zulf û xalan
Ev bese j'sahıb-cemalan
Da bıçın lê 'umre ye
- 14 Ê yeki sadıq hebini
Bê hicab ge'ew bîbini
Ma lî hışyari dîmini?
Serxweşê bê bade ye!
- 15 'Îşq e tuxraya nîhêni
Her dema mehbûb dîbini
Dê bî dıl lazım bîxwûni
Ev çî ism û nusxe ye?
- 16 Lamia wê husn û nûrê
Gerçi tê dıl şubhê tûrê
Batına nayê zuhûrê
Lê hicab û perde ye
- 17 Arîf in, me'na şunas in
Lê bî sed sûret libas in
Xeyrî mehbûb wan nenas in
Xef jî wan zani me ye

- 18 Ê lı mın yengi kışandi
Sed xedeng vêra reşandi
Dıl ji derbê herişandi
Ez kırı extırme ye
- 19 Lazım ew zanıt bı hali
Dilber û yarê muwali
Gezmeyên qewsên hilali
Derb lı niva sine ye
- 20 Hêj dıbêm mehbûb nızani
Mın ew e rûh û giyani
Purs nekır bira xwe nani
Ev çıra perkende ye?
- 21 Purs nekır şahê cihanê
Yusîfê dewr û zemanê
Ev çı xak e l'asitanê
Bel esirek jin me ye
- 22 Bûme xak ez lew ji rê ve
Da dema yar bête wê ve
Damenê bıgrım ji pê ve
Çendeki mın cehde ye
- 23 Çendeki taqet dıdêrım
Bım xubar bed rê veşêrım
Ger ji çehvan ez bıwêrım
Mın zenexdan telbe ye

19. MUWALÎ: Bılındkırı.

23. ZENEXDAN: Eçen, çene.

- 24 Da bmoşım mey jı lêvê
Mawera reyhan û sêvê
Lu'luyên şekker dı nivê
Abıheywan çeşme ye
- 25 Çeşmeya avaheyatê
Şerbeta qend û nebatê
Mın lı daxan ew mufa tê
Can jı bo şukrane ye
- 26 Lew weku sewda û din ım
Her dema dêmê dıbinım
Din dıbım heyran dıminım
Muşteri yan zuhre ye
- 27 Şems dinêv burca şeref da
Sed kewakıb çar teref da
Muşteri hati bı ref da
İstiwa çû quble ye
- 28 Afitabê d'istiwaê
Ez jı ber derb û cefaê
Canfida tême liqaê
Şubhetê perwane ye
- 29 Mın tu yi meqsûd jı jinê
Mın jı ber mewca evinê
Sed dıkım didar û dinê
Mezher e bes zêde ye
- 30 Rohniya çehvê nebinan
Murşidê meczûb û dinan

Darûyê derd û bîrînan
Mîn teleb dina te ye

31 Bîne pê nazîk mûbarek
Deyne ser çehvên me barek
Mîn curûh xweş bîn bî carek
Ruhn bîbîn pê dide ye

32 Bîn kefa nazîk jî nûrê
Tîliyên cama tehûrê
Bêhn jî mawerd û bîxwûrê
Mîn ziyaret tewqe ye

33 Da lî ser çehvan bîmalîm
Bulbulê werdên bî xal îm
Carekê rehmê ke, zalîm!
Şefqexwûy heqqê we ye

34 Er neki rehmê tu Mîro!
Dê çî bî halê me îro?
Qet nebê carek esîro
Girtiyê sisale ye

35 Şûn, cîhê peykan û neslê
J'tîliyên yaqût û feslê
Er neki derman bî weslê!
Derb û tir û gezme ye

35. NESIL: Serrîm. FESIL: Bend. Rêz.

36 Gezmeyên yarê ku bavê
Ne j'mey û qend û gulavê
Bêt dewa kî wan digavê
Ma heyatek lê heye?

37 Ne tenê qend û nebatê
Mezherê rûh û heyatê
Hem but û 'uzza û latê
Lew me dîl butxane ye

38 Xwendê latê Azer i tu
Bê çî şêrin dilber i tu
Her çihê lê bêweri tu
Bê xilaf ew Ke'be ye

39 Ma dîbît bexî xilafê?
Ser dîdît bavê nisafê!
Er bîkî bême tewafê
Mîn bî eswed secde ye

40 Da ziyaret kîm nişanê
Ber zuhel bê tî qîranê
Tûle yîm ser l'asitanê
Çehvenêrê mûçe ye

41 Ma bî zehrê şekkerini
Mûçe da dê xef bîxwîni
Da reqîb mel'ûn nebîni
Pur (eleyhille'ne) ye

38 *XWEND*: *Xwendî, berbûrî. Serdar. BÊWER*: *Cigır. Bêti wir.*

39. *MÎSAF*: *Wîjdan, însaf.*

- 42 Ger bîbexşi dîl muradê
J'wê heyat û xemr û badê
Da nekîm gîlêh û dadê
Dad me disa ber te ye
- 43 Guh bîde ber gîlêh û dadan
Hakîmê şehîr û biladan
Dê tu daxwaz û muradan
Di kesê bêçare ye
- 44 Dê tu disa şefqetê ki
B'ew nişana cebhetê ki
Me j'herêmên xîzmetê ki
Mehremên bê perde ye
- 45 Bê nişan in me nişan ki
Mah û xurşîdê qîran ki
Bende kelbê asitan ki
Dûr neki xweş tûle ye
- 46 Da dema suhbet bî coş bi
Cam bî xweş le'lan bînoş bi
Me j'hebib sed deng surûş bi
Dinber û pur 'îşwe ye
- 47 Şerbeta wê cam û tasê
Yar ku tê bêt in'îkasê
Bêt me jî feyzek jî kasê
Abîheywan ew b'xwe ye

- 48 Ê jî vê zerfê vexwari
Xwendi ew xettê xubari
Mestiya çehvên xumari
Qenc dîbi ew zêde ye
- 49 Mî nî dîl tirek Moxul di
Têk jî ber xwûnê qızıl di
Lê dîbêm derdê ku dîl di
Hêj jî çehvên şehle ye
- 50 Rohniya çehvên "Mela" yi
Xalîqê husna te dayi
Hub tenê da mî nî gedayi
Husn û hub yek çeşne ye
- 51 Ditiye nûra yeqeq me
Sed neseq lew tî nî sebeq me
Pur nebi erzan lî heq me
Lê "Mela" xweş bende ye

DENGÊ TÎPA ♀ : H:E)

"TEBÎ'ETÊ TER KE"

- 1 Turreya ta bî darê enber ke!
Xemriyên şeng bî mîskê ezfer ke!
- 2 Lî gulî mîsk û 'enber bîreşîn!
Jî gulavê cînesriyan ter ke!

- 3 Kesk û sorên j' rengê qews û qezeh
Jî sera pa gulav û mawer ke!
- 4 Surme poşên surî bî ser kîl de!
Aqîlan lê xerab û ebter ke!
- 5 Her seher jî nû destekî wergîr!
'Er'eriye têkda seraser ke!
- 6 Nêrgîzên sergîran hîlin carek!
Du qîrana lî yek beraber ke!
- 7 Qedd û qama şerîf, nazîk û ter
Lê seraser bîfêslîn, ker ker ke!
- 8 Tu bîmeş kok bî ser derê qesrê!
Bîxwe koki lî Şah û Qeyser ke!
- 9 Were wek roj bî ser derê kelhê!
Alemê têkî da mûnewwer ke!
- 10 Wek gulazer bo serwa te mîrîm
Me b'qurbana xwe wek gulazer ke!
- 11 Wek gulek zer d'buxçeya te me ez
Tu me têkîl xwe wek gulazer ke!
- 12 Were carek eger tu lutfê key
Me bî qurbani yek du xencer ke!

12. *Ev beyt bî tenê di çapa Fortman de heye.*

- 13 Zahîdê hîşkîteb' i sewda ye
Bî du caman tebi'etê ter ke!
- 14 Weke carek b'xendêşekkerê deng
Têkî mîsra me qend û şekker ke!
- 15 Pê lî ser dideyên "Melê" dayin
Xelweya sofîyan mûkedder ke!
- 16 Xett û xalan nişan "Nişani" de
Me, jî navê xwe ra bî defter ke!

DENGÊ TÎPA (ھ : H·E)

"HÊJ DAXA KUL E!"

- 1 Gerçi bulbul cewherê zatê gul e
Lê gulê rewneq jî 'îşqa bulbul e
- 2 Guh de zîkrê hal û çûşa badeyê
Wê bî bulbul ra dixwûnî bulbul e
- 3 Sosnan sed rengî avêhtin kemend
Wan nego, dîl bendê tayek sunbul e
- 4 Sunbulan seywan lî demê taze kir
Afitab iro dî burca sunbul e
- 5 Qet verêki vê demê hazır dibit
Qîsseyâ fêslê ne karê sunbul e

- 6 'Er'erên rengin jî tayên sor û zer
Qumriyan sed rengê şêrin xulxule
- 7 Remzeya îşqê jî bala hate xwar
Qudsiyan avêhte çerxê hîlhîlê
- 8 Mîn jî dîl nasûreki da hestiyan
La cerem hêj neş'eya daxa kul e
- 9 Bulbul û perwane ew fêsl û dem in
Cînsê 'îşqa mîn tenê derdê kul e
- 10 Nêrgîza nazîk-qed û şehlîya mest
Dîl kîrîm ez bulbulan sewdagul e
- 11 Teb'ê lamî' weş jî mînnet Bul-Hesen
Mîn dî dest da Zulfiqar û Duldul e
- 12 Eşqerê bed fê'lî, çî hê kîr 'ecêb!
Barekel-lah xweş bezi espê qul e
- 13 Zulf û bîskan pur jî mîn dîl bîr belê
Rîşteya canê "Melê" ew kakul e.

12. "Hîşkerûyê bedfê'lî çî hîn kîr 'ecêb?" nusxe!

ESPÊ QUL: 1) Hespê kumeyt ê kapreş. 2) Kul û kor.

13. RUŞT: 1. Kamebûn, Balıxbûn. 2) Tefekura rast û dirust. 3) Dîtin û çûyîna li rîya rast.

DENGÊ TIPA (ه : H:E)

"XWEŞ-BENDE YIM"

1	Yarê me pur Ew leb-şeker	nişan û sur nazik-beşer	sima jî dur cebhet seher	dêm kewkeb e kakul şeb e
2	Şeb-kakul e Min xefletê	xal fulfil e dî qible tê	çin sunbul e wek mah dîtî	davadil e sa xebxeb e
3	Min di bî xef Nûnên jî Yeng	suhbet bî dev berdan xedeng	şahê necef wê pur jî teng	fincan dî kef şêrin-leb e
4	D'ani zuhûr Saqî werin	dêmê bî nûr cama zerin	xalên dî hûr ew surşîrin	cama tehûr cam meşreb e
5	Xal û xetê Her dem jî new	şox-qametê dîl-feyz e ew	me j'vê kitê- ev 'îşq û sew-	b û dest-xetê da mewheb e
6	Min bê qedar Mihra butan	ev sîr veşar xal û xetan	'îşqa xedar sîndoq e xan	suhtî sîtar û meqleb e
7	Dêmê bî xal Yekta elif	ew nûn û dal nayê westîf	ismê celal mun 'eqlê tîf-	bejna şepal lî, mezheb e
8	Hetta nemam Bê cehdî qet	salîk temam tên emr û xet	şêrin-kelam herçî ku met-	ma da me cam? leb menseb e
9	Dermande yîm Zara bî sîr	heyran te yîm dîl j'êm vekir	pirane yîm der heq me pur	xweş bende yîm erzan me be
10	Bergên gulê Bê perde û	ew mîsk e lê xweş me'de û	hûr hûr welê yek we'de û	der heq "Melê" pur şefqe be.

"EZ NUMA BÛM DI ŞERQÊ DA"

- 1 Me lew fincan lî ser dest e, ku mehtaba hilal-ebrû
Numayên min di mîr'atê, meya saf a zelal ebrû
- 2 Bî şêrini bî zibayê, bî reftari bî balayê
Bî nê nûnên di tuxrayê lî bala her du xal ebrû
- 3 Bîla bî "Saimud-dehr" î, bîla iftarî carek bî
Kesê zani jî dilber wê xwûyabî her du sal ebrû
- 4 Meşî mestane reyhanê dilê min di dî amancê
Reşandî sineyê tiran bî qewse herdu mal-ebrû
- 5 Sehergeh zuhresima wa diçû gulşen bî seyrane
Bî ser çehvên "Nişani" da xeramê ew hilal ebrû
- 6 Dîbên: xawer perest î tû, nîzanî min di keşfê da
Numayî min di şerqê nazîka gerdenşemal ebrû
- 7 Tenê ma her terazû ne, di babê husnê kêşani?
Hilalê xateme husnî nî, lî wê dême bî xal ebrû
- 8 Me cewher 'unsurek xamîs numa îro di talî' da
Dî vê teqwmê insani lî talî' bûne fal ebrû

3. *SAIMUD—DEHR: Rojgirtiyê salewext.*

8. *XAMIS: Pêncemîn.*

- 9 Bı zunnarê dı derê da, lı hındava çelipayê
Bı mıhrabê me bir secde, belê emma xeyal ebrû!
- 10 Dı mabeyna du ebrûyan dıbinım qabêqewseynê
Dıdıt mın terfet-ul 'eynê cewaba sed sual ebrû
- 11 Dı batın secdegahê mın, lı ber wan her du ebrû ne
Bı 'eynı taqê mıhrab ın, dı 'ilmê ehlê-hal ebrû
- 12 Eger de'wayê Mûsayi, dı 'ışqê da bıkmı caız!
"Mela" daim tecellaye ji wê terha şelal ebrû
- 13 Bı şêrini bı zıbayi, çı katıb bû weh kêşayi?
Tealellah nişan dane, weh şêrin ev misal ebrû.
- 14 Ne şêrina lı der bendê, ne mehbûba Semerqendê
Nekêşayın bı vi rengi, lı neqşê bêzewal ebrû!
- 15 Nişana qabêqewseynan, ku qews avê te ebsaran
Dı teqwima tecellayê beser lê bûn hilal ebrû

10. TERFET-UL EYN: Nıqandına çavan.

11. Bİ EYNİ: Bı çavê mın.

DENGÊ TIPA (9 : W:Û)

"XEMRA HELAL"

1	Min di seher Ew dêm-zeri	şahê mecer sur muşteri	lebsê dî ber ya Reb peri-	mexmûri bû ya hori bû
2	Hori-weş e Xalên dî qer	şêrin-meş e miska Teter	kakul-reş e nazik-beşer	xal-hebeş e kafûri bû
3	Nazik-letif Min dî bî wext	gerden-zerif ew nik i bext	lebsêşerif iro lî text	kêmxê w qedif fexfûri bû
4	Fexfûr sur e Ew hate muş	sima dur e mîn çûne hîş	heybet pur e dîl mîn jî 'îş-	pur dîlgur e qê fûri bû
5	Dîl bû kerî Min dî gelek	zaba berî ew sur-melek	lazîm herî wek meş'elek	dê ew zeri pur nûri bû
6	Dêm fener e Ew meyperest	xal 'enber e meşha û mest	bû mawer e cama dî dest	lêbşeker e ferfûri bû
7	Mey ber kefê Husna lî dêm	meşha sefê wesfan neşêm	soza defê herçî dibêm	da qerqefê jê dûri bû
8	Da mîn suroş J'wê 'îşweya	wer mey bînoş yar bû xwûya	zewq û xûroş ew ne j' meya	lew çûm jî hoş engûri bû

3. KÊMXE: Cûreyek qumaş. NIK: Eyişandi, ceibandi. Xweşlêhati.

7. DEF: Dev. QERQEF: Mey, bade.

8. SUROŞ: Îşaret (Wehiy). Milyaket, XUROŞ: Heyecan. kêfa zêde.
ENGÛR: Tiri.

9	Mın di bı xwab Dıl şewwışand	ew mahitab xwê lê reşand	da dıl kulab xweş herişand	cohtë xurab têk hûri bû
10	Hûrkır cesed Cerhan ji new	qewsên semed xwûn daye kew	tir dan kebed 'ışqa me lew	dad û meded meşhûri bû
11	Lew yek neseq Şêrin-lebê	mın tèn sebeq dêm-kewkebê	nûra yeqeq lê bende, bê	da dıl şefeq destûri bû
12	Dilber nezer Zanım ku wa	da mın seher ew mahrûwa	xeclim ji ber wek lu'luwa	lê ew qeder mensûri bû
13	Paş firqetê Wesla hebîb	zor-muhbetê mın bû nesib	mı j'tel'etê mel'ûn reqîb	çûm hezretê rencûri bû
14	Cama zelal 'Îşqa xedar	xemra helal sohti sîtar	yara şepal nêv me û yar	da mın bı hal sed sûri bû
15	Şahi cîvin Derd û bela	xem jê-revin wên çûn hela	marê şevin 'umrek "Mela"	êsand evin mehcûri bû
16	Pur mın zecîr Şem'a me hıl-	ditın hecîr bû sed 'emûl	mabû ecîr mînnet me dıl	subh û fecîr mesrûri bû
17	Yar we'de da Dı spideyê	b'le'lên xwe da çûm we'deyê	wer ba me da ku j'badeyê	çın perde da mexmûri bû
18	İhram mı best Cohtë hebeş	eswed bı qest tir dan bı weş	yar hate mest hecca mı xweş	ez çûme dest mebrûri bû
19	Vê kakulê Dava dılan	çinên dilê, nêv sunbulan	qelbê "Melê" ser sorgulan	dav dane lê menqûri bû

DENGÊ TÎPA (9 : W:Û)

" KEMÎNÊ XEDAR "

- 1 Dı dest da yengiyek nûbari mın di ew keman ebrû
Lı bala cedwelek cebbari lêda hem qiran ebrû
- 2 Ku heq ev herf û xet kêşan lı talayê me derwêşan
Du qewsan goşê lê badan û ser peyweste man ebrû
- 3 Te didari, te reftari, te elmasên şeker-bari
Bı 'eyni rê lı ser sadan, du nûn reyhan numan ebrû
- 4 Bı hemdil-lah bı feyrûzi, lı wechê dilberê mın di
Ku mahê nû nişan mın dan lı taqê asiman ebrû
- 5 Tealel-lah nişan dane, bı husnê ev neseq dane
Jı neqş û sen'etê heq ev nişan çeşm ev nişan ebrû
- 6 Jı re'na nêrgizên şehla, mecalê hem qiran binim
Hezar remz û îşarat in, jı wan qewsên çewan ebrû
- 7 "Mela" dıl tşk te peykan in, jı mehbûban me nişan in
Kemandar in, dı xeddar in, dı burca esmeran ebrû

DENGÊ TÎPA (9 : W)

"MEHA NÛ"

- 1 Wê spide jı burcê qews-eburû numandin mahı new
Xweş jı qewse eburûwan vêra kışandin mahı new

- 2 Goşeyên nûnan bî ser badan jî qewse bê weter
Mîslê enguştê binê sed ser beyandî mahî new
- 3 Keşşîfî bedra temam ehîsen jî bala tel'etê
J'istiwa da gezmeyan çerxê reşandî mahî new
- 4 Wê lî wechê afitabê gahî kîfş û gahî xef
Arîfên ehlê besaret heyîrandî mahî new
- 5 Mîl dîzanîm dane ber qewsê hilalî goşê-zer
Lew jî bala goşeyên nûnan lîvandî mahî new
- 6 Ez dîbêjîm dê lî mîn dîsa ceger sed pare kîm
Wê bî mîzan her du şîrazî çevandî mahî new
- 7 Daxîlê meclîs bûyî îşev "Nişanî" lew ku xef
Camê rûhanî lî ehlê dîl nişandî mahî new

DENGÊ TÎPA (و : W:Û)

"SERMÎYAN EV BADE BÛ"

- 1 Hê dî ber "qal û bela" yê belku ev alem nebû
Çerx û dewran dewrî gerdûn gunbedê minê nebû
- 2 'Erş û kursî hêj dî mexfî bûn dî kenza qudretê
Husnî heq bû istîwayê lamîa 'îşqê hebû

6. *ŞÎRAZÎ: Kevanê şîrazî.*

- 3 Nehtıbûn hukmê sifatan ew jî zatê "lem-yezel"
Aşîq û me'şûqî yek bûn şem' û hem perwane bû
- 4 Husn û hub zatê qedim in, lê cuda bûn ew jî yek
Lê mîha ismê hudûsê hikmet û tefsîl we bû
- 5 Husn û hub ani zihûrê îşq e eslê alemê
Eslê eşya da bizani wane esl û made bû
- 6 Yek dî zatê surşîrinan bû cemal û husn û sur
Yek dî qelbê ehlê dîl nar û celal û cezbe bû
- 7 Aşîq û me'şûqê "el heq", herdu mîr'atê yek in
Lew dî esle cem'e da, eslê qedim ayine bû
- 8 Cezbe û seyra sulûkê, bê mehebbet nabîtin
Cehdeya bê 'îşq û hub, çendi ku kîr bê feyde bû
- 9 Salîkên 'îşqê yekayek hewce nin in ez bîbêm
Cameya pirê terîqê ser jî nîk şehzade bû
- 10 Reng û reng ehlê meqamatê terîqê çûne seyr
Hîn celal û hîn cemal û sermîyan ev bade bû
- 11 Ê birî 'eynê beqayê badenoşê 'îşqê bû
Ê bûyi melhwê fenayê aşîqê bêçare bû
- 12 Êk jî wan perwane bû soht û fixanek jê nehat
Êk jî wan teşbihê goyinê bî ah û nale bû

10. BEŞUKOH: Bîşkok. XES: Dîrîk.

- 13 Awurên eswed-'uyûnan aqlan sewda dîkîn
Gezmeya aşîq vîdîl keftî jî çêhvên şêhlê bû
- 14 Aşîq û me'şûqî da wasîl bî yek bîn bê hicab
Mehwî bû bizzatî aşîq lew dî îşqê perde bû
- 15 Lew dî 'îşqê da fena bû da bîbît baqî bî dost
Aşîqê fani ne bû wasîl hetta baqî ne bû
- 16 Nuqteyê 'îlm û sewadê herf û neqşê alemê
Ser dîdîm me'nayekê eslê sewadê nuqte bû
- 17 Her yek e w dê yek bîminît ewwel û axîr yek e
La cerem nabî du bî, ê dê bîminît, her hebû
- 18 Her çî de'wayê dî 'îşqê da "Melê" sabît kîrî
'Eynî de'wayê dî nefîs-ul emrî disa şêhde bû

DENGÊ TÎPA (و W:U)

"ROJ Î TU LI ŞERQÊ"

- 1 Kes ne d'ye sehergeh ku çî nazîk-weres î tu
Me j'belgê gul û nêrgîzê ser-mestî besî tû
- 2 Zanîm ne tenê ku yedê beyda tu dîdêrî
Wer xweş ke şêhidên xwe ku 'Îsa nefes î tu
- 3 Rûh î, tu ne cîsm î, jî cemalê bî çî ismî?
Reng, rengê te bê keşf û şuhûdê çî kes î tu?

- 4 Roj i tu lı şerqê bı cemala xwe dı berqı
 Billah ku jı ser çeşmeyê eqdes qebesı tu!
- 5 Bêje, jı çı nûrê û tecella lı çı tûrê?
 Geh geh lı sera perdeyê can multemes i tu!
- 6 Şemsa felekê ya melekê hêji nızanım!
 Hori yû periya bı xwe rûh-ul qudus i tu
- 7 Cana, ceres û rehberê 'ışqa te ezım qet
 Ageh bı fixan û herekatê ceres i tu
- 8 Ma yek nefesek mın dıbtın bê tu wucûdek?
 Dê bê te çı bım? hem tu rûh i hem nefes i tu!
- 9 'Îşqa te, me go: Zêrê sifet zer dıkırın, go:
 İksir e evına me bı 'eyni û mes i tu
- 10 Mın go: Jı nigaran tu gul i, bes bışukoh be
 Zanım ne muhıb her ne kes û xar û xes i tu
- 11 Ey horisırıştê lı me xweş meywe te ber kır
 Cenna te wisala me û ateşperes i tu
- 12 Mın go: Dı şevan şubhê nucûman bı tewaf in
 Go: 'Îşwe dızanım bı çı qest û hewes i tu
- 13 Mın go: Me bı tixan ve dê nakın jı derê te
 Go: Em jı nebat in û lı teb'ê meges i tu
- 14 Mın go: Jı kemenda serê zulfa te verestım
 Perwazê lebê le'lê me, go: Ger veresi tu

- 15 Yek dem ve nehiştin te dı hamûnê firaqê
Bê hemdemê derdan, go: Çı feryadêresi tu?
- 16 Mın go: Jı dılê şubhê bıxwûr xweş te bı ker kır
Ker kır bı du le'lên xwe şeker, go: 'Edes i tu
- 17 Mın go: Lı rexan mı, ne ku keçrû wek Ferezin
Şah gote mı: Kış, matı, lı bazê feres i tu?
- 18 Mın go: Te divê ser jı reqibê bıbırım ez
Go: Mın diye zanım dıبری jê, meqes i tu
- 19 Ta çendi bı xef bade bmoşî weh nefes da
İca bı def û ney were mirê 'eses i tu
- 20 Mın go: Jı qedim ez meye 'ışqa te dinoşım
Go: Mın jı 'uşağan ne tenê mey-teles i tu
- 21 Mın go: Dı şevan şubhê şemalan weh disojın
Perwane-sifet: Ca here, bê sewt û hıs i tu
- 22 Mın go: Beser û quwwetê sem'a mı tu yi, go:
Zanın te em m ruh, û ... red qefes i tu
- 23 Te j'zulfê butan sıhhet "Mela" reştire talı'
Yarê te seher bêt û bıret pê nehesi tu

15. HAMÛN: *Beyaban, xeribi.*

16. 'EDES: *Nisk.*

17. REXAN: *Du berikên setrencê. Kenaran. FERİZİN: Wezirê setrencê. FERES: Hespê setrencê.*

"TEXT Û BEXT Û REXT"

- 1 İro jı derba xencerê
Lazım bı êşan i Mela!
Teşbihê zulfa dilberê
Zanım perişan i Mela!
- 2 Zanım perişan i jı dıl
Bê hed bı êşan i jı dıl
Teşbihê buryan i jı dıl
Bil-lah ne insan i Mela!
- 3 Billah çı teb'et adem i
Yekser dıbêm yek alem i
Deryayê Qafû Qulzem i
Yan çerxê gerdan i Mela!
- 4 Ya reb çı wi mîhnet keşî
Ser ta qedem têk ateş i
Mecrûhê qewsê tûz-reş i
Lew dıl bı peykan i Mela!
- 5 Zanım jı 'îşqê dojah i
Behrek jı narê asîh i
İro lı mahê xergeh i
Teşbihê seywan i Mela!

5. XERGEH: Tîmî, herdem. Wargê delala. Fîva teze. Cuwan.

- 6 Ev sineya wek nay û ney
Pur lê kışandin dax û key
Hê dîl bî naehlan dîdey
Ya reb çî nadan i Mela!
- 7 Durdaneya dê-m-gewher e
Ayineya Eskender e
Bê mîrwetê dîl kîr ker e
Mecrûhê xalan i Mela!
- 8 Bê mîrwetê dîl herîşand
Teşbihê şîsê lê kîşand
Ker kîr ceger xwê lê reşand
Ateş lî ser dani Mela!
- 9 Narê jî rengê dojhê
Husn û cemala wê mehê
Me d'perdeya vê xergehê
Xef kîr, çî 'Umman i Mela!
- 10 Îro lî 'umrê xwey tel
Bê şahîd û cama sedef
Bê çeng û saz û nay û def
Zanîm peşîman i Mela!
- 11 Zanîm te kohê Tûr e dîl
Lew her bî nar û nûr e dîl
Şehkaseya ferfûr e dîl
Lew mest û sekran i Mela!

9. 'UMMAN: *Behra Ummanê*.

12 Her sine tabi na tamam
Na puxte xam bê mîhr û cam
Xerqin dî xwûna dîl medam
Le'la Bedexşan i Mela!

13 Pur le'l û dur te j'kîlkê 'îşq
Anine nezîna sîlkê 'îşq
Der berr û behrê înlkê 'îşq
Me'lûn e xaqan i Mela!

14 Bê hed lî qelb ê şubhê ney
Cewra te danin dax û key
Lew bê hemel xweş nine mey
Ema bî şirani Mela!

15 Mînnet jî talî her jî bext
Asef bî text û bext û rext
Belqis ewî anî bî wext
Îro Suleyman i Mela!

16 Ew her du le'l û her du weşm
Geh geh bî naz û geh bî xeşm
Ew bejn û bala hate çeşm
Me d'seyrê rûhan i "Mela"

12. *PUXT*: Gîhaştîn. *XAM*: 1) Nezan, Ecemî, xam. 2) Xav. 3) Xame bûn. *MEDAM*: 1) Meyxwûr. 2) Daimî. 3) Bade. *BEDEXŞAN*: Navê ciheke li Efxanîstan.

14. *HEMEL*: Berxîk. Navê burcekê ye.

15. *ASEF*: Wezîrê sîlêman pêxember.

16. *WEŞM*: Xal, nişan. *XEŞM*: Zordestî. Torîtî.

"TA ÇENDÎ WEH BIMÎNIN?"

- 1 Ey şahîdê qudsî veke bendê jî niqabê!
Ta çendî weh sergeşte bîminn dî hicabê!
- 2 Biskên jî herirê tu jî nû mawerê lê ke
Zulfên jî 'ebirê şe ke, bavê xem û tabê
- 3 Qıştên dî xwe çîn-çîn bîde ber mîsk û zubadê
Tayên dî 'isabê bireşînn bî gulabê
- 4 Her yek bî hezar rengî lî bejna te sema tèn
Xemrî yû lef û şîtrî yû tayên dî 'isabê
- 5 Mîn can yedê beyda ye jî 'Îsa çî xebêrdîm?
Mîn ateşê Mûsa diye gulnar û şerabê
- 6 Mînnet ku jî bextê xwe û talî' bî nesîb ım
Husna te ye iro jî me ra çûye nisabê
- 7 'Îşqa me jî ber mewc û 'ecacê bûye derya
Wê zêr û zeber kîr me bî dest hînd û xurabê
- 8 Neh çerxê sîpîhrê jî hewayî te û mîhrê
Sergeşte ne ew têk vî me ra şubhê hebabê
- 9 Wek ba dîlezîni tu kumêdî dî bezîni
'Umrê me ezîzê bî Xwedê bes ke şîtabê

9. ŞİTAB: *Lez, bazdan.*

- 10 Ya pê bî ziaret bî be de, ya serê enguşt
Destê xwe me avêtiye bê çare rikabê
- 11 Mîn rê jî serabê bî şerabê bîr, û munkîr
Hetta bî ebed teşne ceger ma dî serabê.
- 12 Serpoş û qibaba me ye tesbih û musella
Wer da bîdîrînin lî xwe vê perde w nîqabê
- 13 Lillâh were saqî bî du caman me cuwan ke
Mutrib bî defê ra bîde sigah û şebabê
- 14 Wer guh bîde nayê ku şêrînged dî semayê
Pur hel kîrîne mes'ele vê fêsl û xitabê
- 15 Cama ne şekerleb bî me dît 'eynî heram e
Fetwa weh numa, Haşiyeya Şerha Lubabê
- 16 Muftî me ney û nay e, û ney qewlê qedîm e
Bawer te nehîn, guh bîde ber çeng û rûbabê!
- 17 Nerda me çî bazi bî numêtîn, me jê razî
Bend in dî sualê, û kuşad in dî cewabê
- 18 Ez çûme serayê ku şêrînged dî semayê
Go: Ev ne "Melayê" me ye? bê perde bîla bê!

12. *MUSELLA*: Sîcade. Cîyê nîmêjê.

13. *SİGAH*: Aheng. *ŞEBAB*: 1) Cuwanî. 2) Coş û xuroş, heyecan.
3) Xweşkirin.

15. *HAŞIYA ŞERHA LUBABÊ*: Navê pirtukekê ye.

17. *NERD*: Tewla.

"NEY TENÊ TEBRÊZ Û KURDISTAN
LI BER HUKMÊ TE BIN!..."

- 1 Ey şehinşahê muezzem, heq nîgehdarê te bi
Sureyê "Înna Fetehna" dor û madarê te bi
- 2 Her kenarê pê ve wergêri 'înanê himmetê
Zuhre bi peykê te û keywan rîkêbdarê te bi
- 3 Daima menzîlgeha sûra te bî Burca Şeref
Tahê ferxende û bextê seîd yarê te bi
- 4 Seb'eyê seyyare û neh çerxê sergerdan, bî ve
Gerdiş û dewrê 'eceb, der xîzmet û karê te bi
- 5 Mahîtaba dewletê yek pertewek şem'a te bî
Afitaba ref'etê berqek jî enwarê te bi
- 6 Lamiê fetha ezel berqê jî ber tacê te dî
Kewkeba se'da ebed necmek jî seyyarê te bi
- 7 Berqê subbûhi ku îşraqê li sed canan dîdî
Ew ku keşfa dîl dîkî remzek jî esrarê te bi

-
1. Sûrê "înna fetehna" hafîz û yarê te bî — Nusxe.
 2. 'ÎNAN: 1) Fezîlet, 2) Dîzgîna hespê, 3) Ber pê ve. KEYWAN: Qiraliyet. PEYK: 1) Xeberbîr. 2) Teqlidci. 3) Peyik. 4) Sîntirk.
 3. FERXENDE: Şadi, mûbarek.
 4. SEB'EYÊ SEYYARE: Heft stêrkên geroke.

- 8 Rayeta fethê jî nesra te ku her menşûrî bû
Şehsiwarê ferrê subhani 'elemdarê te bi
- 9 Ney tenê Tebrêz û Kurdistan lî ber hukmê te bîn
Sed wekî şahê Xurasanê dî ferwarê te bi
- 10 Gerçî der îqlimê rabî' hate textê seltenet
Padişahê heftî îqlimanî selamkarê te bi
- 11 Çimena sultaniyê yek laleyek baxê te bî
Gulşena xaqaniyê xarek jî gulzarê te bi
- 12 Ê jî emrê tey mukerrem serkeşî kî şubhê şem'
Ber serê tixê te û meqtûlê mûkarê te bi
- 13 Şahibaz er çendî perwazî bî bala bêt û ret
Dê dî nêv tûra te bî û seyî şunqarê te bi
- 14 Şahê pur heybet dîdêrî lê bî sehmê zêde yî
Saeta xeflet xuya bî kûz dî bîn barê te bi
- 15 Her serê dewlet hebî, dê her dî nêv benda te bî
Her kesê aqîl bî, dê her rîcûkarê te bi
- 16 Ê divêt azade bî, dê çehvenêr lutfî te bî
Her çî istixna dî dîl, ber minnet û barê te bi
- 17 Her kesê qestek dî dîl, dê gestî dergahê te kî
Ê dî xatîr ercû kî, dê her rîcakarê te bi

8. RAYET: *Ala*.

10. IQLÎMÊ RABÎ': *Îqlimê çaremin*.

16. ISTÎXNA: *Maldar. Bêniyazî*.

- 18 Ê ne dewletxwahê Hezret bit ji niva can û dîl
Şubhetê ehlê şeqa, ber qehr û azarê te bi
- 19 Ma bî 'îş û noş û şahî ew qeder 'umrê te bit
Çendeki salîk mucedded bit û bê, zarê te bi
- 20 Her kesê ne j'can duagoy û senaxwanê te bit
Girtiyê qeyda te û amancê nûbarê te bi
- 21 Medrekê 'ilmê demirê şemmayek wesfa te hat
Wer ne key alem bî şe'nê qedr û mîqdarê te bi
- 22 Qest û daxwaza "Melê" daim jî can û dîl ev e
Her dî benda xîzmetê pêşdestê didarê te bi

DENGÊ TÎPA (ى : I)

"PESNDAYÎNA XAN ŞEREFÊ CIZÎRÊ"

- 1 Xanê xanan lamiê necîna te her pur nûrî bî
Keştiya bextê te ez bayê muxalîf dûrî bî
- 2 Kewkeba se'da Şeref talî' dî nêv burca te bit
Da tenê tu j'çerxê bala şubhê meh menzûrî bî

18. ŞEQA: *Bedbext. Nepak.*

19. ÎŞ: *Jiyan. Îş û Noş : Xweşborandin. ÇENDEKÎ SALIK: Gelek sal.*
MUCEDDED: *Nûbüyi. (Nû).*

21. MEDREK: *Têgîştin. DEMÎR: Dîl.*

- 3 Encumê çerxê muheddeb her jî zatê tey şerif
Kesbî enwarê bîkîn hetta ku nefxa sûrî bî
- 4 Lew ziyaret asitanê têtê şemsa dewletê
Da sehergahan jî didarê şerif pur nûrî bî
- 5 Extera te j'perdeya xeybê eger bêtîn zuhûr
Dê bîtîn nisfun-nehari wer şebê deycûrî bî
- 6 "Ayet-ul kursi" yû "En'am" heykela toxê te bîn
Bê nihayet pur murad û bê eded mensûrî bî
- 7 Her kînarê wergerîni pê ve 'ezm û hîmmetê
Rayeta fethê bî nesra "Lein yezel" menşûrî bî
- 8 Xeymeta nûra 'înet, zillê memdûdî te bî
Sureyê "Umm-ul kitab" madarê hezret sûrî bî
- 9 Paşê Noşîrwan dîbêm: Dê hakîmê adîl tu yî
Mîslê Hatem dê bî danê, der cihan meşhûrî bî
- 10 Ma, Cîzîrê şubhê darê textê heft îqlîmî bî
Hem bî hukm û seltenet, Eskender û Fexfûrî bî
- 11 Mîslê Cem cama zerîn xalî nebî te j'badeyê
Da jî xemra şadîmanî daima mexnûrî bî
- 12 Ma dî baxê 'îş û noşê her bî saz û erxewan
Kamîran û kamîrbexş û dîlxweş û mesrûrî bî
- 13 Çendekî şêrîn pûser derbendê diwana te bîn
Bendê şapûrê te bîn ta Xusro û Şapûrî bî

- 14 Hindi ku roj û şev m, t êk 'id û Leylulqedri b m
Cam medam pur bade b t, l ê ne j'meya engûri bi
- 15 Şubhetê Rûhulqudus 'erdê tu pê l ê day m
Sebze û reyhan û nesrin û gulê menqûri bi
- 16 Her derê ne'lê feres şubhet Boraqê vêkev t
Çeşmeyê heywan j i ew 'erdê mûbarek fûri bi
- 17 Ma te 'umrê Xîzr û Nûh û mulkê Zulqerneyn b t m
Gunbeda çerx mulemmê' her b t me'mûri bi
- 18 Xassê teşrîfa te b m derya û derbendê 'Ecem
Da xelatên her seher sed zerkeş û mexmûri bi
- 19 Gerçi der Diwanê Hezret pur heqir m şubhê mûr
Çeşmê te çeşmê Suleymani b i halê mûri bi
- 20 Ê ne wek goy, bê ser û pa bêt d i benda xîzmetê
Ma d i çewgana te her perkende û meqlûri bi
- 21 Ma lisanê m m duagoyê l i der heq wesfê Xan
Mezherê sirra kalamê wek d i rextê Tûri bi
- 22 Her d i medhê te w senayê, sine û qelbê "Melê"
Bê tefawut qulzema pur lu'luê mensûri bi
- 23 J'asitanê Dewletê xaîb nebi carek "Mela"
Da j i fermanê mukerrem dem b i dem me'mûri bi

"TEXMÎSA LAXER BER XEZELA ŞÊX EHMED"

- 1 Remzek ji nesimê lî çimen da û xwuşi
Rabû ji xewê sebze û şebnem dî weşi
Çendi xebîti dîl ku bîkî seyr, û neşi
Nêrgîza mest û xeraman dî shergeh ku meşi
Bîşkîftî sîfet-xunçe ji çarê herîşi
- 2 Horên dî bîhîştê û peri cumle cema tèn
Zuhre reqîsî çeng û çexane bî xîna tèn
Xul xul dî kevêtin çimenan têk bî newa tèn
Şîmşadê bî meş sosîn û sunbul bî sema tèn
Ey serwi-xeraman ku tu carek bîmeşi
- 3 Çîn gîrtîye Sîrban ji seraser bî kef û kef
Xwûnê weh dirêjin ku lî şîran cemîdî kef
Dunya bûye leylan ji lîxaban dîwerit kef
Rom û 'Ecemî gîrtîye oxilme bî sef sef
Cohtê Moxulan hatîne cengê Hebeşi

Ev nûvisara ku li jêre, têbîniyeke dî çapeka Diwana Melayê Cîzî de, ku bi zarê erebî nîvisandi bû, me wergerande kurdî:

"Tu bîzan cu qesîdeya han, pêncoka yek ji şairên kurda ye ku bernavkê wî "Laxer" e. Ewî Qesîdeya Mela kîrîye pêncok bi grêdana sê rêzên xwe, pê ve, di pêşîya her beyteka (du rêz) Melê de. Bi vê rewşê ve, her beytek dibe pênc rêz. Sê rêzên pêşî yên "Laxer" in û du rêzên dawîyê yên Mela ne. Ev pêncok, di Diwana Melayê Cîzîrî, ya ku bi navê "Çapa Cîzîrê" tête naskirin de heye. Mumkune ku "Laxer" yek ji feqîyên Mela be, lîma ku cu qesîdeya wî ketîye nava Diwanê".

- 4 Wesfê dî cemala te bû ewwel ku sebeq da
 Tehsini jî Ustadê kelamê weh bî heq da
 Bawer te meha bedrê bî enguştê du şeq da
 Wek zerre herê sine jî mihra te şefeq da
 Bu şuhreyê afaqê bî xurşidê weşî.
- 5 Xal û nuqte û 'enber û mîskê te fîşandi
 Yek nuqte ne di kes, qelemê sehwe kîşandi
 Kafûr e kîrî sefhe sewadê neqîşandi
 Kê dest e jî qudret weh kîşandi weh reşandi
 Qewsên du hilalan lî beyadê bireşî
- 6 Hindi ku hebî xûb û zerif, her dî xemê ne
 Derxwûnê ceger pareyê derd û elemê ne
 Wek şehde hebî, da'î çî hacet qesemê ne?
 Çendi te but û latê nîsarê qedemê ne
 I'cazê me ke vê tu jî neslê Qereşî
- 7 Gazîndê jî derd û eleman qet me ke êdî
 Ev talî' û bextê weh mûbarek te lî kê di?
 Mehsûlê muradê me jî tira bî çepê di!
 Ey dîl jî kevanê helek exter me şehê di
 Mînnet ku tu exter me yî, qewsê bîweşî
- 8 Her gezme û awur ku jî çehvên tey bî kîl hat
 Mîn sine hedef da ber û yek yek ne bî tel hat
 Ahek me nehişt sebr û sukûn bê tehemîl hat
 Derba cegerê bû ku me ev nal e jî dîl hat!
 Ma ah û fixanan dîkîrî kes jî xweşî?

- 9 Bê keşti lı ber behra firaqê erixim ez
 Xewfek me hebû lew bı wisalê perixim ez
 Bêhnek jı wisalê me bîhist û kerixim ez
 Wek tûlê, lı pey mûçe, lı dorê çerixim ez
 Çıx kır me hebibê, go: Tu nari bıqeşi
- 10 "Laxer" dı zemanê xwe û şı'rê, tu 'Ela yi
 Çendi te hebın dax û birin, teki bela yi
 Rengini jı derd û eleman şubhê wela yi
 Ellah çı tebiet beşer i xwo ne "Mela" yi
 Vê cewr û cefayê tu peyapey dı keşi

-
10. A) *Ev nıvisara ku lı jêr e, têbiniyek e dı çapeka "Diwana Melayê Cıziri" de, ku bı zarê erebi nıvisandi bû, me wergerande kurdi.*

"Kaxer, leqeba xweyiyê "Pêncok" ê ye. Wek edetê temamê şairan, navê xwe dı paşiya şı'rê de gotiye. Kelima "Laxer", bı mana qelsi û şerpezetiyê ye. Şairê me, vi navi lı xwe kiriye, bı mana ku ew, jı derdê evinê ketiye wi hali. Elai, lı gor ku tê zanin, navê şaireki ye. Û laxer, xwe bı wi qiyas kiriye. Lêbelê, me şaireki bı vê navi ne bîhistiye".

B) Dı çapa Diwana destnıvis ya Mele Taha Ebabekri de, navê Laxer, El Ceziri Mele Ebdusselam e.

(Çapa Sadıq Behaeddinê Amêdi, Çap: 1).

"DÊ LI KÎ 'ERZE BIKIM?"

- 1 Hêvi yû tewqe dîkîm ez jî xudana heşemê
Wê nîgar û senem û padişeh û mulheşemê
- 2 Carînan bendeyê dîlsohtî yê mehcûr ve vînêr
Bî lebê le'lê şeker-barî jî 'eynê keremê
- 3 Pîrsyari lî me carek bîke şêrîn-dehena mîn
Ku perîhtî ne fîraqa te lî ser derd û xemê
- 4 Er ne hudhud jî Seba bêt û wekî bayê Seba
Dê jî hîr ku bigelît destî ve peykê heremê
- 5 Pîrsiyari lî me bî, wer nexwe mehcûrê xerib
Dê lî kî 'erze bîkîm vê xem û derd û elemê?
- 6 Haşalîl-lahî ku bîkîm eşkere van xusse w derdan
Wer bîsojîm jî xemê 'îşqî tu ser ta qedemê
- 7 Me bî sehayê wisala xwe derin tu j'Xudê ra
Wer ne, weqt e ku bîbîn xerqeyê behra 'edemê
- 8 Jî gulistanî cemala te gulek bêze z'hûrê
Jî dînê dê bîçîtîn navê bîhiştî Îremê
- 9 Şerhî halê xemê 'îşqa te j'ku têtê nîvisîn?
Medhê ewsafê cemala te kuca tê reqemê

- 10 Wê mecalê ku cemala xwe tecella dıkırı
Lazım e secde bıbın ber te dı wê gav û demê
- 11 Secde bın ber te rewa ye d'hemi mezheb û dinan
Ki dıbt muşrik û kafır jı wê şêrinıfemê
- 12 Ger bıbım ber te sucûdê dı dema keşf û şhûdê
Mı lı dıl dê bıdırıt pertewê nûra qıdemê
- 13 (Qıbleti wechû ke fi kulli sebahin we mesa')
Bı du ebrûyê te cana dıxwarım ez qesemê
- 14 Mûyekı ez jı te nadım b'du sed Zin û Şêrinan
Çı dıbt ger tu hesêb ki mı bı Ferhad û Memê!
- 15 Te Fıring û 'Erebistan û Mecer têki standım
Celewi xweş vegerin, hatiye newba Ecemê
- 16 Ma j'diwanê seadet seh kırı şubhê "Mela" yı?
Tu bı navê mı gedayi bıkışine qelemê!

11. *FEM: Dev.*

13. *Mana beytê: Her sıbe û êvar, qıbla mın rûwê te ye.*

"BI ŞÛR EW TÊNE TALANÊ !"

- 1 Xema 'îşqê perîhtim ez
Hebiba xemrevî kanê?
Seraser têk behitîm ez
Jî derdê ferq û hicranê
- 2 Firaqa dilbera rend e
Behitîm her wekî fînd e
Musulmanek dî rê min de
Xeber bî balê sultanê
- 3 Xeber bî bal şekerxayê
Şepal û xwûb û zîbayê
Ku mir e belkî bir nayê
Esîrîk wê dî zîndanê
- 4 Esîr îm lîrîze yû tavê
Ne taqet vê ne perwa vê
Dî hebsa wê qe min navê
Bîkîm fîryad û efîxanê
- 5 Mî navêt ez bî fîryad kîm
Lî zulma dilberê dad kîm
Sehî dê şubhê Ferhad kîm
Bîdîm rûhê jî kovanê

- 6 Jı kovana te şêrinê
Dinalım şubhê goyinê
Dirêjım hêstirên xwinê
Weki tavyên dı baranê
- 7 Weki bırqa bıharê ez
Jı dest çeşmên xumari ez
Dıkım fıryad û zari ez
Meger carek ki ihsanê
- 8 Tu pur ihsan û xwey rehm i
Lı derwêşan abı xeşm i
Çı bitın ger bı niv çeşmi
Nezer ki tûlê astanê
- 9 Lı mın pırsek bı dıldarê
Dıbt hempayê didarê
Vewestayım dı ferwarê
Lı 'ebdê xwe ke fermanê
- 10 Dı fermanê vewest.
Dı benda xızmetê a
Weki goy bê ser û pa
Heman lê di tu çewkanê
- 11 Lı ber çewkan û kaşûyan
Jı derba Turk û Hındûyan
Dıbazım her weki goyan
Dema ew têne meydanê
- 12 Dema ew tên bı bazi tên
Dıgel qewsên Şirazi tên

Çı mûkar ın dı tazi tèn
Bı de'wa tène lêkdanê

13 Bı de'wa tèn me yexma kın
Dı amê şûr û xewxa kın
Sewaş û fitneyan rakın
Bı şîr ew tène talanê

14 Du talançi dı meşhûr tê
Jı me'den eyne kafûr tê
Dı têkil zulmet û nûr tê
Me kufrê di dı imanê

15 Me kufrê di dı islam bi
Jı şerqê zulmet û şam bi
Jı zulfan 'enberê xam bi
Kınarê xal û nişanê

16 Du zulfê 'enber efşanın
Du le'lê şekerestan ın
Du çeşmê sıhrê fettan ın
Dilê mın wan xedeng danê

17 Dilê mın wan xedeng lê da
Dı burca roz û şeb tê da
Lı Selwa mar livin pê da
Bı mesti hate seyrane

18 Lı Selwê mar bı lef latin
Dı burcan tip bı sef hatın
Jı batın tir bı xef hatın
Jı ber benda giribanê

- 19 Jı ber benda niqaba wê
Lı ber fetla 'isaba wê
Cemala mahitaba wê
Mı bedrek dı dı seywanê
- 20 Heyiv bû ew dı zulmatê
Dıxwum sondê bı ayatê
Ku nûrê da semawatê
Esed hat rasti mizanê
- 21 Qemer hat rasti perwinan
Jı bo xemlê şemal inan
Me nêrgız dın dı nesrinan
Dı nêv baxê gulistanê
- 22 Dı baxê min medam dıl tê
Cınesrı w sosın û gul tê
Bınefs û terh û sunbul tê
Çevin ser şubhê reyhanê
- 23 Lı dêmê sunbulan ser dan
Çevin ser sosın û werdan
Lı mahê 'eqreban ger dan
Dı ser da abı heywanê
- 24 Jı 'ışqê lew "Mela" xeste
Jı herfa badeyê mest e
Jı hoş û aqlı rest e
Lı der goşên dı meyxanê

"DI 'IŞQÊ ŞÊXÊ SANÎ ME"

- 1 Bî husna (ehsenit-teqwim) û zahîr sûretê zat î
Nezer di ('ellemel esma') û batîr 'eynê mîr'at î
- 2 Dî pa bûsa semensayê, mî nêrî bejn û balayê
(Le'elli eblux-ul esbabe, esbabes-semawati)
- 3 Jî vê teqwima insani, nezer da sîrrê subhani
(Fe hazel wechû min ecli, berahinin we ayati)
- 4 Ku nûra 'îşqê lami' det, lî tûra qelbê camî' det
Dî seyra (Berezex-ul esma', nihayatu bidayati)
- 5 Nişanên turre-tuxrayan dî wesfê zuhresimayan
(Lî 'inwanit-tecelli min beraat-il 'îbarati)
- 6 Dîlo wer seyri balayan, dî gulzara semensayan
(Biha tehtezzu banatun lena min meysi qamati)
- 7 Semaya cumle dêm-dur tê, bî i'caz ehlê sur pur tê
(Biha testeffu qamatun, bi 'idanin we nayati)

-
1. "ELLEMEL ESMA": Navan hin kir. EHSÊN: Baştirin.
 2. Ez hêvî dîkîm ku bigehijîm dora asiman.
 3. Ev rûyê han jî min re delîl û nişan in.
 4. BERZEX-UL ESMA': Astengiya navan. NÎHAYATU BÎDAYATÎ:
Dawî û despêk.
 5. Bo eşkerekirina nav-nişana jî nîvîsarên dî min ên herî fesih.
 6. Ku jî me re pê dilerîzîm, darê bananan (benav) jî bejna nazdara.
 7. Bejn, dîgel 'ud û nayan (aletên muzîk) rêz dîbîn.

- 8 Semayê rast û çep tinin, şemalên xasse hiltinin
(Fe ya lil-lahi fi meylati ha min 'etfi banati)
- 9 Bîbêjn xemze-elmasê bî zızmım bine şehkasê
Ku hel kît me'neyên asê, (Fe ya heyya lena hati)
- 10 Dîbînî nexmeya çengê, dema avêhte ahengê
(Bî qanûn wê dîxwûnît me, (li miadin we miqati)
- 11 Jî remzên xemzeçalakê, bî dîl dê bêne idrakê
(Meanin lem yese' hel-lefzu min deyq-il 'îbarati)
- 12 Jî nazîk dilbera nazîk, dî sehmê dî me i'cazîk
(We kem min xeşfi xızlanin, ehabet leyse xabati)
- 13 Ne tenha pêşberî yar in, jî emrê "KUN" xebêrdarin
(We men ehwa hu sarin fi mesari kulli zerrati)
- 14 (Huwel ewwel huwel axır huwez-zahır huwel batın)
Huwel me'budu wel meşhudu fi kullil huwiyyati)
- 15 Jî la şey-i, jî me'dûnî, me nasi sîrrê qeyyûmî
(Sucûdî fi turab-il mehwi min e'lel meqamati)

8. *Ey xwedê, dî bala wê de, rewşa dara benavê ye.*

9. *De jî mere hazin bike, vaye tēm.*

10. *Jî bo peyman û wext.*

11. *Manayên ku peyv û nivîsin têrî wan nakin.*

12. *Û çiqas şêrê daristanan jî beza xezalan dîtirsın.*

13. *Û ew kesê evîna wî digere dî gera tevê zerreyan de.*

14. *Ê pêşî, ê paşî, ê eşkere, ê veşartî, ê tê parêztin, ê tê yadkirin
dî tevê atmosferê de ew e.*

15. *Secdeya min dî xwelîya mihûbûnê de, jî cihê herî bilind e.*

- 16 Bixwe rindê xerabat ım, jı dêrê vê demê hatım
Çı hêvi hûn dıkm iro, jı vi rindê xerabati?
- 17 Dı 'ışqê şeyxê sani me, bı dıl behrê meani me
(Li zi hicrin we zi qelbin şifaun fi işareti)
- 18 Dı ıqlimê suxen ınir ım, dı şı'rê de cihangir ım
(We ye'lû mewkib-el 'uşşaqi e'lami we rayati)
- 19 Çı xweş nûrek zela i tu? dı qelbê mın şemal i tu !
(We qelbi heysu fih-il hubbu misbahun bi mışkati)
- 20 Teqada weh dıkr hıkmê, ku çerx û lewleb û bab ın
(Huwel feaalu la texter bi esbabin we alati)
- 21 Ezel 'eyni ebed yek an, dı deyyûmi dı qeyyûmi
Tenezzul têtê tefsîlê (bi anatin we ewqati)
- 22 Tealel-lah jı ihsani, bı dıldari bı dıl dani
"Mela" iro te kır paşa lı ser çehvên "Melê" hati.

-
17. Jı bo xwedî aqıl û qelban re, dı beyanên bın de şifa heye.
18. Ū nişan û alaya mın, komê (qefle) aşiqan bılind dıke.
19. Qelbê mın, jı ber cûnê, çıraya kulekê ye.
20. Ew e çêkîrox, bı alet û sebebên nexape.
21. Dı qasan û wextan de.

"ÇARÊ TU JI SER DÊMÊ HILÎN"

- 1 Ey nesimê seherê ma dî mecala sıbehê
Sed selaman bigehine jî me wê padişehê
- 2 Er'era qamet-elîf neyşekera şox û şepal
Nazîka simiten û xusrewê zerrîn-kulehê
- 3 Dî berî da tu bîbûsî bî du sed zarî yû lutf
Asitan û der û diwar û şîbakên kelehê
- 4 Nameya cewr û cefa û elem û derd û xeman
Dî, bî destê zerîyê, muhteşemê, serwisehê
- 5 Belku dilber jî rûyê adîlî yû merhemetê
Rehmkê kîr bî feqîran û bîpîrsît gîlehê
- 6 Heq dîzanîr dî şevan şubhetê avên dî rewan
Me bî dîl zarî yû kalîne heta subhegehê
- 7 Ma jî ber derb û fîraqa te sukûnek me heyê?
Cerg û dîl her du bî nalîne wekî çeng û jehê!
- 8 Perdeya xêlî yû çarê tu jî ser dêmê hîlîn
Da jî şewqa te bî xef bîr şefeqa mîhr û mehê
- 9 Dîn, eger bête beha, canî dîdîrîm, lê emma
Me hezar canê ezîzî dî hîlîtin dî behê

- 10 Qet dibîrî wek te şepalê ne dî Şam û ne dî Şerq?
Ki nişan da dî cihan muslê te xwundkar û şehê?
- 11 Alemek şehdayiya husn û cemala te dîdîr
Tu Zuleyxaya zeman i û çî hacet medehê !
- 12 Heq nîgehdarê te bîr padişeha serwîqedan
Bî kenarê me feqîran bîke carek nîgehê
- 13 Xûbî yû dilberî yû naz û telettuf bî te şên
Xusrewa padişehan i û xudana cebehê
- 14 Hecer-eswed bîdîrîrî destî ziyaret bîkîrîm
Nezrî mîn bîr bîgîrîm xwasi terîqa Mekkehê
- 15 Jî ezel heq bî "Melê" daye jî 'îşqê qedehek
Ta ebed mest û xerab in jî meya wê qedehe

DENGÊ TÎPA (٤ : Ê)

"BES KE XEDRÊ LI ESÎRAN"

- 1 Ey nesimê sîbehê ma dî mecala seherê
Sed selaman bîgehîni jî me wê lebşekerê
- 2 Nêrgîza nazîk û ter neyşekera mest û xamar
Dê mîdûr û le'lîleb û muhteşem û mu'teberê

11. MEDEH: Medh, pesîn.

12. NIGEHE: Nîhêrtîn. Kuzer.

13. CEBEH: 1) Cebîlxane. 2) Enî.

- 3 Bîsk û gêsû ji herir in, qeseb in turre û zulf
Te ji kafûr e beden, xalî ji mîskê teterê
- 4 Dêmi bedr û eniyê zulfî lî ser bûne helek
Erqeman helqe û ger dane lî dewra qemerê
- 5 Asitani yû şîbak û kulek û pencereyan
Da bî mîskîni yû zari tu bibûsî dî berê
- 6 Tozekê bin bî xwe ra ta bîkîrîm kuhlê beser
Lî terîqa qedema dilberê wê rehguzerê
- 7 Da bibîni senema mîn te bigîrî xwe bîde xet
Bîke telxîsê cewabê me jî vê muxteserê
- 8 Lew ku pur şefqe didêrî kerem û lutf û kemal
Ah jî dest remz û surên wê dur û gewher xeberê
- 9 Ma bî zehrê şekeri dostê bîxwûnî carekê
Erzihala ku nivîsî me bî xwûna cegerê
- 10 Qederek şefqe jî lutfî te temenna dîkîrî
Da me mehrûmî ne dêrî tu jî lutf û nezerê
- 11 Bî xwedê qet te dî dîl da jî Xwudê tîrsî nehî
Dîkîrî zulm û cefayê tu lî mîn vê qederê

Ev nîvîsara ku li jêr e, têbîniyeke di çapeka Diwana Melayê Cizîrî de, ku bi zarê erebî nîvîsandi bû, me wergerande kurdi.

AGAHDARÎ

"Ev qeside û ya li pey, di tevê çapên ku min dîtî de, xeletî û paşpêti çê bûbû. Ev rewş di maneyan û nîvîsaran de zorî û nexweşiyê peyda dîkîr. Me rabû beytên wan li gor sererastkirin û daxwaziya maneyên wan li hev û din anî".

- 12 Ez bı wê qamet û bejnê lı te sondê dıxwırım
Bes ke ey padişeha mın lı esiran xederê
- 13 Jı ber ahên me dinê ağır û dûd bıt ne 'eceb
Me dı dıl da heye narek ku disojit seqerê
- 14 Ne bûyine ne dıbm wek te şepalê dı cihan
Ki diye mîslê te simin-ten û zerrin-kemerê?
- 15 Paşi wan gezmeyê çehvên te "Mela" pê kuştiye
Ma xedengın dıkırın qet lı me êdi eserê?

DENGÊ TÎPA (٢ : Ê)

"KUŞTIM BI DERBA XENCERÊ"

- 1 İro jı nû pur ateş ım
Disa jı remza dilberê
Mecrûhê qewsê pur weşım
Tir dane niva cegerê
- 2 Tir dan jı qewsê eswed e
Şehzadeya şêrin-qed e
Kuştine wek mın deh sed e
Wê padişah û beglerê
- 3 Wê beglerê pur kuştine
Enguşt bı xwûnê rıştine
Ma ehlê dıl qet hıştine?
Sohtine mîslê micmerê

- 4 Lê ez tinê ser ta qedem
Yekser dısojım dem bı dem
Wesfên dı 'ışqê ez çı dem?
Nayên hesab û defterê!
- 5 Wesfên evin û ısq e hê
Husn û cemala wê şehê
Nayêne şerh û medehê
Ehsen jı neqşê beşerê
- 6 Ehsen jı husna dêm-durê
Şêrini yû guft û surê
Sed zahıd ê xıstın jı rê
Wê nazık û leb-şekerê
- 7 Şekker dı nêv lêvan e wê
Reyhan lı dor sêvan e wê
Meş'el dı nêv şivan e wê
Tisi jı rengê fenerê
- 8 Fener'niye, nûra heq e
Husn û cemala mutleq e
Berq e sıpide w şefeq e
Zuhre û şemsa xawerê
- 9 Zuhre û mah û muşteri
Mın dın lı dêmê enweri
Zulfa muselsel enberi
Ser daye hewza kewserê
- 10 Hewza jı kewser çeşme tê
Ya cıh dı rewza qudretê

Her dem ji nû wê ser de tê
Xemri yû tayên er'erê

11 Xemrê dî reş zulfa herir
Wer bûn lî dor bedra munir
Burca ku hakîm lê du mîr
Mîn dîn lî textê kîşwerê

12 Textê dî mîr û begleran
Meydanê coqa goy-geran
Eslan û cotê mey-xuran
Mey dan şeraba saxerê

13 Saxer bî dest serxweş û mest
Weqtê sehergeh dest bî dest
Xeflet du begler meyperest
Kuştîm bî derba xencerê

14 Kuştîm bî derba keyberan
Gezme w xedenga awuran
Remz û îşaret û suran
Dan dîl jî nî pincerê

15 Dan dîl jî ber nusna bî nûr
Berqa tecella ya sudûr
Lew sohtiyem wek kohê Tûr
Hubb û evîna enwerê

16 Hubba te, ma xweş hîştîme?
Her roj jî nû ez kuştîme!
Yekser jî xwûnê rîştîme
Tîr û xedengên mecerê

- 17 Gezmên dı şêrin-nazîkê
Derbên dı wê rîmbazîkê
Çûyîne nêv dıl gazîkê
Mın, dad jı zulma dilberê
- 18 Dilber çı bê hed zalım e
Carek ne kır pursê lı me
Lazım bı halê alım e
Lê pur dîdêrıt xederê
- 19 Lazım bı qetla mın dîvê
Hêj ev dı dıl marê şevê
Peykan dı cergê da çevê
Bend kır bı şewka enberê
- 21 Remz û surên şêrin-leban
Tiroj û berqên kewkeban
Rêza muselsel eqreban
Ger dan lı dora qemerê
- 20 Bend kır kulab û penceyan
Dıl ma dı nêv işkenceyan
Mın ah jı dest wan xenceyan
Kûk û kubarên din berê
- 22 Mın din lı dor bedra tamam
Herfên dı mektûb dal û lam
Wê pêşrewê batın revam
Yexma kırım simin-berê
- 23 Siminbera ney-şekeri
Ew horiya nısbet peri

Bejna şêrin dêmê zeri
Bu ji gulab û mawerê

- 24 Bû mawer û şêrin-lebê
Wê xwûb û nûrin-xebxebê
Bedra dî burca eqrebê
Kengê ji ber perdê derê?
- 25 Bedra ji qudret lê du nûn
Ew qatîla eswed-'uyûn
Pur rakırın wê qetl û xwûn
Alem perıht, yexmakerê
- 26 Her dem bî zulmê weh d'soji
Qelbê ji hubba tey teji
Lazım dıbêm mın dê kuji
Kes nine çitın mehderê
- 27 Kes nine ret mehder bıktı
Bes gırtıyan ebter bıktı
Xemlê ji zêrê zer bıktı
Şefqet lı yek ta bı derê
- 28 Şefqê bı didarê xwe kıt
Qesta bırındarê xwe kıt
Şehidê reşmarê xwe kıt
Ê ser lı fetla pışterê
- 29 Fetlên siyah marê şevin
Reyhan bı dor ser wan çevin
Axır bı selwê da revin
Xef bûn dı tayên çenberê

- 30 Xef bûn dî nêv tûra qızıl
 Îlan misalê ser lî mîl
 Kuştin û jehr avê te dîl
 Hêj kuştîyên remza berê
- 31 Kuştine em şêrin-lebê
 Tehli keşin roz û şebê
 Ger ez bîbinim ew b'xwe bê
 Nakim jî dîl hêj bawerê!
- 32 Ew nazîka nîsbet gulê
 Camek jî kewser da "Melê"
 Mest ım jî ber qal û belê
 Hetta bî roja mehşerê

DENGÊ TÎPA (ى : 1)

"ŞEHÊ KURDISTAN"

- 1 Latê husnî û şehê xubanî
 Bî xwe hem xanî û hem xaqanî
- 2 Yûsîfê sanîy tu iro xanîm
 Ku bî husna xwe ne dêrî sanî
- 3 Bî sur-heybet û sehmê xwe perî
 Bî te şênîtlî butan sultanî
- 4 Bî tebîlxaneyê şahî were text
 Ku tu iro şehê Kurdistanî

- 5 Kakulê berde b'ser xal û xetan
 Ku muselsel binumêt reyhani

- 6 Îsmê e'zem te divê çıl ismi
 Jı du herfan bı mu 'emma zani!

- 7 Çı berat bû weh bı ser da kakul?
 Çin bı çin misk bı tu xra ra ani

- 8 Te çı hacet bı Suleymani? husn
 Xatemek le'l e bı gewher ani!

- 9 Çı xet eşkeste musulsel ya Reb?
 Ku te pê nesix kırı diwani

- 10 Gerçi pur xal û nişan i, emma
 Bı "Nişani" ku tu bê nişan i

- 11 Ey peri horisırışt i her çend
 Bı beşer ademi yû insan i

- 12 Surrê subhan te j'husnê dı numêt
 Ehsenel-lah jı sura subhani

- 13 Çı hedê 'eql e qiyasa te k'ırıt?
 Ev e burhan, ku tu bê burhan i

- 14 Me temenna j'nesim, xakê reh e
 Pê bıkm dide û dıl nûrani

- 15 Nefesek bête, me nayê billah
 Ne tinê rûh i, tu rûh û can i

- 16 Sed hezaran j'te peykan dî dîl in
Lê lî ser wî me tinê derman î
- 17 Te birinên me kewandî disa
Jî nû agir te lî daxan dani
- 18 Te "Mela" pur d'ceger gezmene, lew
Weh perişan î û pur êşan î

DENGÊ TÎPA (٢ : Ê)

" DINYA BÛ MIJ Û XEMAM "

- 1 Vê firqetê ebter kîrîn
Feryad jî destê firqetê
Jar û zeif û zer kîrîn
Feryad jî destê firqetê
- 2 Pur zêr kîrîn wek zêrî mam
Çehvên dî lutfê pêrî mam
Daim lî rê çavnerî mam
Feryad jî destê firqetê
- 3 Çavnerî reftara te bûm
Muştaqê gulzara te bûm
Lew dûr jî didara te bûm
Feryad jî destê firqetê
- 4 Dûr bûm jî wê reft û çenê
Wan 'îşweyan guft û kenê

Nayê bı çehvan mın dinê
Feryad jı destê firqetê

5 Dunya bı mın mij bû xemam
Xew ji lı çehvan bû heram
Umrek bı vi halê he mam
Feryad jı destê firqetê

6 Saet lı mın têk salı bûn
Daim lı ser dest falı bûn
Herfên dıhatın dalı bûn
Feryad jı destê firqetê

7 İro tinê der hat elif
Me'na dıçû bejna şerif
Ya xar e lê kêmxe w qedif
Feryad jı destê firqetê

8 Vê firqetê pur dıl şewand
Cerhên qedim disa kewand
Şişên dı sor tê da tewand
Feryad jı destê firqetê

9 Daxên me disa reş kırım
Yek yek ji nû ateş kırım
Lê zêde pênc û şeş kırım
Feryad jı destê firqetê

10 Sewda û sews û gêj kırım
Pur her dı dıl xwûn rêj kırım
Çendan weh bûm lê hêj kırım
Feryad jı destê firqetê

- 11 Billah jî nal û zariyan
Gezmên dî wan xummariyan
Xew nakîrîn şevtariyan
Feryad jî destê firqetê
- 12 Şev bû dîne çeşmê me da
Hetta beşîr mîzgîni da
Dê bê seher şahê geda
Feryad jî destê firqetê
- 13 Mîzgin ku da min ev qeder
Rûhê şêrin min hate ser
Xeylek lî min rohn bûn beser
Feryad jî destê firqetê
- 14 Rohn bû bî didarê te dîl
Bû xerqê enwarê te dîl
Naret jî ferwarê te dîl
Feryad jî destê firqetê
- 15 Mînnet me dîldarê xwe di
Disa jî nû yarê xwe di
Sultan û xundkarê xwe di
Feryad jî destê firqetê
- 16 Reşkakulê sunbul çevin
Mînnet me disa xem revîn
Nû bûn lî dîl hubb û evîn
Feryad jî destê firqetê

- 17 Derdê xedar bê m firqet e
Fırqet jî can pur zehmet e
Ya sehl ku aşiq rih dite
Feryad jî destê firqetê
- 18 Narê firaq û sohtinê
Êşa xedengê nuhtinê
Pîrs kîn jî 'uşşaqan tinê
Feryad jî destê firqetê
- 19 Aşiq ew in her dımırin
Çend yek dî remzên dilber in
Keyber lî dîl mîn bêhtir in
Feryad jî destê firqetê
- 20 Ya Reb bî didarê xwe ki
Mîn wasilê yarê xwe ki
Bes sohtiyê narê xwe ki
Feryad jî destê firqetê
- 21 Me j' dostê satek dûr ne ki
Perkende û mehcûr ne ki
Disa jî nû dîl hûr ne ki
Feryad jî destê firqetê
- 22 Xaka riya dilber "Mela"
Bîkşîn dî çehvan wek cela
Didarê qismet bû hela
Feryad jî destê firqetê

"XEWNA ME"

- 1 Der heqq me bî şîrê xwe me ke teqsirê
Ya bîr dî şuxla me (dê) bîki te'xirê
- 2 Tuxrayê humayûn ku dîkîn turrey emr
Zulfa te ye anîn jî xeta tehrirê
- 3 Husna te nîzanîm bî çî teşbih bîkîm
(Fî ehzeni teqwîm) lew hatye tefsirê
- 4 Surra te l'dêm ayetê kubra ye neşîm
Lê d'neql û riwayet dîkîrîm texpirê
- 5 Ger qelbê heqîqet niye, yek car, çîra
Îşqa te kîrîm zêr û zeber îksirê?
- 6 Ma qudretê def' heye wer şêr Eli bîr?
Lamî' ku bîdîrî saiqeya teqdîrê
- 7 Bê qudreti tu quwwetê mexlûq çî kîr?
Memn'û e lî nîk 'eqî ku bîkîrî te'sîrê
- 8 Ney bestê tîlîsmê me b'sed xane bîret
Qadîr heye arîf bîkîrîrî teqrîrê
- 9 Ber dîlber û leb ber leb û endamê l'yek
Xewna me bî yarê bîdîrî te'bîrê

- 10 Zate j'wucûda me sebeb wê tu d'zani
Nayête hesabê feleka tedwirê
- 11 Ateşperesê wadiyê 'ışq m 'eceb
Dinar-peresi wê dıbrın tekfirê?
- 12 Mihrabê du birhên te bıbinıt arıf
Niyet çı bı cih têtı dema tekbirê?
- 13 Zanım te çı mızraq vıdıl keftiye lê
Carekê go: Tu yi hêj dı debên tirê?
- 14 Teqdirê ku hukmê lı "Melê" cari kıt
Qet kes heye mumkın bıdıtê texyirê?

DENGÊ TÎPA (٢ : Ê)

"ŞI'RA ME ÇÛ MAÇİNÊ"

- 1 Mızgin jı me ra bêtı jı surşêrinê
Canê xwe yê şêrin dıdırım mızginê
- 2 Sed Çin dı xwe da gırıtiye zulfa te b'çin
Şı'ra me weh heq lew çû heta Maçinê
- 3 Neqşên felekan guh dıdırın vê nezmê
Tenha ne beşer her dıkırın tehsinê

- 4 'Işqê jî Xwudê da tu bixwazi jê ra
Ger dê li neyarek xwe biki nifrinê
- 5 Yek secde tinê ferz e di dinê 'Işqê
Bîn ber qedî yarê di mecala dinê
- 6 Aşiq ku bi dîl fatiheyê 'Işqê xwend
Ayatî yekayek dîkîrî aminê
- 7 Me j'le'l-lebê yarê xwe v'xwar avî heyat
Exyarî bîla têkî bîçîrî darîne
- 8 Lazîm bî xwe ayîney Rûhul-quds î tu
Lew kes nedîne horî bî vê ayîne
- 9 Caîz bîte "min heysu beşer" nîsbetdan
Bîhn û şefeq û nazîkiya nesrîne
- 10 Ev reng fesahet jî beşer sîhrî helal
Î'cazê beyan anîye ber tedwîne
- 11 Da nale w ahên me jî dîl seh bîkîrî
Wer guh bîde hîndavî serê balîne
- 12 Ferhad dîzanî, tu jî Perwîzî me pîrs
Etwarê xemî 'Işq û sîra şêrîne
- 13 Bê nuqte nîhmî dayre îhsan ke "Mela"
Dewwarî çî kîrî daîreya tekwîne?

10. TEDWÎN: Sazkîrîn. Cîvandîna helbestan di diwaneke de.

11. BALÎN: Balgî, baliv.

DENGÊ TÎPA (٤ : Ê)

"DI VÊ DEWRÊ BI VÊ TEWRÊ!"

- 1 Jı mabeyna du ebrûyan, dîbinım qabêqewseynê
Tealellah binê remzê, çı reng avête mabeynê!
- 2 Jı qewseynan dîbarın tir dı cengê da muheyya ne
Muleççi ne binê iro, xetê nazık lı mebaynê
- 3 Binê nûnên lı ser sadan, ku katıb goşe lê badan
Seraser Qafı ta Qaf e, rımûza hikmetul 'eynê
- 4 Beqa nın jı bo tışti, heta kengê bıkın pışti?
Dı 'ışqa wan perirûyan, werın dunyayê da deynê
- 5 Bı berqa şır û elmasan, bı tirêjên dı şehkasan
Seraser ehlê dunyayê disoji terfet-ul eynê
- 6 "Mela" billah dı vê dewrê, bı vi rengi bı vê tewrê
Nişan da wek "Nişani" kes deranın dur jı behreynê?

DENGÊ TÎPA (٤ : Ê)

"BI ROJÊ RA TÛ HEVDENG Î"

- 1 Sebahul xeyrı xanê mın
Şehê şêrin zebanê mın
Tu yi rûh û rewanê mın
Bıbit qurban te canê mın
Tealellah çı zat i tu
Çı wê şêrin sıfat i tu

Ne wek qend û nebat i tu
Yeqin rûh û heyat i tu
Heyat û raheta canım
Sebahul xeyri ya xanım
Were binahiya çehvan
Bîbinım bejn û balayê

- 2 Sebahul xeyrî mesta mın
Letifa cambıdesta mın
Xu mar û meyperesta mın
Tu yi meqsûd û qesta mın
Jı meqsûdan tu yi bes mın
Bîbın ber çerxê etles mın
Jı xeyrî te nevêt kes mın
Bı reştûzên muqewwes mın
Dı benda zulfê çewkan ım
Sebahul xeyrî ya xanım
Were binahiya çehvan
Bîbinım bejn û balayê

- 3 Jı wê zulfê jı wê bendê
Reha bım lê jı peywendê
Siyeh çeşmê sıpi zendê
Te suhtım şubhetê fındê
Şubê şem-'û şemal ım ez
Jı ber hubba te lal ım ez
Zeif ım wek hilal ım ez
Sifetgoyın dıkalım ez
Ve bulbul ra bı efxan ım
Sebahul xeyrî ya xanım
Were binahiya çehvan
Bîbinım bejn û balayê

- 4 Ve bulbul ra şev û rojê
Lı ser wê terh û bışkojê
Eni mahê şefeq rojê
Te suhtım şubhetê dojê
Ku dūr ım ez jı wê horê
Tınê carek lı ser sūrê
Jı wadê eymena Tūrê
Tecella kır dı nêv nūrê
Jı wê suhti dıl û can ım
Sebahul xeyrı ya xanım
Were binahiya çehvan
Bıbinım bejn û balayê
- 5 Jı husna wê tecellayê
Yedê beyda û balayê
Çı wesfan bêm xeber nayê
We lê dıl cezbeyê dayê
Ne hışyar ım jı wê berqê
Jı zertacê lı ser ferqê
Sıpidê da heta şerqê
Belê naêxımê ferqê
Jı derbê 'ışqê nalanım
Sebahul xeyrı ya xanım
Were binahiya çehvan
Bıbinım bejn û balayê
- 6 Zerifê nazıkê şengê
Sifethorê perirengê
Bı rojê ra tu hevdengê
Du reştûzên siyeh-yengê
Kışandın lê ne wek caran
Xedengên qewsê nûbaran

Jı rengê şîr û mûkaran
Reşandın sine wek baran
Jı wê derbê pur êşan ım
Sebahul xeyrî ya xanım
Were binahiya çehvan
Bîbinım bejn û balayê

- 7 Veke carek xet û xalan
Lı ser wan mesned û palan
Bıxwûne lê me 'ebdalan
Bîbinın id û sersalan
İcazet di me destûrê
Perirengê sifet-horê
Jı nîva zulmet û nûrê
Bînoşın mey dı ferfûrê
Jı dıl talanê xalan ım
Sebahul xeyrî ya xanım
Were binahiya çehvan
Bîbinım bejn û balayê

- 8 Jı şehkasa ku qerqef tê
Meya nûrin muşerref tê
Nişanek dilberê kef tê
Jı bo mın her seher xef tê
Jı wê camê dînoşım ez
Seher lew ney lı hoş ım ez
Jı amê lê dîpoş ım ez
Bı can her lê dîkoşım ez
Ku xalib mest û sukran ım
Sebahul xeyrî ya xanım
Were binahiya çehvan
Bîbinım bejn û balayê

- 9 Were pêşber "Melayê" xwe
 Şehid û mubtelayê xwe
 Bî şefqet ke liqayê xwe
 "Mela" nemrît bî dayê xwe
 Mesiha yi lî bimarên
 Kesên gezti du reşmaran
 Şehidên şîr û mûkaran
 Kiri amancê nûbaran
 Lî didara te heyran im
 Sebahul xeyrî ya xanîm
 Were binahiya çehvan
 Bîbinim bejn û balayê

DENGÊ TÎPA (٢ : Ê)

"SEFERA ŞAM Î ÎRAQÊ"

- 1 Senema sur jî semed şewqê jî heq daye wucûdê
 Ger Ezazilî bîdita ne dîbîr xeyrî sicûdê
- 2 Xerqî bûm ez dî xema 'îşqê dî wextê seherê bû
 Ku tecellayî cemalê lî misalî beşerê bû
 Ne jî lewnê beşeran înnî diye lê dêmê zeri bû
 Ez dibêm: Rûhî-qudus bû bî xwe, ya hor û peri bû
 Lew bî husn û nezerê remzek jî sırî qederê bû
 Xemrîyên seyri lî dêm helqê lî dora qemerê bû
 Sed xedeng dane ceger sine jî derbê bî keri bû
 Lî me êş û eleman zêde jî tira Qeçeri bû

9. BÎMAR: Nexweş. Bêkas, bêhal.

2. QEÇER: Navê eşîreka Moxîla ye. Xweşbez. Bîpê.

Dıl ji me bûye pelek can û cesed têk seqeri bû
 Lew me şeb ta bî seher naliye wek muxni yû 'ûdê
 Senema sur ji semed şewqê ji heq daye wucûdê
 Ger Ezazilî bîdita ne dîbîr xeyrî sicûdê

3. Nezerek wê beşerê leb-şekerê horisiriştê
 Nadırım ez bî mey û kewser û horên dî bîhiştê
 Ê diye ew bixwe carek dî 'ecêb im ku bî hîş tê!
 Te ji wan qews û kevanan çî xedeng in dê bîweş tê?
 Ew e mîn şafiyê derdan. me çî hacet bî nîviştê?
 Ger bîkît husn û cemala xwe tecella dî kenîştê
 Dîbîtin Beytîqûdus ehlê ziyaret ji Hebeş tê
 Sine putxane ye iro me ji mîm û qed û qîştê
 Bî dilê sade çî kîm ez ku tecella ne gehîştê
 Ew e mîn qibleyî cebhet dî qiyam û dî quûdê
 Senema sur ji semed şewqê ji heq daye wucûdê
 Ger Ezazilî bîdita ne dîbîr xeyrî sicûdê

4. Qibleya ehlê dîlan ger bîkîtîn keşfî cemalê
 Ya tecella ke ji ber tac û peran qewsê hilalê
 Ki bî dîl kafîr e ê secde nebit cebhet û xalê?
 Ya nedît şehde bî ayatê dî wê weqt û mecalê?
 Leyletul-qedr e bî mîn ew seet, û id e dî salê
 Şefqe kîr perde hîlani seherê şox û şepalê
 Eyisand dê me ji enwar û surê şubhê şemalê
 Meşîha mest û şeker-leb bî me da mey ji peyalê
 Negîham secde bîbîm pur xecîlim ez ji wisalê
 Senema sur ji semed şewqê ji heq daye wucûdê
 Ger Ezazilî bîdita ne dîbîr xeyrî sicûdê

4. (rêz 7): Dî hînek çapan de wîha nîvîsî ne:

a) "Eyisandîm ji enwar..."

b) "Eyisandîm û ji enwar..."

- 5 Rohniya çeşm û çıraya me, nizam hêji dî bir ım?
 Ku dî zindan û hebıxaneyê wê bend û esir ım!
 Jı xedengên Qeçeri sine teji gezme û tir ım
 Dıl dî nêv helqeyê zulfa siyeha bû jı 'ebir ım
 Têk perişanê lef û şitri yû tayên jı herir ım
 Tu heyî mın dî dînê, lew dî dînê begler û mir ım
 Zêr û mal er çı ne dêrım, te dîdêrım ne feqir ım
 Jı evina te şepalê dî şevan şubhê nedir ım
 Jı lebê le'le şekerbari te wek şekker û şir ım
 Me jı ser ta bî qedem sohtine wek ateş û 'ûdê
 Senema sur jı semed şewqê jı heq daye wucûdê
 Ger Ezazilî bîdita ne dîbır xeyrî sîcûdê
- 6 Bê hisab şox û şepalê lı "Melê" qehr û xeder kır
 Ne me anine xıyalê, ne lı halê me nezer kır
 Qet nekır şefqê, libasê xezebê zêde dî ber kır
 'Illeta cewr û cefa û elemê cih bî ceger kır
 'Ellılandın dî firaqê, sitemê sine bî ker kır
 Ahi hetta mırnê ev jı me ra dax û keser kır
 Sefera Şam û Îraqê lı me xweş lazım û fer kır
 Bı me da jehr, û reqıban dî devı şehd û şeker kır
 Em bûyin pêt û pereng, lew jı wisalê me hezer kır
 Nazık û ney-şeker û xûb û şêrin-qedd û xudûdê
 Senema sur jı semed şewqê jı hed daye wucûdê
 Ger Ezazilî bîdita ne dîbır xeyrî sîcûdê

5. NEDÎR: *Agirê ser çiya.*

6. XUDÛD: *Dêm. Kortık.*

"ME SERÎ DANÎYE RÊ"

- 1 Senema sur ji semed neyşekera leb ji nebat
Ehsenel-lahû tebarek ji sura wê senemê
- 2 Enwera rengê firîşte beşera horisirişt
Ya ji miskî Xetenê xal û xet û kakul û gîşt
Ger xwe nişan seqerê dît dîkîrî horê bîhişt
Ke'beya tê nebit ew putkede ye w dêr û kemîşt
Ku nesib da ji ezel heq ji me ra 'îşqê newîşt
Feyde nakin lî me ism û ne tîlîsm û ne nîwîşt
Zahîrî da me 'ezabek weh ku batîn ve bîhişt
Suhtînê daye hînavan û ceger têki bîrişt
Qesdî weslê me bî can kîr ku vedayîn û nehîşt
Dest nehêlîn ji teleb ger me dî rê çîr ser û tîşt
Pîştê nadeyn du hezar xencer û tir û rîm û xîşt
Me serî daniye rê û bî Xwudê bestîye pîşt
Ew e mîm rûh û heyat û ew e mîm qibleyî zat
Senema sur ji semed neyşekera leb ji nebat
Ehsenel-lahû tebarek ji sura wê senemê
- 3 Zeriya dêmi-dur û leb-şekera 'îşwe-perî
Ya ji ser ta bî qedem têki ji 'eyban e berî
Jî sera perdeyê lahûti bî sed şîwe gerî
Bête ber 'eynê şîhûdê dî libasê beşerî
Haşe lillâh tu kesan dê bîtin ev rengê zeri?
Daye ber qend û nebatê ji du le'lên şekerî

2. *FIRÎŞTE*: Milyaket. *NEWÎŞT*: Nîwîşt. Nîwisand.

3. *LAHÛT*: Xwedayi, ilahî.

Bê tu ya leb-şekerê ya tu nebata teberi
 Ellah Ellah çî tecella ye jî sirra qederî?
 Haciyan sîlsîle bestine lî dewra qemeri
 Dûri Beytê jî sefa têne semaya seheri
 Bê muruwwet ku du miran jî surê mey dî seri
 Ew nehêlîn çîn tewafê û ziyaret Heceri
 Zemzem û xulxule û 'Umre û id û Erefat
 Senema sur jî semed neyşekera leb jî nebat
 Ehsenel-lahû tebarek jî sura wê senemê

- 4 Mîn bî dîl suretê can dî jî butan ew bî tenê
 Ew tenê serwa rewan dî jî zerifên çimenê
 Sosîn û sunbul û gul çerx e lî dora semenê
 Xemriyan helqe û çîn dane jî mîska Xatenê
 Ser dîdîm çeşmeyî heywan û bî zîmzîm dîrenê
 Lê çî şîrani ye Ellah te jî wê keft û çenê?
 Ez dîbêm bedr e bî dêm lê dîkîtîn guft û kenê
 Ya yeqîn roj e lî şerqê û şefeq daye dînê
 Xelîtim Ruhi-qudus hatiye nêv wê bedenê
 Dîkît îhyayê mewatan bî sur û reft û çunê
 Te nehîn bawer û îman nezerê dê û bînê
 Çî tecella ye bûyî qible melek rû dîdînê?
 Azerî ger bîdiya hûr dîkîrîn lat û menat
 Senema sur jî semed neyşekera leb jî nebat
 Ehsenel-lahû tebarek jî sura wê senemê

- 5 Nêrgîza mest û şêrin û gul û nesrîn e jî reng
 Şeker û lu'lu'yê mensûr û bî dîl ahen û seng
 Me jî ber derbê evîne bûye dîl pêt û pereng
 Lew me şeb ta bî seher naleye wek muxnî yû çeng
 Da me sed rengê 'ezabê û nehat der jî me deng
 Hestîyan gîrtîye nasûr û meji da heye jeng

Lew ne hişyar û xumar in, me ne xwari mey û beng
 Lı me iro du kemendarê Hebeş hatine ceng
 Têne qetla me dı destan du siyeh qewsê jı Yeng
 Diresînin me û tèn me du hezar tir û xedeng
 Cegerê kun dıkın û tê dıbihın mıslê tıfeng
 Mıslê wê kafır û zalım qe dıyin kes dı Fireng?
 Nazık û xûb û şekerxend e û şêrin-herekat
 Senema sur jı semed neyşekera leb jı nebat
 Ehsenel-lahû tebarek jı sura wê senemê

- 6 Dı riya dostê "Mela" yek cihet û sadedıl in
 Me heta can heye haşa jı teleb dest bı hılın
 Ya dı rê ser bıdırın ya bı muradê wesıl in
 Me çı perwayê rımên ber weşê şırên kızıl in?
 Ta ebed mest û hılak in jı şeraba ezel in!
 Jı cefa û sitema wê jı ceger pur dı kul in
 Perdeya goşe-qeseb lê tu jı ser dême hılın
 Ku dı şerqê meh û xurşıdı jı şewqê betılın
 Lew jı sur surme dıdêrın û ne muhtacê kıl in
 Mest dı nêv tûr û lefan marê lı selwê fıtlın
 Surmedarın jı surê mestê jı qedret kemmılın
 Me jı xeflet du jılha dın û jı sehmê xeccılın
 'İşweker şiwenumaya me jı wê rûh û heyat
 Senema sur jı semed neyşekera leb jı nebat
 Ehsenel-lahû tebarek jı sura wê senemê

4. AZER: Apê İbrahim Pêxember.

6. QESEB: Hevrişım.

"HÊJ NABIRIM QET HÊ VÎYAN"

- 1 İro me di weqtê seher
Ew dilbera sundus dî ber
Disa dî lebsê sor û zer
Nûrek munezzeh bû beşer
Bîskên siyah xalên dî qer
Reşkakulê zulf çûne ser
Eswed bû daim secde ber
Mîn bestî 'eqda niyetê
- 2 Xeflet bî sur da mîn nezer
Mîran bî qetlê kîr xeder
Tîr dane dîl şahê mecer
Bê mîrwet amanc kîr ceger
Feryad û efxan sed keser
Wesfan neşîm lê ev qeder
Zanîm ku roj bû hate der
Subhan jî şahê qudretê
- 3 Subhan jî te şahê celal
Hostayê pur qudret lî bal
Xasma te dayê ev cemal
Dême jî qudret xett û xal
Kîfş bû dî qewsê da hilal
Vêra mî di bedra kemal
Lê bûn niqab çewkan û dal

2. MECER: Rêça kadûz. ŞAHÊ MECER: Roj.

Wan yek bî mesti daye pal
 Lê seyyırı bayê şimal
 Pêçane ser nûra zela
 Qet kes dıyın ev reng-misal?
 Mu trib were weqte w mecal
 Zaze bî nayêra binal
 Saqi werin xemra helal
 Carek jî ser dêmê vımal
 Zulfên lî dora cebhetê

- 4 Zulfên mu'enber kakul ın
 Biskên siyah reng-sunbul ın
 Ta ta bî dav dav fitilin
 Çin çin bî mesti sılsılın
 Bayê nesim têt meyyılın
 Wê gest e xala filfılın
 Ebleq jî qudret xemmılın
 Wê buxçeyê gul kemmılın
 Tê 'endelib û bulbul ın
 Roj hâte burca sunbulın
 Xeflet me di lew xeccılın
 Mehrûm û mehcûr dıl kul ın
 Mecrûhê tirên kızıl ın
 Rehmê ke pur sohti dıl ın
 Vê perdeyê carek hılın
 Bavê niqaba zulmetê
- 5 Pîrsê lî mîhrdarê xwe ke
 L'meczûb û haldarê xwe ke
 Bes qehr û azarê xwe ke

3. ZAZE: Ey saz. zaz, saz.

Qesta bîrindarê xwe ke
 Şefqê bî didarê xwe ke
 Têk xerqê enwarê xwe ke
 Lê emr û ferwarê xwe ke
 Şehidê nûbarê xwe ke
 Gestiyê reşmarê xwe ke
 Le'lê şeker-barê xwe ke
 Bî lefz û guftarê xwe ke
 Dermanê kuldarê xwe ke
 Lê keşfî esrarê xwe ke
 Mexmûrê xummarê xwe ke
 Heyranî reftarê xwe ke
 Kuştîne tira muhbetê

- 6 Wer ser de carek kuştîyan
 Extermeyên wan yengîyan
 Berde bî mîl da xemriyan
 Ba det seher reyhaniyan
 Daxên şehid û sohtiyan
 Danine lê wan tûliyan
 Ku j' mu 'ciza xummariyan
 Rûh bête disa ser giyan
 Hêj nabîrîm qet hêviyan
 J' wan şefqe û dildariyan
 Billah jî nal û zariyan
 Derba fîraq û bîhriyan
 Teşbihê tutakên çîyan
 Xew nakîrîm şev-tariyan
 Lê hêj dîxwazîm şukriyan
 Çendi ku rû dîm qîbletê

6. *EXTERME: Dil, hê sir. Çoleçira, gûstêrik.*

7 Çendi dinê bit her hebi
 Alem dı ber hukmê te bi
 Herçi divê te her we bi
 Lebsê te kêmxe w xare bi
 Daim bı remz û 'ışwe bi
 Şubhet gula her xunçe bi
 Wê buxçeyê xar tê ne bi
 Ageh jı 'uşşaqên xwe bi
 Çêşmek lı ehwalê me bi
 Derheq me lê bê perde bi
 Saxer medam pur bade bi
 Pur şefqe û xweş-me'de bi
 Bıhtır bı rehîm û şefqe bi
 Pêş ber te da perwane bi
 Mexmûrê çehvên şehle bi
 Sotine narê firqetê

8 Derdê xedar bêm firqet e
 Firqet jı can pur zehmet e
 Aşiq mırım her saet e
 Ya sehli aşiq rûh dıte
 Lê dilber ev reng adet e
 Herçi dı bendê da kete
 Ewwel dıdıt pê ulfet e
 Zewq û sefa û subhet e
 Gavek ku ew vêra rete
 İnca jı nageh xeflet e
 Şirê cefayê lê dıte
 Ellah çı wê bê mirwet e
 Rehmê bı aşiq nabıte
 Wê qest e can yexma kîte
 Hetta ku dıl qenc jê bite
 İnsaf jı mehrûyan ne tê

9 Yar qest e can yexma kırıť
 Da mu'cizê peyda kırıť
 Remzek ji reng 'İsa kırıť
 Ya sıhrê Bu Sina kırıť
 J'ew le'lê şeker-xa kırıť
 Disa şehidan rakırıť
 Van koleyan aza kırıť
 Carek xeriban şa kırıť
 Rasti yedê beyda kırıť
 Miskê dı cerhan dagırıť
 Da xweş bıkıť ihya kırıť
 Şefqê ke ya Reb da kırıť
 Reşkakulan ta ta kırıť
 Sed helqe çin çin ba kırıť
 Hemyan lı dêm tuxra kırıť
 Emrê humayûn ser me tê

10 Aşiq divê dıl sade bıt
 Xaka riya yarê xwe bıt
 Sed dax dı dıl wek lale bıt
 Xwûnê bıxwut reng-xunçe bıt
 Wê can fida şubhet me bıt
 Lê j'emrê yar xafil ne bıt
 Daim bı se'y û cehde bıt
 Teb'ê ku yar lê ew weh bıt
 Yar ji digel bê perde bıt
 Vêra bı rehm û şefqe bıt
 Wek xunçe aşiq dıl vebıt
 Dıl şubhetê ayine bıt
 'İşq û cemal jêk zêde bıt
 Xal, Eswed û dêm Qible bıt
 Pêş herdu nûnan secde bıt
 Vêkra bıwêrın subhetê

11 Ê goyi meydanê te bit
 Wek min dî zindanê te bit
 Serbendê çewkanê te bit
 Mecerûhê peykanê te bit
 Yexma û talanê te bit
 Her roj ji qurbanê te bit
 Bimarê mujganê te bit
 Daim dî fermanê te bit
 Hebsî dî zindanê te bit
 Muştâq û heyranê te bit
 Sohtî ji hicranê te bit
 Dê mestê fincanê te bit
 Wî behr dî nişanê te bit
 Muçe ji ber xwanê te bit
 Lê lutf û ihsanê te bit
 Her dem bixwûnî hezretê

12 Canan bî exyaran ne di
 Xemrê bî xwûnxwaran ne di
 Werdan bî murdaran ne di
 Wan rê dî gulzaran ne di
 Reyhan û gulnaran ne di
 Bo wan ji jeynxaran ne di
 Tu remz û esraran ne di
 Koran tu enwaran ne di
 Azarî mîhrdaran ne di
 Lê destê bedkaran ne di
 Bî nûnekê yaran ne di
 Nêv me û xwe staran ne di
 Tiran ji nûbaran ne di
 Derdan bî bîmaran ne di

11. MURDAR: *Kujek, kujok, kujon, qatıl.*

Jı xeyrî sê caran ne di
Riş in nedêrî taqetê

- 13 Bes aşiqan mehcûr biki
Şubhet "Melê" rencûr biki
Qelbê şikesti hûr biki
Şûna bîrînan kûr biki
Şem'a me jê pur nûr biki
Bî zehrê xwe me'mûr biki
Tenha me bî destûr biki
Mehrem-serayê hor biki
B'wesla xwe da fexfûr biki
J'wê badeyê mexmûr biki
Nêv kaseya ferfûr biki
Feyzê lî dîl da fûr biki
Dême jî reng kafûr biki
Dalan jî xalan dûr biki
Hê alemê meqhûr biki
Weqtê sehergeh bade tê

"ŞEBÇIRAXÊ ŞEBÊ KURDISTAN IM" *

- 1 Me bı dıl nêrgızên xasse (jê) divên
Seimen û yaseininên taze divên
Nazık û neyşekerên tuhfe divên
Sosinên nazık û terwende divên
Dılberên dêm-dur û durdane divên
Kewkebên şewq û şefeq zuhre divên
Nazê perwerde û şehzade divên
Saye perwerde me bê perde divên
Serwiqed dêm-gul û leb-xunçe divên
Ayetul-lahê şerif nusxe divên
Lê bı i'rab û xet û cezme divên
Dılrûbayan ne tinê xemze divên
Bı mesiha-sifetê 'işwe divên
Senemên sur jı semed her me divên
Jı me eswed-heceran secde divên
Bı ziyaret me jı wan bûse divên
Turreya şengi dıl aşufte divên
Mıhrıdarên xwe dı pejnurde divên
Pêş kışa te me dused nafe divên
Sed hezar etles û hem xare divên
Her lı bo zinet û xenla te divên
Textebend û sifetên Qeyseriyê

* *Ev helbesta han jı şeş beşan sazbiye. Beşa 1, 4 û 5'an lı ser yazde û yên dı lı ser deh kıtane. Dı dawiya her beşekê de, herdu rêzên "vegerandına lı bendê" û ya lı pêşiya wan, dı tevande lı ser yazde kıtayan sazıri ne û qafiyene.*

Dinbîrê hori-misalê zeriye
Nazîkê neyşekerê sur-periyê

- 2 Pur jî dina te xerib im xanım
Jı te ser ta bı qedem heyran im
Her bı can teşnelebê le'lan im
Dıl dı benda gırîha zulfan im
Yusîfê cur-'ekeşê hicran im
Nuqteya daireyê zindan im
Lew şubê daire sergerdan im
Badenoşê qedehê hurman im
Bı dıl ateş jı ceger buryan im
Lew perişan im û pur êşan im
Aşîqê nazîk û mehbûban im
Tu mebin bê ser û bê saman im
Gulê baxê iremê Buhtan im
Şebçîraxê şebê Kurdistan im
Çı tebiet beşer û insan im?
Lillahilhemdı çı alişan im
Dı riya yarê lı rêza san im
Lew dı iqlimê suxên xaqan im
Sıbehê 'id e, û ez pê zanım
Ku bı kêra te seher qurban im
Xweş bîrîndareki bê derman im
Carekê şefqe ke rûh ım, can ım
Jı xwedê re veke benda beriyê
Dinbîrê hori-misalê zeriye
Nazîkê neyşekerê sur-periyê

- 3 Sosnên taze û mîşkên walan
Bes perişan ke lı ser sermalan
Veke carek tu jı dora xalan

Jı dıl em dayine ber çıngalan
 Xencer û şır û rımên qettalan
 Nezerê wer bide sahib-halan
 Ku çı êsir in dı dest heyyalan
 Lew elif tên me dı herfên falan
 Ku lı şıklê reqemê sersalan
 Tuy murada me jı 'er-er-balan
 Zızmım û deng û zımıhna lalan
 Cezbe da me bı hezar ehwalan
 Lew dıalın jı neseq 'ebdalan
 Ku bı mesti dıderın yek palan
 'Enberên xemri yû sosın-alan
 Sohr û zer-şıtri yû çiçek-alan
 Mısıriyên wan dıl jı me kır kalan
 Te jı qews û qezehên xılخالan
 Ku bûyin daire şubhet halan
 Xemriyên xemzede nısbet dalan
 Ku çevandine jı reng kopalan
 Mısıriyan wer bide ber sıqalan
 Zuhre rengê û şefeq-muşteriyê
 Dinbirê hori-misalê zeriye
 Nazikê neyşekerê sur-periyê

- 4 Sunbulên taze musenna ne kırı
 Turreya şengi muterra ne kırı
 Xemriyan şifite tuxra ne kırı
 'Er-'erê xare û diba ne kırı
 Dıl û din xaret û yexma ne kırı
 Serê sewdazede sewda ne kırı
 Guherên nêrgızı şehla ne kırı

3. QETTALAN: 1) Kujer. 2) Kujekdar. (Amac purkuştine). HEY-YALAN: Xapinok, hilebaz. HALAN: Gerên lı dor hivê. Helqe. XEMZEDE: Xemgin.

Sa'etê vê sa'etê ranekîrî
 Me jî qeyda xwe tesella ne kîrî
 Lê xeramê lî me mestane kîrî
 Jî me dîl Ke'be û butxane kîrî
 De'weyê dilberiyê da ne kîrî
 Cilweyek mirî yû şahane kîrî
 Pêşî şem-a xwe me perwane kîrî
 Dîlê xemdideyê ma, şa ne kîrî
 Lî me bê perde tecella ne kîrî
 Wehe carek me tewetta ne kîrî
 Xencekê qenci lî "Mela" ne kîrî
 Ceger rişî mûdawa ne kîrî
 Bîkuji aşîq û perwa ne kîrî
 Lî şehîdê xwe temaşa ne kîrî
 Ma weh dîlber dîkîrî dilberiyê?
 Dinbîrê horî-misalê zeriye
 Nazîkê neyşekerê sur-periyê

- 5 Herdu qewsên te jî qudret ne jî Yeng
 Jê bî mîzan bîreşînî me xedeng
 Bîderî sine bî ser pence Peleng
 Romê puşt dî Ecemî bête Fireng
 Lê ne wek waqî'eya Gêyo w Pêşeng
 Hilbîtin qenc jî nivê atêşê ceng
 Tê nî sîwaşê Hebeş û Nûbî yû Zeng
 Tu dîzani çî neheng in çî neheng?
 Veke le'lan tu jî ser şekerê teng
 Ku j'mûrada te bûyî pêt û pereng
 Mestê cewra te me bê bade û beng

5. *GÊYO Û PÊŞENG: Du pêlewanên çîrokê ne. FERSENG: Fersex (pivana rê ye, beramberî 4482 m ye.)*

Bê te cana lı me alem bûye teng
 Jı cefaya te nema qet lı me reng
 Jı çı peyweste dınalın sera deng?
 Me dıxwûnı qed û bejna te yi şeng
 Nêrgızên mesti bı naz û neyireng
 Lê tu tûba û ezê xesteyê leng
 Çı bı kım feyde ku êvar e dereng
 Mutrıban da nekevın çengê jı çeng
 Da nedıt perdeyê, ayineyı zeng
 Ku jı çenga me bınalite xerçeng
 Wek "Melayi" bı hezar reng û aheng
 Bı fixan bêti û jı ber sed ferseng
 Çı xeberdım jı dılê tey weki seng
 Dıkuji aşiqê miskin bı tıfeng
 Nekırı terkê tu vê kafırıyê
 Dınbırê hori-misalê zeriye
 Nazıkê neyşekerê sur-periyê

- 6 Qed-nêrgıza çiyayê Buhtan i
 Nazıkek şeng i şubê reyhan i
 Çı xet-işkeste w şêrin-'ınwan i
 Ku te pê nesxê kırı diwani
 Ellah Ellah jı çı reng insan i?
 Yusifê leb-şekerê 'İbrani
 Bese ger wek te bıdêrıt sani
 Horiyên rûhi-sifet rûhani
 Wek te ser ta bı qedem nûrani
 Wek te haşa hebitın şırani
 Ehsenellah jı sıra subhani
 Ku cemalek weh munezzeh ani
 Dı misalek beşeri da dani
 Me bı ilhama İlâhi zani

Bı nişan qudret i bê nisani
Çı nişan? zulmeti nûrefşan i
Lı cemala semedi burhan i
Tu lı der heq me çıra erzan i?
Ku sehergeh bîmeşî seyrani
Te "Mela"yê xwe qe carek nani
Bı serefrazi yû alişani
Secde bıt ber qedema sultani
Ne tinê rûh i tu rûh û can i
Zineta husn û sura xuban i
Tacê ferqê serê mehbûban i
Tu bı şirani yû leb-şekkeriyê
Dinbirê hori-misalê zeriye
Nazikê neyşekerê sur-periyê

DENGĒ TĪPA (5 : i)

"BEŞA ZÊDEKIRINA DAXWAZÊ, BI ZARÊ EREBÎ"

- 1 Ya ramiye qelbi bi sihamil-lehezati
heyhatê necatî
Ma zale fidaen leke rûhi we heyatî
Min qebli mematî
- 2 Nemmeqtû ila babî ke ya qurrete 'eynî
Bid-dem-i kitabên
Eşhedtu 'elel wecdi midadi we dewatî
Sel min 'eberatî

- 3 Muz zeyyeneked-dehrû bi ezhari cemalin
Ya rewdete husnin
Excel te tetel werdi bi hebbil wecenati
Beynel 'eremati
- 4 Cilbabû duca sudxi ke ilhabe fûadi
Yehki ke 'iyanen
Niranû cehimi hucibet biş-şehewati
Min kulli cihati
- 5 Fi zulmeti esdaxi ke muz esbehe miskun
Ya zebye herimi
Qed ehreqe fis-Sini qulûbez-zebeyati
Nar-ul heserati
- 6 Kem tuhriqû ehşaye we fi fike zulalun?
Weş-şaribû min hû
Yehki Xediren mewriduhû maû heyati
La fiz-zulumati
- 7 Min "Ehmed"e fi leyleti esdaxi milahin
Lahet kelimatun
Men yes'meû ha falie bî miskid-de'ewati
Ceyb-el xedewati

-
1. (*Ya avêtkiroxê dilê min bî tirên nagihan, kaye felata min?
Heta ber mirinê jî, rûh û jiyana min her fîdayê te bîn*)
2. (*Ya rohnîya çavê min, bî stêrkên xwinê, bîn pirtûkekê bî bal
dergahê te ve nivîsiye. Bîn hîbr û qelemê li ser evinê agahdar
kiriye, jî stêrkên çavê bîn bîpîrse*)
3. (*Ya gulistana delal, gava ku te dinê bî wan gulên rind xweş kîr û
te xûnava li ser gula şermîkar kîr bî hebê şanîkên li dêma*)

4. (Reşayiya vegirtina biskên te, dilê min peritand, wa ji te ve 'ryan e, agirê doja min ji, ji her alî ve bî şehwetê perde bû)
5. (Ya xezal û bermaliya min, ji reşayiya biskên te gava ku mîsk çê bû, li Çinê agirê hîsretê cergê xezala şawitand.)
6. (Zelaliya davête çiqas hînavan dişewitine, yê ku jê vedixwo, bepsê ji çûyina Xîzır lî awa heyatê dike, lê ne di tarîtiyê de.)
7. (Ji "Ehmed", di şeva (reşayi) biskên te yê şêrin de, bêje eşkere bûn. Ki kuwan seh bike, ew di sehera sibê de bîska dozê belav dike.)

"Bî vê qesidê re, dawîya Diwana Mela, ya ku bî navê "Çapa Cîzîrê" hatiye navdarkirin hat".

DAWÎ

"Agahdariya min li ser van herdu qesideyên li jêr, ev e ku Ehmed Paşa, pirê bêje û manayên xwe, ji qesida Xızır Beg girtiye. Mela ji qesideya Ehmed Paşa qopya kiriye, du heb beytan lê zêde kiriye û di dawiya Divana xwe de bi ci kiriye. Lê belê rastiya wê ne kifşe ye. Belam hinek xeletî di qesidê de hebûn, çewa ku di hinekên kurdî yên din de ji hebûne. Lê pîştî agahdariya me çêbû li ser qesideya Ehmed Paşa û ya Xızır Paşa, me wan xeletîyan rast kir."

EHMED PAŞA

- 1 Ya ramiye qelbi bi sihamil-lehezati
Heyhate necati!
Ma zîltû fidaen leke rûhi we heyati
Min qebli memati
- 2 Nem-meqtû ila babî ke ya qurrete 'eynî
Bid-dem-i kitaben
Eşhedtu 'elel wecdi midadi we dewati
Sel min 'eberati
- 3 Cilbabû duca sudxi ke qed esbehe misken
Ya zebye herimi
Qed ehrege fis-Sini qulûbez-zebeyati
Nar-ul heserati
- 4 Kem tuhriqû ehşaye we fi fike zulalun
Weş-şaribû minhû

Yehki Xediren mewridû hû maû heyati
La fiz-zulumati

- 5 Min "Ehmede" fi leyleti esdaxi milahin
Lahet kelimatun
Min nesmeti ha fahe bi miskid-de'ewati
Hebib-el xudwati

XIZIR PAŞA

- 1 Ya men melek-el inse bi lutf-il melekati
Fi husni sifati
Herrekte cunûni bi funûn-il herekati
Ya cennete zati
- 2 El aridû wel xalû we esdaxû ke heffet
Etrafe muheyyak
Wel cennetû keyf-eh-tecebet biş-şehewati
Min kulli cihati
- 3 İndaqe 'elel wus-i 'eberatu lisani
La ibrete fi hi
Fil qelbi nukatun kutibet bil 'eberati
Tehki nekabati
- 4 Qed sale 'ela babi ke enharu dumûi
Leylen we neharen
Fer-rehmû 'eles-saili ewlel hesenati
Yewm-el 'eresati
- 5 Kerrir 'idet-el wesli wesıl ha bi xilafin

Fel we'du kefa ni
Wes-sebû yera lezzete hû fil felewati
Min zikri Furati

6 Lew merre 'ela turbiye min cismi ke zillun
Ya mu 'nise rûhi
Heyya ke minel qebri izami we rufati
Min be'di wefati

7 Fi xettiye iz enqulû min fihi misalun
Yehki ke bi lutfin
Min şaribih-il "Xedru" rewa fiz-zulumati
'En 'eyni heyati

Ev nîvisara ku li jêr e, têbîniyeke di çapeka Diwana Melayê Cîziri de, ku bi zarê arebî nîvisandi bû, me wergerande kurdi.

"Dî hûnek nusxeyên din de, me sê heb çarkokan dit, şiraniya wan weke şiraniya nezma beytên Mela ne û me wan ji di vîr de bi ci kir."

"ÇARKOKÊN MELA"

1 Qewsê tey hilali bî delali keşîha
Bejna te jî şengi bî derengi meşîha
Marê jî herirê dî 'ebirê xwuşîha
Mawer bû jî wan zulfê dî zengi weşîha

"DİSA"

- 2 Axa qedema muhterema paye peri me
Wek tûti peyapey lı zebanê şekerî me
Her lehze dîbê bêt ku dîçim rehguzerî me
Êdî çî bîbêjîm, ku kerim îbnî kerim e

"DİSA"

- 3 Şımşad û xeramek ku me dîbû seherê
Camek jî şerabê bî me da wê qemerê
Tîrek ku jî qewseynê dî wê da cegerê
Qurbana xwe kîr canê şêrî rux-fenerê

"FELSEFA MELÊ"

- 1 Ellah sehergaha ezel
Yelmûmê 'îşqê şu'le da
Nûra cemala lem yezel
Zatê tecellaya xwe da
- 2 Zatê tecella bû lı zat
Bê ism û asar û sıfat
Sırra hurûfên aliyat
Xef bû dî sır û perde da
- 3 Zatê muqeddes bû wucûd
Cûşîş neda bû behrîcûd
Wesf û îzafat û quyûd
Yek jî tecellayê ne da

3. CÛŞİŞ: Coşbûn. CÛD: Comerd, baş, qenc.

- 4 Husn û cemalê xwest evin
 Vêk ra dî yek zati cîvin
 Nûra qedim bû 'îşq û vin
 Wan lî êk naz û 'îşwe da

- 5 'Îşqa jî nûra la yezal
 Husn û cemala bê misal
 Êsandi yelmûm û şemal
 Disa xwe lê perwane da

- 6 Husn û mehebbet her hebû
 Heq aşîqê zatê xwe bû
 Muhtacê husnek dî ne bû
 Neql û riwayet pê weh da

- 7 Burhanê 'eql ew kîr qiyas
 Îsm û kemalatên dî xas
 Ewwel elifê pê binas
 Vê nûrê ew pertew veda

- 8 Ew nûr e dayî şewq û tav
 Alem xweya bû ma dî nav
 Berqên xwe avêtin belav
 Reng rengî berq û lem-'ê da

- 9 Subhan jî remza xalîqî
 Nûra sîpide sadîqî
 Avête qelbê aşîqî
 Lerzin û ta û cezbe da

5. *ÊSAND: Gerand, gîhand.*

- 10 Me'nayı 'ışqê bêm çı ye?
Lew mın bı çeşmê dıl di ye!
'Eksa cemalek safi ye
Lamı' dı mır-ata me da
- 11 Husn û mehebbet zatek ın
Me'sûq û aşiq latek ın
Lê sûret û mır-atek ın
Her yek dı me'nayê xwe da
- 12 Ger dilber û wer aşiq ın
Arif dı vê da sadıq ın
Ayineyê nûra heq ın
Cih cih dı wan da cilwe da
- 13 Aşiq ew e, dilber ew e
Zahır ew e, mezher ew e
Rûh û beden gewher ew e
Her şahıdek durdane da
- 14 Her şahıdek da dêm jı dur
Rûhek dı bexş ba remz û sur
Xettê xubari nuqte pur
Katıb jı bala nusxe da
- 15 Herfên kışandi katıbi
Nûra dı rûh û qalibi
Yek yek bı ismê wahıbi
Î'rab û cezm û nuqte da
- 16 Nûr ın jı ser hetta qedem
Neqqaşê ser-meşqê qidem

Pê zeyyinand lewhê 'edem
Her yek bî yek di çeşne da

17 Ev şıkl û sûret çeşne yin
Esl in lî bala terhe yin
Nisbet bî wan em saye yin
Tertibê xellaqî weh da

18 Alem bî alem ew neseq
Bû ayine esmaê heq
Nûra tecellaya teteq
'Eks û xeyalek sade da

19 Her hey'eta lê rûh û cîsm
Gelke ku lê dani tîlîsm
Her yek jî yek ra bûne ism
Lew herfî herf endaze da

20 Em têk hewiyyat in yeqin
Îsm in jî mesder muşteq in
Mewhûm û laşey mutleq in
Eks in dî nêv ayine da

21 Pertew jî 'eynî nûrekê
Tên tên tecella tûrekê
Ew ser dîdît yek fûrekê
Lew çendi leb-leb qetre da

16. ÇEŞNE: Nîmûne, mestere, nîmûç.

18. TETEQ: Çeper. Asiman.

19. GELK: Herî. ENDAZE: Avêtin.

20. HEWÎYYAT: Belge, dîtal, delîl. MESDER: Çavkani. MEWHÛM: Xeyalî. LAŞEY: Ne tîşt.

- 22 Ew şahıdın bêri jî 'eyb
Her cilwe lê dayî dî xeyb
Vê alemê ew tine ceyb
Disa lî ha ew cilwe da
- 23 Reng rengê husna suretan
Neqş û nigarên destxetan
Bala û bejn û qametan
Şêrin-leban pur xende da
- 24 Şêrin-lebên qed-neyşeker
Simin-berên nazîk-beşer
Zulfan sîtar bû roj dî ber
Bîskan lî mîskê te'ne da
- 25 Guldesteyên nûrin-qîdem
Destan jî enguştan qelem
Ew laleyê baxê Îreîn
Mawer lî belgan la
- 26 Hîn esmer in, hîn dem-zerî
Meh-peyker in, sur muşterî
Wildan û hor û ew perî
Hatın libasê came da
- 27 Çendi bî xeml û rewneq in
Tezyîn jî husna mutleq in
Têk cilweyê nûra heq in
'Îşqa ezel pê şîwe da
- 28 Husna munezzeh bê nişan
Wî lê nivîsî zer-keşan

Xal û xetên 'enber feşan
Her kes bî wan dîl yexme da

29 Darûyê husna dilberan
B'xeml û libas û ziweran
Bête şihûda beseran
Binahiya d'her dide da

30 Bînmêt dî husnê rengî reng
Nay û def û qanûn û çeng
Ew 'îşq e van tînt bî deng
Lew wan bî husnê nexme da

31 Sîrra kelmê eqdesî
Dem dem dî lîbsê enfesî
Tê tîn tenezzul bêhîsî
Ne b'guft û goyê qîsse da

32 Weh d've ku 'uşşaqîn hebîn
Dîldar û muştâqîn hebîn
Wê şemsê afaqîn hebîn
Da kîfş bîbît d'sîpîde da

33 Da kîfş bîbîn kewkeb dî çerx
Rabîn hezar Me'rûf jî Kerx
Şîblî yû Se'dî w alî Ferx
'Îşqê dî wan keşfa xwe da

34 Da husn û hub dîn mezheran
Kîfş kîn lî her erd û deran

33. *KERX: Kerxa kîha, gundek e lî Diyarbekrê.*

Aşiq bıxwûnın defteran
Dilber mehebbet-name da

- 35 Husn û cemal û 'ışqe ye
Aram dı perdê da ne ye
Mehbûbê lew hetta heye
Nabit dı perde w xelwe da
- 36 Mehbûb û xûb û dilberan
Bıgri lı wan heftê deran
Dê xwe j'şıbak û penceran
Zahır bıkın d'her erde da
- 37 Ew laleyên j'gul tazeter
Fesla buharê bête ser
Cih cih bı hevra tene der
Xweş xweş dı erdê xare da
- 38 Remzek xerib û fatırı
Peyda bıbıt niv xatırı
Qewet te ninın ragırı
Xef ki dı nêv qelbê xwe da
- 39 Mefhûm ku bû me'lûm dı dıl
Ziwer bıdı tê sed 'emıl
Bınıt libasık pur xemıl
Hındi ku se'y û cehde da
- 40 Lefz û ibaret came ye
Mehbûbê me'na bı xwe ye
Lê xemlê husnek zêde ye
Lewra bı husné zibe da

- 41 Mın ev misal lew bo te best
Zoran bı zulfan dıl vıbest
Herçi te di sûret-perest
Durrê yetim bêfeyde da
- 42 Pis û xırab û zışt û ar
Ma ew bı xemlê têne kar?
Ê d'qeydı lebsê nedye yar
Hubbê bı xwe davê ne da
- 43 Çarê hılın yarê bıbin
Ne d'perdeya tari bıbin
Sed cari er kari bıbin
Gul wê dı nıva buxçe da
- 44 Ew bû murada kirdıgar
Lew kır irade w ixtiyar
Vê buxçeyê her lê buhar
Gulgeş dı baxê xunçe da
- 45 Bayê evinê ku livi
Ew qışt û zulfê ser çevi
Her dem hezar dıl dakevi
Xal lew dı damê dane da
- 46 Behra wucûdê coşi hat
Nûrek tenezzul bû ji zat
Hatın te'eyyûn têk sıfat
Eşya zuhûr 'ılmiye da

42. ZIŞT: *Nahs. AR: Şorek Béâr.*

44. KIRDIGAR: *Çêkîrox, xeysetnavê xwedê.*

47 Eşya dı 'ılmê bûn zuhûr
İsman jı feyza ismê nûr
Teqwimê bestın bê qusûr
Hukmê sifâtê-seb'e da

48 Vê alemê teqwimê best
Her ismekî fê'la xwe xwest
Hukm û teserruf da bî dest
Her wî dı mulk û qebze da

49 E'raz û 'eyn û cewheran
Wahîd jı esl û mesderan
Te'sirê bexşî mezheran
Sed rengî herf û sixê da

50 Feyza hurûfên aliyat
Behsa sutûrên safîlat
Ayat û wesfên inuhkemat
Tertibî 'uşr û sûre da

51 Katib nıvisin ew hurûf
Her talibê pê bû wuqûf
Hatın jı dıl sed ah û of
Ser-xet lı lewhê sade da

52 Ew destxetên katib-semed
Wahîd lı ser lewha ehed
Neqşek reşandi bê 'eded
Ce'da cemalê şane da

50. SUTÛR: *Efsane. Rêz.* SAFÎLAT: *Nîzm, Buhurî. Kevin.* 'UŞR: *Dehyek. SÛRE: Beş.*

- 53 Esmâ tekamul rast kîrîn
 Bala fewa'îl rast kîrîn
 Cih cih qewabıl rast kîrîn
 Jê, 'îlletek sûriyye da
- 54 Esmâ mûqabıl bûne zewc
 Lê cumle jê bûn fewcî fewc
 Behra wucûdê hate mewc
 Mewcan dî behrê lûcce da
- 55 Cewşen ku da deryayê, Cûd
 D'ayineya ismê Wedûd
 Carek tecella bû wucûd
 Fûrek jî nûrê jê veda
- 56 Fûrek jî nûrê wî vekîr
 Genca zuhûrê pê vekîr
 Kenza xwe qufl û mifte kîr
 Hêj wê dî qufl û mifte da
- 57 Husnek munezzeh sewwîrand
 Nûra hebîb jê afîrand
 Alem dî "KUN" hê heyîrand
 Ruhulqudus can nefxe da
- 58 'Erş û cîhat lê bû heyat
 Ew şahîdê qudsî-sîfat
 J'bona yeqîna nûrî zat
 Siwan û şewq û hale da

- 59 Husna ji 'iştê sewwiri
 Xaret kırım hor û peri
 Herçi dî "KUN" hê fekkîrî
 Ew ma dî 'îcz û hire da
- 60 Ew sûretê mîr'atê husn
 Jê bû zuhûr ayatê husn
 Lê bû tecella zatê husn
 Vê husnê ew ser-çeşme da
- 61 Serçeşmeya husnê ew e
 Xurşîd û alem pertew e
 Ger bedr e, wer mahê new e
 Wer muştêrî, yan zuhre da
- 62 Wildan û hor û ger peri
 Şêrin û mehbûbên beri
 Hemyan ji husna xawerî
 Nûrê dî wan yek zerre da
- 63 Nûrê jî nûra Ehmedî
 Sırra sîfatên sermedî
 D'ayîneya zatê xwe dî
 Keşfa kemalatê xwe da
- 64 Ew bû qelem, ew bû 'eqıl
 Lew pê hedîsê da neqıl
 Deryayê 'îlm ew bû şuxul
 Tefsîlî 'îlmê cumle da

63. *SERMENDÎ: Bê destpêk û bê dawî.*

- 65 Ew bû dî cumle rabîte
Mizan û ism û basîte
Feyza heq ew bû wasîte
Çeşmê wucûdê surme da
- 66 Yek bû elif, yek nuqte kîr
Çend şîklê dî lê zêde kîr
Her dem peyapey sîfre kîr
Bala bî bala rutbe da
- 67 Wahîd jî nûra wê durê
Peyman e ew cama surê
Mey rêhti ani ber firê
Hem cam û hem peyman e da
- 68 Xeyb û misal in herdu sîlk
Peyweste anin mimê mulk
Ew katîbê elması gîlk
J'wê xameyê ev reşhe da
- 69 Nûra tecella hate 'erş
Esmâ hemî lê bûne neqş
Şewqa dî wan çû ta bî fers
Îsman bî zatê secde da
- 70 Katîb qelem disa gerand
Îsmek jî isman sewwîrand
Kursî jî nûrê afîrand
Cennatê xuld û sidre da

66. *SIFRE KIR*: Sıfır kır. Amaç nıvisandına sıfran lı paş reqeman e.

68. *SILK*: Sire. Tertip, teküz. Lı rêveçûn, pişe. *REŞHE*: Herikandin. Rewan terayi, şılayi.

- 71 Serçeşmeya nûra sexi
Behra cemed dabû rexi
Feyzê jî ber da berzexi
Dagirt û geh geh fûre da
- 72 Ew berzexa reng-ayine
Hingi ku eşya dayine
Wan tê şemal êsayine
Jê sûretek 'eksiyye da
- 73 Wesf û kemalatên subûh
Herfên kitaba 'eqî û rûh
Îsmek divê lê bîn wudûh
Lew, lewh û gûlk û xame da
- 74 Ew nusxeya alî ism
Lewhek divê jêra cîsım
Da herfî lê bîn murtesım
Herfan şikl-nûriyye da
- 75 Nuqtê ku me'nayek divê
Terkibê imlayek divê
Sûret heyûlayek divê
Rûhan dî nefse cusse da
- 76 Ma tene dîtın husn û sur?
Bê bejn û balayên jî dur
Katıb jî van herfên dî pur
Nûnek xıyali besme da

76. BESME: Mor û şeqıl.

- 77 Durdaneyên xawer-misal
Ayineyên têda şemal
Nûrek munezzeh ew cemal
Mey kır dî niva şîşe da
- 78 Rûhaniyên qudsimisal
Dê bên libasê xett û xal
Saqî meya gulgûn û al
Tînt dî fincana me da
- 79 Mey ku dî camê bête noş
Bê deng û sewt her têtê goş
Jê têtê dîl her dem sîroş
Lew ev şerab alûde da
- 80 Ev reng tecella kır subûh
Saqî jî şehkasa futûh
Mey rêhte cama eql û rûh
Roj bû dî qewsê qubbe da
- 81 Roj bû dî niva neynîkê
Katîb jî herfê 'eynîkê
Nivgoşeya qewseynekê
Tuxra bî ismek taze da
- 82 Tey kır dî nêv tuxrayê ism
Teksîrî kır herfên tîlîsm
Husna muqeddes bû du qîsm
Hukmê tecellayê we da

79. *ALUDE: Xumrî. Şîlo.*

- 83 Yek 'eql û rûhê e'zem e
Misbah û nûra alem e
Hewwa û neqşê Adem e
Bê muddet û bê madde da
- 84 Ê di ku nefsa kulliye
Husnek muqeddes ali ye
Ew ji bî rûh ra esli ye
Wan herdu hev ra saye da
- 85 Ayineyê zatê yek in
Lew dilber û latê yek in
Vêk ra dî mir-atê yek in
Hem taze taze 'işwe da
- 86 Ew tîn bî cem' fer' û esîl
Mail dîbîn vêk ra b'wesîl
Nabîn jî yek ferq û fesîl
Hukmê wisalê pê we da
- 87 Vêk ra ku bûne wesl û cem'
Barin jî mabeynê du lem'
Îsa jî erwahan du şem'
Şem'a nufûsan şû'le da
- 88 Îsa jî erwahan qebes
Pur şû'le tîn nûrin qefes
Nefsan bî 'işqê da nefes
Qelban bî hubbê lehce da

87. *ISA: Çirisi. Geriya.*

88. *LEHCE: Peyu, qise.*

- 89 Ew latê husn û 'eynî nûr
 Sûret bî sûret tèn zuhûr
 Îns û peri wildan û hûr
 Cî cî dî wan da cîlwe da
- 90 Her yek jî feyza ismekî
 Tèn sûretî tîlismekî
 Lew me'neya her cismekî
 Pertew jî nûrê lê veda
- 91 Dê sîrrê tewlidê bîbêm
 Ne b'wehm û teqlidê bîbêm
 Me'na jî tewhidê bîbêm
 Dîl vê edayê şehde da
- 92 Me'şûq û aşîq herdu lat
 Meczûbî dê yek bîn sîfat
 Hîna ku bû yek îltîfat
 Be'zek sîfatan hîsse da
- 93 Hay û hoyâ subbûhiyan
 Reqs û semaya qudsîyan
 Teşbihê coqa sofîyan
 Feryad û zîkr û lerze da

92. *Ev çarok bî tenê dî çapa fon M. Hartman de heyê:*
Ew wed-ê herfê bû tîlism.
Lew hat te'eyyûn şexşekîsm
Ser da lî basê rûh û cîsm
Şîklê çadê sufîre da
BE'ZEK: Hînek.

- 94 Westane şaxıs sef sef in
 Batın dı 'eynê da xef in
 Teşbihê berqa xatîf in
 Lamı' dı çerxê tis'e da
- 95 Bı zaz û cama badeyê
 Yar têtê niva helqeyê
 Medhûş û mestê wê meyê
 Şaş û kulah aşufte da
- 96 Remza dı cama şerbetê
 Xef têtê niva subhetê
 Herçi ku fincanê detê
 Wî can bı nezr û sîdqe da
- 97 Şem'a wisalê her geş e
 Şewqa şemalê ateş e
 Xemra peyalê bê xeş e
 Saqî 'eceb reng-bade da
- 98 Saqî 'eceb reng-bade rê t
 Aşîq jî me'şûq ev dîvêt
 Fincan bı fincan da û mêt
 Kama dîlê bê çare da
- 99 Eşya lı pey hev wellıdın
 Yek-yek jî weslê beddıdın
 Hem mesder ın, hem mewrîd ın
 Vê qulzumê ev reşhe da

95. ZAZ: Saz.

98. KAM: Miraz, daxwaz. Mebest, lezzet, tam. Rutûbet, şıl.

99. BEDDİDÎN: Peyda bûn.

- 100 Ew reşhe da wê qulzumê
Mey hate tasa alemê
Cama cihan bin da Cemê
B'Iskenderi ayine da
- 101 'Eksa ji husna meyfiroş
Avête fincanên bî poş
Nageh di caman hate coş
Fûri di niva kuze da
- 102 Saqi ji dengê bulbul e
Avête çerxê xulxule
Rûhan lî dorê sîlsîl e
Govend û reqs û helqe da
- 103 Mehbûb xwe nişan da sefê
Carek di cama qerqefê
Hati bî awazê defê
Tembûr û çengê nexme da
- 104 'Eynê tebi'et cîsmê kul
